HÎNKER

Asta Sêyemîn

Ronayî Onen | Samî Tan

ENSTÎTUYA KURDÎ YA STENBOLÊ

NAVEROK Û PLAN

UNÎTE	MIJAR	RÊZIMAN	ARMANC	PEYV
	A- Xwenasandin *r.* **4** B- Cînavk û qertaf *r.* **5** C- Veqetandek *r.* **7** D- Heye / hene *r.* **9** E- Tewang *r.* **10**	1- Cînavkên kesane (xwerû / tewandî) 2- Qertafên kesane 3- Qertafên nebinavkirinê 4- Veqetandek (binavkirî / nebinavkirî) 5- Tewang 6- Heye / hene	Bikaranîna mijarên rêzimanî yên mîna cînavk, tewang û veqetandekê ye. Bi vê yekê re dê bikaribin xwe bidin nasîn.	1- Cînavk 2- Rengdêr 3- Xizm 4- Pîşe
	A- Hevnasîn *r.* **12** B- Danasîna kesan *r.* **14** C- Danasîna derdorê *r.* **18** **UNÎTE 1 - SPARTEK** *r.* **24**	1- Dema niha 2- Dema ku (dema niha) 3- Daçek 4- Cînavkên lihevxistî (I)	1- Nasîn û nasandina kes û cihan	1- Peyvên hevedudanî 2- Rengdêrên têkildarî nasîn û nasandinê
	A- Rûpelek ji dîrokê *r.* **28** B- Kesayetiyeke dîrokî *r.* **30** C- Destanek *r.* **32** D- Serpêhatî *r.* **37** **UNÎTE 2 - SPARTEK** *r.* **38**	1- Dema boriya têdeyî 2- Dema boriya dûdar 3- Dema boriya berdest 4- Peyvsazî 5- Dema ku (demên borî) 6- Hevokên sedemê	1- Bikaranîna demên borî 2- Vegotina bûyer û qewamên demên borî	1- Peyvên pêkhatî bi paşgira “-î” 2- Peyvên pêkhatî bi paşgira “-dar” 3- Hin lêkerên biwêjî
	A- Xweza *r.* **42** B- Jiyana li gundan *r.* **44** C- Çanda gundan *r.* **46** D- Gund û bajar *r.* **52** **UNÎTE 3 - SPARTEK** *r.* **58**	1- Hokerên çawaniyê 2- Ravekên rêzîn 3- Gihanek 4- Lêker (wekî navdêr) 5- Raweya fermanî 6- Bilanî 7- Pêşniyar 8- Lêkera xwestin 9- Payeya rengdêr û hokeran	1- Nasîn û danasîna jiyana xwezayê 2- Hevrûkirina jiyana gund û bajaran	1- Peyvên têkildarî xweza û jiyana gundan 2- Hoker û rengdêr 3- Gihanek 4- Lêkerên hevedudanî
	A- Pêşnûçe *r.* **64** B- Pêşbînî *r.* **68** C- Nirxandina siberojê *r.* **74** **UNÎTE 4 - SPARTEK** *r.* **84**	1- Hejmarên rêzîn 2- Dema bê 3- Dibe ku 4- Piştî ku / berî ku (dema bê) 5- Wekî gihanek “ku” 6- Hekanî 7- Divêtî 8- Dema bê ya nêzîk 9- Cînavkên lihevxistî (II)	1- Vegotin û nirxandina siberojê, 2- Bikaranîna demên bê	1- Peyvên pêkhatî yên bi paşgira “-istan” 2- Lêkerên bi cînavkên lihevxistî

NAVEROK Û PLAN

UNÎTE	MIJAR	RÊZIMAN	ARMANC	PEYV
	A- Rojên taybet *r.* **86** B- Cejn *r.* **90** **UNÎTE 5 - SPARTEK** *r.* **95**	1- Avaniya tebatî (dema niha) 2- Avaniya tebatî (demên borî) 3- Avaniya tebatî (dema bê) 4- Cînavka girêkî “ku”	1- Nasîn û vegotina rojên taybet 2- Bikaranîna avaniya tebatî	Peyvên têkildarî cejn û pîrozbahiyan
7 Dil n	A- Hunerên destan *r.* **98** B- Hunerên bedew *r.* **106** **UNÎTE 6 - SPARTEK** *r.* **110**	1- Rengdêrên şanîdanê 2- Peyvsazî 3- Çer ku / heta ku 4- Dançêker	1- Nasîn û nasandina hunerên destan û hunerên bedew 2- Bikaranîna avaniya dançêker 3- Ravekirina wêne û dîmenan	1- Peyvên têkildarî hunerên destan û hunerên bedew 2- Peyvên pêkhatî bi paşgirên rayeka lêkeran
	A- Xwezî *r.* **114** B- Çîrok *r.* **119** C- Xem û meraq *r.* **122** **UNÎTE 7 - SPARTEK** *r.* **125**	1- Raweya merc û daxwaziyê (Pêknehatî) 2- Çîrokiya dema boriya têdeyî 3- Raweya merc û daxwaziyê (hevedudanî)	1- Vegotina xwezî û daxwazan 2- Bikaranîna raweya merc û daxwazî û çîrokiya dema boriya têdeyî	1- Peyvên têkildarî hest û dilînan 2- Lêkerên hevedudanî
	A- Çîrok *r.* **130** B- Remildank *r.* **131** C- Xwezî *r.* **132** D- Rêwîtî *r.* **133** E- Zargotin *r.* **134** F- Çiyayê Nemrûdê *r.* **135** G- Bikaranîna Deman *r.* **136**	1- Dema niha 2- Raweya merc û daxwaziyê 3- Raweya merc û daxwaziyê (pêknehatî) 3- Demên borî 4- Payeya rengdêr û hokeran 5- Avaniya tebatî 6- Bikaranîna deman	1- Dubarekirina mijarên rêzimanî	
	Lêkerên xwerû *r.* **138** Lêkerên pêkhatî (-in) *r.* **139** Lêkerên pêkhatî (-andin) *r.* **140** Lêkerên pêkhatî yên ku bi pêşgiran çêdibin *r.* **141** Bersivdank *r.* **142** Taybetiyên zimanê kurdî *r.* **154** Dengên kurdî bi alfabeya navneteweyî ya fonetîk (IPA) *r.* **160**	1- Hin lêker û kişandina wan	1- Dê hin lêkeran û kişandina wan hîn bibin.	1- Hin lêkerên ku rojanê têne bikaranîn.

DESTPÊK

- Xwenasandin
- Cînavk û qertaf
- Veqetandek
- Heye / Hene
- Tewang

A- Xwenasandin

Malbata Rûkenê

Navê min Rûken e. Ez ji Wanê me. Ez hevdeh salî me. Ez xwendekar im. Porê min qehweyî û pêldar e. Çavên min qehweyî ne. Ez dirêj û lawaz im.

Navê diya min Sosin e. Ew mamoste ye. Ew sî û neh salî ye. Porê wê zer û kurt e. Çavên wê şîn in. Ew jineke xweşik e.

Bavê min zilamekî bi bejn û bal e. Navê wî Remo ye. Ew karsaz e. Ew çil salî ye. Porê wî reş e. Çavên wî qehweyî ne.

Du birayên min hene. Navên wan Rohat û Ferhat in. Lê belê qet xwişkên min tune ne.

Rohat yazdeh salî ye. Ew xwendekar e. Ew porzer û çavşîn e. Ferhat neh salî ye. Ew porkurîşk û çavhingivîn e. Ew yekî bejnkurt e.

Bapîrê min heftê salî ye. Navê wî Evdila ye. Çavên wî reş in. Navê dapîra min Xecê ye. Çavên wê zerîn in.



1- Bersivên pirsên li jêr binivîsin.

1- Rûken ji ku derê ye? _____

2- Rûken çend salî ye? _____

3- Rûken çi karî dike? _____

4- Çavên Rûkenê çi reng in? _____

5- Rûken keçeke dirêj e? _____

6- Sosin kî ye? _____

7- Porê Sosinê çawa ye? _____

8- Remo bavê kê ye? _____

9- Remo çi karî dike? _____

10- Rohat û Ferhat kî ne? _____

B- Cînavk û qertaf

Cînavkên Kesane

a- Cînavken kesane yen xwerû	Qertafên Kesane
Ez	im / me
Tu	î / yî
Ew	e / ye
Em	in / ne
Hûn	in / ne
Ew	in / ne

Mînak

Ez têr **im**. Ez birçî **me**.
Tu têr **î**. Tu birçî **yî**.
Ew têr **e**. Ew birçî **ye**.
Em têr **in**. Em birçî **ne**.
Hûn têr **in**. Hûn birçî **ne**.
Ew têr **in**. Ew birçî **ne**.

Ez berf **im**, berf **im**, berf **im**
Lê lê yar lê lê yar
Ez berfa çiyayê spî **me**
Lê lê yar tu delal **î**

2- Valahiyên li jêr bi qertafên kesane dagirin.

1- Zozan xweşik ____.
2- Zîlan ji Amedê ____.
3- Ez tî ____.
4- Em xwendekar ____.
5- Mala me mezin ____.
6- Tu delal ____.
7- Pisîka min nexweş ____.
8- Hûn ji ku derê ____.
9- Birayên min jîr ____.
10- Xwişkên te çawa ____?
11- Mamosteya me baş ____.
12- Ew buha ____.
13- Bavê min cotkar ____.
14- Zelal û Delal xwişkên min ____.
15- Navê wê Derya ____.

3- Bi rengdêrên li jêr hevokan çêkin.

kin	dirêj	lawaz	qelew	teral	jîr
bedew	buha	zana	rûvekirî	xwîngerm	xweşik

Mînak

Bavê min qelew e.

b- Cînavkên kesane yên tewandî

Min
Te
Wî (nêr)
Wê (mê)
Me
We
Wan

Mînak

Bavê **min** nexweş e.
Xalê **te** ajokar e.
Apê **wî** zana ye.
Mala **wê** mezin e.
Karê **me** baş e.
Hevalên **we** parêzer in.
Waneya **wan** kurdî ye.

4- Valahiyên li jêr dagirin.

1- Xwişkeke min heye. Navê _____ Besê ye.
2- Du birayên min hene. Navên _____ Serhat û Serdar in.
3- Ev Apê min e. Navê _____ Bahoz e.

5- Di nivîsa li jêr de cihên vala bi cînavk û qertafên kesane dagirin.

Navê min Zelal e. ____ ji Mêrdînê me. Ez pazdeh salî me. Çavên ____ reş ____. Porê min kin ____.
Navê bavê ____ Cemîl e. ___ çil salî ____. Ew zîvker e. Çavên ____ reş in. Porê wî qehweyî ____. Ew dirêj û lawaz e. Bavê min gelekî zarşêrîn e.
Diya min Selma sî û heşt salî ____. Ew bermalî ye. Çavên ____ şîn in. Porê wê xingalî ye. ____ dirêj e. Diya min rûgeş e.
Du xwişkên min hene. Navên _____ Fatma û Zozan_____. Fatma sêzdeh salî ye. ____ xwendekar e. Ew çavşîn e. Zozan yek salî _____. Çavên _____ hingivîn in.

Qertafên Nebinavkirî

-ek
-in

Mînak

malek, salek, keçek, dêrek
kevçiyek, xaniyek
hevalin (hin heval), darin (hin dar), zarokin (hin zarok)

Di taxa me de dêrek heye.
Li ber mala me darin hene.

C- Veqetandek

Veqetandekên Binavkirî

-a (yekjimar mê)
-ê (yekjimar nêr)
-ên (pirjimar)

-a; mala min, meta min, xwişka te, gula sor, dara gûzê, keça bejndirêj…

Mala me li Amedê ye.
Keça te xweşik e.

-ê; xaniyê me, birayê min, apê te, xortê kin, deriyê mezin…

Xaniyê me mezin e.
Apê min ajokar e.

-ên; birayên min, mêvanên me, temaşevanên hêja…

Birayên min xwende ne.
Mêvanên me ji Wanê ne.

6- Di strana li jêr de cihên vala bi veqetandekên binavkirî dagirin.

Ez keç im keç___ kurdan im
Kulîlk___ ser__ lawan im
Rihan__ rez û çeman im
Lawiko ez bêrîvan im

Veqetandekên Nebinavkirî

-eke (yekjimar mê)
-ekî (yekjimar nêr)
-ine (pirjimar)

Mînak

-eke: keçeke dirêj, dareke bilind, maleke wêran
-ekî; zilamekî lawaz, xaniyekî mezin
-ine; hevaline min

*Li ber derî keç**eke** dirêj heye.*
*Heval**ine** min xwendekar in.*

7- Di nivîsa li jêr de veqetandekan bi cih bikin.

Mînak

Zarok**ên** bira**yê** jin**a** min nexweş in.

Nav__ dapîr__ min Asya ye. Ew şêst û sê salî ye. Por__ wê spî ye. Çav__ wê reş in. Ew qelew e. Bapîr__ min şêst û şeş salî ye. Nav__ wî Temo ye. Por__ wî spî ye.
Ap__ min heye. Navê wî Ferman e. Ew parêzer e. Navê amojin__ min Nazê ye. Ew bijîşk e. Ew gelekî xwîngerm e. Navê pismam__ min Firat e. Ew deh salî ye. Ew çavşîn e. Ew yekî şermok e.

8- Di nivîsa li jêr de binê veqetandekan xêz bikin.

Navê min Sîdar e. Ez mamoste me. Ez sî û pênc salî me. Ez ji Dêrikê me. Dêrik navçeyeke pir xweş e. Mirovên Dêrikê gelek xwîngerm in. Li Dêrikê darên gûzan û hinaran hene. Li Dêrikê dêreke ermenan heye.

Keçeke min heye. Navê keça min Berçem e. Ew deh salî ye. Du kurên min hene. Navên wan Hozan û Şerzan in. Hevsera min bijîşk e. Ew jineke jîr û jêhatî ye.

D- Heye / Hene

Li Dêrikê dêreke ermenan **heye.** (yekjimar)
Li Dêrikê darên gûzan **hene.** (pirjimar)
Keçeke min **heye.** (yekjimar)
Du kurên min **hene.** (pirjimar)

9- Li gorî agahiyên li jêr nivîsekê binivîsin.

Nav: Elîşêr

Temen: 42

Pîşe: karker

Bajar: Şemzînan / biçûk

Zarok: du kur; Siyabend, Serhat

Hevser: Gulîzer / dirûnker

_____

_____

_____

_____

_____

_____

10- Der heqê xwe û malbata xwe de nivîsekê binivîsin.

E- Tewang

a- Qertafên Tewangê yên binavkirî

-ê (yekjimar mê)
-î (yekjimar nêr)
-an (pirjimar)

Mînak

Bavê Azad**î** dirêj e.
Deriyê xaniy**î** **(xênî)** zexm e.
Ez ji bajar**î** **(bajêr)** têm.
Ez şivan**î** **(şivên)** dibînim.
Ez ji Azad**î** **(Azêd)** hez dikim.
Ez li ser xaniy**î** **(xênî)** me.
Ez nan**î** **(nên)** dixwim.

Bavê Dilan**ê** çeleng e.
Deriyê mal**ê** zexm e.
Sûrên Amed**ê** bilind in.
Dara hinar**ê** nizm e.
Ez ji Amed**ê** me.
Ez ji Delal**ê** hez dikim.
Ez li mal**ê** me.

Keçeke mêvan**an** heye.
Xaniyê cîran**an** mezin e.
Çavên zarok**an** dibiriqin.
Li gund**an** jiyan dijwar e.
Li Dêrikê darên gûz**an** hene.
Ez ji zarok**an** hez dikim.
Ew kulîlk**an** av dide.

Têbinî:

Tewandina navdêrên nêr ne mecbûrî ye.

b- Tewanga qertafên nebinavkirî

-ekê (yekjimar mê)
-ekî (yekjimar nêr)
-inan (pirjimar)

Ez ji keç**ekê** hez dikim.	Ez ji kur**ekî** hez dikim.	Ez ji zarok**inan** hez dikim.
Gul**ekê** bide min.	Nan**ekî** bikire.	Sêv**inan** bîne.

11- Bi peyvên li jêr hevokan çêkin.

1- Jêhat / xort / teral ***Jêhat xortekî teral e.***
2- Selma / ji / Mêrdîn _____
3- Por / min / dirêj _____
4- Ew / keç / jîr _____
5- Bav / min / zilam / zana _____
6- Dê / Azad / rûken _____
7- Xanî / wan / mezin _____
8- Bav / heval / min / parlamenter _____
9- Hevser / bira / Zozan / bedew _____
10- Derî / mal / me / zexm _____
11- Bira / Dîlan / mirov / hêja _____
12- Tu / jin / çalak _____
13- Ferhat / zilam / çeleng _____
14- Terî / pisîk / kurt _____
15- Li / Amed / dêr / ermen / hene _____
16- Ew / keç / zexel _____
17- Xanî / ap / wî / mezin _____
18- Bira / hevser / Cemîl / parêzer _____
19- Lîstik / zarok / xweş _____
20- Met / min / jin / jêhatî _____

Hevnasîn Danasîna Kesan Danasîna derdorê Spartek

A- Hevnasîn

1- Xebata destpêkê

Hûn ji kîjan cureyên muzîkê hez dikin?
Kêfa we ji kîjan stranbêjî/ê re tê?
Hûn Evdalê Zeynikê nas dikin?

1- Pirsên li jêr bibersivînin.

Hunermendeke ciwan

Meral Tekçî

Em dixwazin xwendevanên me te binasin.

- Ez di sala 1978'an li Stenbolê ji dayik bûm. Malbata min ji Çewlikê hatiye Stenbolê. Xwişkek û birayekî min hene. Ez hunermend im. Ez xebatên xwe yên hunerî di bin banê NÇM'ê de didomînim.

Tu ji kîjan hunermendên kurd hez dikî?

- Ez ji stranên Şivan Perwer pir hez dikim. Her wiha Mihemed Şêxo jî di jiyana min a hunerî de xwediyê cihekî taybet e. Strana Mihemed Şêxo ya bi navê "Cana min" ji bo min pir taybet e. Hin hevalên min bi navê "Cana min" gazî min dikin.

Di muzîka cîhanê de tu ji kîjan hunermendan hez dikî?

- Kêfa min gelekî ji hunermendên reşik re tê. Di deng û awaza wan de resenî û cihêrengî heye. Hunermendên mîna Tina Turner, Whitney Huston ji bo min gelekî dilkêş in. Her wiha ez ji muzîka enstrûmantal jî gelekî hez dikim.

Kêfa te ji pirtûkên kîjan nivîskaran re tê?

- Ez ji berhemên Murathan Mungan, Amîn Maalouf û Mehmed Uzun hez dikim.

Ji derhênerên sînemayê kêfa te ji kê re tê?

Ez ji fîlmên Behman Qubadî hez dikim. Nemaze fîlmên wî yên bi navê “Dema Hespên Sermest” û “Nîvê Heyvê” gelekî xweş in.

Projeyên te yên pêşerojê çi ne?

Em wekî Koma Şahiya Stranan amadekariya albûmeke nû dikin. Ez niha fêrî lêdana qanûnê dibim, ez dixwazim albûmeke enstrûmantal derxim.

Gelekî spas ji bo vê hevpeyvînê.

Spasxweş.

2- Cihên vala li gorî hevpeyvîna li jor dagirin.

1- Meral Tekçî di sala _____ de li Stenbolê ji dayik bûye.

2- Malbata wê ji _____ hatiye.

3- Ji hunermendên kurd ew ji _____ û _____ hez dike.

4- Kêfa wê ji pirtûkên _____, _____ û _____ re tê.

5- Li gorî wê fîlmên _____ gelekî serkeftî ne.

6- Ew hînî lêdana _____ dibe.

3- Peyvên hemwate bigihînin hev.

1- amadekarî	**a-** berdewamkirin
2- domandin	**b-** orjînal
3- resen	**c-** ciyawazî
4- cihêrengî	**d-** balkêş
5- dilkêş	**e-** eser
6- berhem	**f-** hazirî

1	2	3	4	5	6
f					

4- Ji hev bipirsin

1- Kêfa te ji kîjan beşa hunerê re tê?

2- Şano bala te dikişîne?

3- Tu ji kîjan lîstikvanê/a sînemayê hez dikî?

4- Kêfa te ji xwendina pirtûkan re tê?

5- Tu herî zêde ji kîjan helbestvanî/ê hez dikî?

Nivîs

Li gorî pirsên li jor paragrafekê binivîsin.

B- Danasîna kesan

Zozan 22 salî ye. Ew rojnameger e, di rojnameya Hemdem de dixebite. Ew li Stenbolê dijî, lê ji ber karê xwe li gelek cihan digere.

Zozan çavşîn û porzer e. Porê wê hilû ye. Ew keçikeke kej û bejindirêj e. Ew keçeke xwîngerm û rûgeş e. Zozan keçeke rûvekirî ye, lê hinekî pirbêj e.

Ew ji şano û sînemayê hez dike. Di dema mîhrîcanên sînemayê de li piraniya fîlman temaşe dike

Qenco karker e. Ew 25 salî ye. Ew di lêkirina avahiyan de karê siwaxê dike. Ew li Amedê dijî. Qenco zewicî ye, kurekî wî heye.

Ew yekî kurt û bejnzirav e. Lê di karê xwe de pir xurt e. Qenco ciwanekî çavreş û genimî ye. Porê wî qehweyî ye.

Qenco ji muzîkê pir hez dike. Kêfa wî gelekî ji dengbêjan re tê. Ew stranên Şakiro pir xweş dibêje. Dengê wî jî pir xweş e. Ew di civatan de stranan dibêje.

Rohat 35 salî ye. Ew lêkolîner e, li Beşa Dîrokê ya Zanîngeha Duhokê hîndekar e. Li ser dîroka nêzîk a kurdan lêkolînan dike, di vê mijarê de du pirtûkên wî hene.

Rohat yekî çavbelek e. Porê wî reş û kurîşk e. Ew yekî rûgenimî û bejnbilind e. Rohat yekî zana û têrtijî ye. Ew dilovan û mirovperwer e.

Ew ji xwendin û muzîkê hez dike. Ji ber karê xwe diçe gelek welatan û beşdarî gelek civîn û konferansên akademîk dibe.

Zelal 30 salî ye. Ew mamosteya biyolojiyê ye. Di karê xwe de pir serkeftî ye. Ew li Dêrsimê dijî.

Mamoste Zelal yeke çavreş û şitî ye. Porê wê jî mîna çavên wê reş e. Bejna wê zêde ne dirêj e û ew hinekî qelew e. Zelal miroveke henûn û zarşîrîn e.

Zelal gelekî ji suriştê hez dike. Gelek caran şagirtên xwe dibe nav dar û daristanan, der barê jiyana giha û ajalan de agahiyan dide wan.

1- Taybetiyên kesan li gorî nivîsan binivîsin.

Kes	pîşe	por	çav	bejn	xwî	heweskarî
Zozan						
Qenco						
Rohat						
Zelal						

Dema niha

peyivîn

Erênî	Neyînî
Ez **di**peyivim.	Ez **na**peyivim.
Tu **di**peyivî.	Tu **na**peyivî.
Ew **di**peyive.	Ew **na**peyive.
Em **di**peyivin.	Em **na**peyivin.
Hûn **di**peyivin.	Hûn **na**peyivin.
Ew **di**peyivin.	Ew **na**peyivin.

rûniştin

Erênî	Neyînî
Ez rû**di**nim.	Ez rû**na**nim.
Tu rû**di**nî.	Tu rû**na**nî.
Ew rû**di**ne.	Ew rû**na**ne.
Em rû**di**nin.	Em rû**na**nin.
Hûn rû**di**nin.	Hûn rû**na**nin.
Ew rû**di**nin.	Ew rû**na**nin.

Mînak:
- Kêfa min ji helbestên Feqiyê Teyran re tê.
- Ez ji dengê Mihemed Arifê Cizrawî hez dikim.
- Dema mîhrîcanên fîlmên kurdî çêdibin, ez li gelek fîlman temaşe dikim
- Zozan di rojnameya Hemdem de dixebite.
- Havîn li Stenbolê dijî.
- Rojnameger li gelek cihan digerin.
- Ew di rojnameyê de naxebite.
- Qenco stranên Şakiro pir xweş dibêje.
- Em li ser dîroka kurdan lêkolînê dikin.
- Hûn şagirtên xwe dibin nav dar û daristanan?
- Dema dikene xêzikên li rûyê wê kûrtir dibin û diranên wê yên zêrîn xuya dikin.
- Tu ji kesî naxeyidî.
- Zerê hêsirên keserê dibarîne.
- Pirî caran diçin nav baxçeyan, li bin daran rûdinin.

Têbinî: Di kurmancî de dema niha û dema fireh bi heman awayî pêk tên. Cudahiya wan ji wateya hevokê diyar dibe. Hin caran jî bi alîkariya hokerên demê her du dem ji hev tên veqetandin.

Mînak: Ez her sibe zû radibim. (dema fireh)
Ez niha pirtûkê dixwînim. (dema niha)

Dapîra min

Dapîra min Xecê di jiyana min de xwediyê cihekî taybet e. Keda wê li ser min gelek e. Sekna wê ya li hemberî dijwariyan jî hêjayî gotinê ye.

Niha temenê wê nêzî heftê salî ye, lê wekî jineke ciwan hê jî li ser xwe ye. Dema ku mirov wê dibîne, çavên wê yên zerîn û kilkirî bala mirov dikişînin. Çavên wê her dem bi keser û hûrbînî li cîhanê dinêrin. Porê wê yî spî û pêldar hê jî gur e. Bejna wê ya dirêj di ciwaniya xwe de pir bi nav û deng bûye. Deqa li eniya wê wek kulîlkeke nûbişkuvî ye. Dema ku dikene xêzikên li rûyê wê kûrtir dibin û diranên wê yên zêrîn xuya dikin.

Dapîra min jineke diltenik, xwîngerm û bîrbir e. Cîran û xizmên me her dem tên gilî û gazinên xwe jê re dikin û ew her dem bi sebreke bêdawî li wan guhdarî dike û ku ji dest wê bê alîkariya wan dike.

Her wiha ew jineke jîr û jêhatî ye. Di vî temenê xwe de hê jî karê xwe bi xwe dike. Ew gelek dilovan e, tu caran dengê xwe ji kesî re bilind nake û ji kesî naxeyide.

Dapîra min ji zarokan gelekî hez dike û pir xweş çîrokan dibêje. Dema ku zarokan li dora xwe kom dike, ji wan re çîrokan dibêje. Em hemû neviyên wê bi çîrokên wê mezin bûn. Ew ji şênahiyê jî pir hez dike. Pirî caran diçe nav baxçeyan û li bin daran rûdine.

2- Di nivîsa “Dapîra min” de li ser kesayetî, bejn û bal û heweskariya Xecê çi hatiye gotin?

Kesayetî : _____

Dirûv : _____

Bejn û bal : _____

Heweskarî : _____

Nivîs

Danasîna kesekê/î

Kesekê/î hilbijêrin û li ser pirsên li jêr bifikirin.

1- Navê wê/wî çi ye?
2- Ew çend salî ye?
3- Têkiliya we bi wî/wê re çi ye?
4- Çima ev mirov ji bo we girîng e?
5- Ew yeka/î çawa ye?(Kesayetî, dirûv, bejn û bal û heweskarî)

Li gorî bersivên xwe hûn jî nivîsekê li ser kesa/ê ku we hilbijart binivîsînin.

Dema ku… (Dema niha)

1- Dema ku mirov wê dibîne, çavên wê yên zerîn û kilkirî bala mirov dikişînin.
2- Dema ku dikene, xêzikên li rûyê wê kûrtir dibin.
3- Dema ku zarokan li dora xwe berhev dike, ji wan re çîrokan dibêje.

3- Beşên hevokan bigihînin hev.

1- Dema ku ew hevalên xwe dibîne,
2- Dema ku ez diçim Amedê,
3- Dema ku baran dibare,
4- Dema ku dinya germ dibe,
5- Dema ku dengê def û zirneyê tê,

a- ez dixwazim rabim govendê.
b- mirov berê xwe didin cihên hênik.
c- ez li mala xaltîka xwe dimînim.
d- bêhna axê tê.
e- gelekî kêfxweş dibe.

1	2	3	4	5
e				

C- Danasîna Derdorê

1- **Li ser van pirsan bipeyivin.**

1- Hûn ji ku derê ne?
2- Bajarê we li kîjan herêmê ye?
3- Hûn dîroka bajarê xwe dizanin?
4- Bajarê we bi çiyên xwe navdar e?

2- Sernavên paragrafan li gorî mijara wan binivîsin.

a) erdnîgarî **b)** serjimêr / dîrok **c)** çand **d)** aborî **e)** avahî **f)** cihên dîrokî

Bajarekî rûgeş: QOSER

_____

Qoser!.. Navçeya herî mezin a bajarê Mêrdînê ye. Navên Qoserê yên herî pêşîn Dunaysir û Tilêrmen in. Ev navçe bi ser bajarê Mêrdînê ve ye, lê ji Mêrdînê mezintir e. Qoser li başûrê rojavayê Mêrdînê ye. Li bakurê rojavayê wê, navçeya Dêrikê, li başûrê wê jî bajarê Amûdê heye. Ew li ser deşteke fireh e. Ev navçeya mezin li ser Riya Hevrişmê ya dîrokî ye. Ji ber vê yekê jî ji aliyê bazirganî ve cihekî girîng e.

_____

Qoser bi hezar salan berî Îsa ava bûye. Qoser di sala 1937'an de bûye navçeyeke Mêrdînê. Serjimêra navenda navçeyê ligel serjimêra gundan ji 200 hezarî zêdetir e.

_____

Gelek xaniyên kevn, dêr, mizgeft, turbe û bermahiyên dîrokî li vê navçeyê hene. Xaniyên ji kerpîçan balê dikişînin. Ev xanî, bi piranî yek tebeqe ne, du yan jî sê pencereyên wan hene.

_____

Pira Dunaysir a kevir, li ser çemê Zirganê ye. Ev pir di sedsala XII'an de ava bûye. Li Qoserê gelek dêrên dîrokî hene. Mizgefta Mezin mizgefta herî kevn a li Qoserê ye. Dîroka avakirina wê 1184-1204 e. Turbeya Şahkulî jî yek ji bermayiyên kevn e. Li kêleka turbeyê jî goristaneke gelekî kevn heye.

_____

Qoserî debara xwe bi çandinî, bi bazirganî, xwedîkirina sewalan, karê pîşesaziyê dikin. Li Qoserê bi dehan febrîqe hene û gelek kes li van deran dixebitin. Axa Qoserê ji sedî 94 bi kêrî çandiniyê tê. Li Qoserê nîsk, nok, pembo, titûn, genim, ceh û garis digihêjin. Tiştekî ku li vê derê bala mirov dikişîne jî erebeyên hespan in. Gelek kes debara xwe bi van erebeyan dikin.

_____

Gelê Qoserê, di warê parastina ziman, çand û hunera kurdî de xwediyê helwesteke taybet e. Li navçeyê jiyan bi kurdî ye. Li wir hinek dengbêjên navdar ên mîna Dengbêj Fadilê Kufragî, Şukriyê Baxustanî û Ezîzê Hejar hene.

3- Ji hevokên jêrîn ji bo yên rast stûna (r) ji bo yên çewt stûna (ç) xêz bikin.

	Hevok	r	ç
1	Qoser navçeya Sêrtê ye.		✓
2	Li bakurê rojavayê Qoserê Dêrik heye.		
3	Serjimêra fermî ya Qoserê 113 hezar e.		
4	Pira Dunaysir li ser Ava Spî ye.		
5	Mizgefta Mezin di salên 1184-1204'an de ava bûye.		
6	Li navçeyê jiyan bi temamî bi tirkî ye.		

4- Hûn jî li gorî xalên li jêr nivisekê der barê bajarê xwe de binivîsin.

a) erdnîgarî
b) serjimar
c) dîrok
d) aborî
e) çand

Daçek

bi .... de / re / ve	di ... de / re
Ez **bi** balafirê diçim.	**Di** mala me **de** çar jûr hene.
Kes **bi** min **re** nayê.	Ew **di** daristanê **re** dibore.
Tu **bi** ku **ve** diçî?	
Serheng **bi** ku **de** diçe?	

ji ... re / ve	li
Ew **ji** Amedê tê.	
Ji xwişka xwe **re** mebêje.	
Tevger **ji** jêr **ve** tê.	Ew **li** gundekî biçûk dimîne.

Daçekên hevedudanî

Daçek	Mînak
li ser	Em havînê **li ser** banî radikevin.
li ber	Zarok **li ber** malê dilîzin.
li bin	Em her roj **li bin** wê darê rûdinin.
li paş / li pişt	**Li paş** mala me dêrek heye.
li pêş	Ew **li pêş** dimeşin.
li dor	Pîrika min zarokan **li dor** xwe kom dike.
li cem	Hogir **li cem** xwişka xwe dimîne.
li hember	**Li hember** mala we kaniyek heye.
li rex	**Li rex** mala wan mizgeftek heye.
li nav	Ew **li nav** daran digerin.
li jêr	Zarok **li jêr** dilîzin.
li jor	Reyona pêlavan **li jor** e.

3- Cihên vala bi daçekan dagirin.

1. Mala me _____ avahiyeke mezin û bilind _____ ye.
2. Sosin _____ min _____ tê dibistanê.
3. Tu çima _____ min _____ nabêjî?
4. Sûrên Amedê _____ nav û deng in.
5. Ew debara xwe _____ çandiniyê dikin.
6. Xwişka min _____ dibistana seretayî _____ dixwîne.
7. Zelal _____ jor _____ diçe.
8. Hin mirov _____ aliyê rastê _____ tên.
9. Qoser _____ bajarê Mêrdînê _____ ye.
10. _____ bakurê rojavayê Qoserê, navçeya Dêrikê heye.

Lêkerên bi daçekan

Hinek lêkerên kurmancî bi daçekan pêk tên, bêyî daçekan nayên bikaranîn.

daçek	lêker
li	dar xistin / dar ketin / xwe kirin
bi	dawî bûn / dawî kirin / kar anîn / nav kirin / kêr hatin
ji	ber kirin / bîr kirin / holê rakirin / holê rabûn

Lêkerên ku ji hev dibin

daçek	navdêr	lêker
ji	yekî/ê - tiştekî	hez kirin / fêm kirin / qetandin / qehirîn / pirsîn / bawer kirin
li		nihêrtin / guhdarî kirin / temaşe kirin / gerîn / siwar bûn
bi		zanîn / kenîn / lîstin

6- Cihên vala bi lêkerên li jêr dagirin.

ji holê rabûn	li xwe kirin	li dar xistin	bi kar anîn	ji ber kirin	ji bîr kirin
bi dawî bûn	bi dawî kirin				

1- Em her şemî civînê _____.
2- Hin kevneşopiyên me hêdî hêdî _____.
3- Ez carinan rojbûna hevala xwe _____.
4- Dersên me di saet şeşan de _____.
5- Zarok di cejnan de kincên xweşik _____.
6- Şagirtên min peyvên nû _____.
7- Ez ji bo nivîsên xwe kompîturê_____.
8- Mamoste her tim waneyê bi pêkenokekê _____.

Cînavkên lihevxistî (I)

Daçek	Cînavka qertafî	Cînavka lihevxistî
li	ê	lê
di		tê
bi		pê
ji		jê

Mînak

1- Tu **ji bûyerê** agahdar î?
Belê, ez **jê** agahdar im.

2- Kî **li bajêr** dijî?
Hevaleke min **lê** dijî.

3- Kî **di kargehê de** dixebite?
Zozan **tê de** dixebite.

Têbinî:
Di dema dubarekirina hinek lêkerên daçekî de cînavkên "lê, jê, pê, tê" cihê navdêran digirin. Ji van lêkeran çend mînak:

jê hez kirin, **jê fêm kirin**, jê derxistin, **jê çûn**, jê birin, **jê cuda kirin**, jê avêtin, **jê qetandin**, jê qehirîn, **jê pirsîn**, jê bawer kirin, **lê guhdarîkirin**, lê gerîn, **lê siwar bûn**, bandor lê kirin, **lê ni-hêrtin**, pê zanîn, **pê kenîn**, bawerî pê anîn, **pê lîstin**.

Mînak

1- Tu li televizyonê temaşe dikî?
Belê, carinan ez lê temaşe dikim.

2- Ew ji xwendinê hez dike?
Na, ew zêde jê hez nake.

7- Cihên vala bi cînavkên lihevxistî yên li jêr dagirin.

lê, pê, tê, jê

Mînak:

- Tu qet li balafirê siwar bûyî?
*- Belê, ez pir caran **lê** siwar bûme.*

1) Karê te bi wî heye?
Belê, karekî min _____ heye.

2) Çi karê te pê heye?
Ez dixwazim _____ re tiştekî bibêjim.

3) Di mala wî de çend jûr hene?
_____ de sê jûr hene.

4) Tu dikarî vê nameyê ji Serhêng re bibî?
Belê, dikarim _____ re bibim.

5) Kê ev wêne bi dîwêr ve kiriye?
Min _____ ve kiriye.

6) Tu bi karê malê dizanî?
Na, ez zêde _____ nizanim.

Peyvên hevedudanî

Peyva yekemîn	Peyva duyemîn	Peyva hevedudanî
huner	perwer	hunerperwer
mam	hoste	mamoste
çav	reş	çavreş
por	lûle	porlûle
kêf	xweş	kêfxweş
roj	name	rojname
tehm	xweş	tehmxweş
çav	şîn	çavşîn
dil	tenik	diltenik
por	zer	porzer
xwîn	germ	xwîngerm
çav	belek	çavbelek
roj	ava	rojava
roj	hilat	rojhilat
mirov	perwer	mirovperwer
bejn	bilind	bejnbilind
rû	geş	rûgeş

A - Xebata li ser peyvan

1- Xaçepirs



Çeperast:

1- Rengekî çavan / Paşgirek, ron…, çal…
2- Cînavka kesa yekem a yekjimar û xwerû / Dema berî şevê
3- Dayik / Rojeke hefteyê
4- Qerz / Çak, rind
5- Îrade / Hejmarek / Pêşgireke lêkersaz
6- Pêxemberek / Gihanekek
7- Xwarina bingehîn / Sembola radyûmê / Kêra ne tûj
8- Beşeke bedena mirov; serî û laş digihîne hev.
9- Aliyê li hemberî rojhilat / Rayeka dema niha ya lêkera "zan".

Serejêr:

1- Robar, ava ku diherike / Cînavkeke şanîdanê (tewandî)
2- Serbestî / Cihê ku erd û esman digihêje hev; ufq
3- Tevgera piştî qerf û henekan
4- Xeta ku mirov li ser dimeşe/Ben
5- Dildar
6- Nav û deng/Paşgireke kurdî; hût…, dêw…
7- Gihanekek
8- Ajalek / Dîzik
9- Kanê / Tiyatro

2- Cihên vala bi peyvên li jêr dagirin.

têkilî	beşdarî	bandor	resen	dilkêş	berhem	amadekarî

1- _____Cegerxwîn li ser min pir zêde ye.
2- Stranên Mihemed Şêxo gelekî _____ in.
3- Dengê Meryemxanê dengekî _____ e.
4- Ez ji _____ Qedrîcan pir hez dikim.
5- _____ berî kar pir girîng e.
6- _____ jinan a di siyasetê pêwîst e.
7- _____wî bi mirovan re pir baş e.

3- Cihên vala bi rengdêrên li jêr dagirin.

çavşîn	porzer	bejnbilind	çavreş	bejnkurt	bejnzirav	qelew	porkurîşk

1- Zozan keçeke _____ e.

2- Qenco xortekî _____ e.

3- Ronahî keçeke _____ e.

4- Pelîn keçeke _____ e.

5- Qenco yekî _____ e.

6- Serhat xortekî _____ e.

7- Hogir kurekî _____ e.

8- Tevger xortekî _____ e.

4- Peyvên hemwate bigihînin hev.

1. bîrbir
2. xwîngerm
3. mirovperwer
4. pirbêj
5. dilovan
6. henûn
7. zarşîrîn
8. diltenik

a- xwînşîrîn
b- humanîst
c- biaqil
d- birehm
e- zimanxweş
f- piraxêv
g- mulayîm
h- dilzîz

1	2	3	4	5	6	7	8
c							

B- Xwendin û bikaranîna zimên

Hiner Selîm

1- Lêkerên di nava kevanekê de li gorî dema niha bikişînin.

Kek Hiner rojbaş. Xwendevanên me te baş _____ (nasîn).
Lê dîsa jî tu dikarî piçekî behsa xwe bikî. Hiner Selîm kî ye û niha çi _____ (kirin)?
Hiner Selîm kî ye? Tiştê esasî û girîng ez însan im û kurd im. Wekî din jî ez gerok im û _____ (gerîn). Fîlmê min ê bi navê DOL di meha berfanbarê de _____ (ketin) vîzyonê.
Wek gelek tiştên din ên kurdan beşa sînemayê bazarake vala ye. Hûn bi çi astengiyan re rû bi rû _____ (mayîn)?
Li welatê me sînema qet tune yan jî pir kêm e. Miletê min _____ (çûn/neyinî) sînemayê. Sînemaya xwe _____ (nasîn/neyînî). Lê ez û derhênerên wek Behmanê Qubadî em karê xwe berdewam _____ (kirin) û ji bo nifşên nû fîlman _____ (kişandin). Li Kurdistanê sînemayek jî fîlmên min nîşan _____ (dayîn/neyinî). Lê fîlmên min li festîvalên navdar ên wek Venedîk û Cannesê beşdarî pêşbirkan _____ (bûn).

Mîzah di fîlmên te de temaya sereke ye. Ji bo te sînorê mîzah û realîzmê çawa ji hev cuda _____ (bûn)?
Ez _____ (xwestin) behsa trajediya kurdan bikim lê ew trajedî pir mezin e, lewma jî ez wê bi alîkariya mîzahê pêşkêş _____ (kirin).
Bi rejîsorên din ên kurd re pêwendiyên te çawan in? Carinan hevkarî di navbera we de pêk _____ (hatin)?
Kêfa min pir ji kar û enerjiya Behmanî re _____ (hatin).
Hestên te yên ji bo Diyarbekirê çi ne?
Her ku ez di Diyarbekirê re derbas _____ (bûn) hêsir bi çavên min _____ (ketin). Hêviya me jî, şîn û şahiya me jî Diyarbekir e.
Tu niha bi çi mijûl _____ (bûn)? Tu dikarî piçekî behsa fîlmê DOL bikî? Li ser wî hêviyên te çi ne?
Fîlmê DOL li her çar parçeyên Kurdistanê derbas _____ (bûn). Aktorên wî kurdên ji hemû beşan in. Ji Bakur Nazmî Qirik, Belçîm Bîlgîn, Abdullah Keskîn û Rojîn, ji parçeyên din jî Ciwan Haco, Omar Çavşîn, Behmen Hacî û hunermendeke tirk Ayten Soykok û pir kesên din tê de rol _____ (girtin).
Gelek spas kek Hiner. Em ji bo te serkeftinê _____ (xwestin). Gotina te ya dawî ji bo xwendevanên me çi ye?
Ez jî spas dikim û serketina te dixwazim.

2- Li gorî bersivên li jêr pirsan binivîsin.

1- _____?
Fîlmê Hiner Selîmê bi navê DOL di meha berfanbarê de dikeve vîzyonê.

2- _____?
Fîlmên Hiner Selîm li festîvalên Venedîk û Cannesê beşdarî pêşbirkan dibin.

3- _____?
Hiner Selîm di fîlmên xwe de behsa trajediya kurdan dike.

4- _____?
Kêfa Hiner Selîm pir ji Behman Qubadî re tê.

5- _____?
Fîlmê DOL li her çar parçeyên Kurdistanê derbas dibe.

3- Lêkerên di nava kevanekê de li gorî dema niha bikişînin.

1- Dema ku ez wê _____ (dîtin), ez kêfxweş _____ (bûn).
2- Dema ku bihar _____ (hatin), kulîlk _____ (vebûn).
3- Dema ku ez _____ (çûn) sînemayê, ez telefona xwe _____ (girtin).
4- Dema ku ez hişyar _____ (bûn), ez serçavên xwe _____ (şûştin).
5- Dema ku roj _____ (çûn) ava, dinya tarî _____ (bûn)

4- Cihên vala bi peyvên li jêr dagirin û peyvên hevedudanî pêk bînin.

ken	germ	tenik	perwer	name	xweş	bilind

1- bejn_____ **3-** roj_____ **5-** xwîn_____ **7-** rû_____
2- kêf_____ **4-** dil_____ **6-** mirov_____

5- Cihên vala bi peyvên li jor tijî bikin.

1- Rojda keçeke _____ e. Ew bi hêsanî bi mirovan re hevaltiyê datîne.
2- Delal ji mirovan gelekî hez dike. Ew yeke _____ e.
3- Dîlan keçeke _____ e. Ew gelekî li ber zarokên bêxwedî dikeve.
4- Ez her sibe _____ Azadiya Welat dixwînim.
5- Serhat xortekî _____ e. Ew basketbolê dilîze.
6- Ez îroj gelekî _____ im. Ez bi hevalên xwe re me.
7- Ez tu carî wê mirûzkirî nabînim. Ew gelekî _____ e.

6- Cihên vala bi cînavkên lihevxistî dagirin.

1- Tu kengî li birayê xwe geriyayî?
Ez duh _____ geriyam.

2- Te çima ji hevalê xwe re jî sêvek neanî?
Ez ê niha _____ re bînim.

3- Di dibistana we de çend mamoste hene?
_____ de bîst û pênc mamoste hene.

4- Tu bi rastiya mijarê dizanî?
Belê, ez _____ dizanim.

5- Ew bi hevala xwe re çû dibistanê?
Belê, ew _____ re çû.

6- Kê duh ji Hêlînê re derî vekir?
Min _____ re derî vekir.

7- Cihên vala bi daçekan dagirin.

1- Mala me _____ Amedê ye.
2- Ez _____ zanîngehê _____ dixwînim.
3- Ew _____ nav daristanê _____ derbas dibe.
4- Pîrika min _____ me _____ çîrokan dibêje.
5- Ew _____ mala xaltîka xwe tê.
6- Mizgîn _____ jêr _____ tê.
7- _____ darê hin çivîk hene.
8- Komek zarok _____ aliye çepê _____ tên.
9- Em _____ keştiyê çûn Girava Axtamarayê.
10- Mala Zozanê _____ dûr _____ xuya dike.
11- Tu _____ ku _____ diçî?
12- Ev _____ çiqasî ye?

A- Rûpelek ji dîrokê

1- **Pirsên li jêr nîqaş bikin.**

1- *Bajarê Mehabadê li ku derê ye?*
2- *Bajarê Mehabadê çi tîne bîra we?*
3- *Qazî Mihemed kî ye?*

Avabûna Komara Kurdistanê

Kurdan di sala 1945´an de li bajarê Mehabadê rêxistineke bi navê "Komeley Jiyanewey Kurd" ava kir. Vê rêxistinê di sala 1945'an de navê xwe kir "Partiya Demokrat a Kurdistanê". Qazî Mihemed bû serokê vê partiyê. Wî di 22'yê Rêbendana sala 1946´an de li Qada Çarçirayê avabûna Komara Kurdistanê îlan kir. Di 11'ê Reşemiya sala 1946´an de parlementerên komarê sond xwar û dest bi karê xwe kir. Wan Mehabad wek paytexta Komara Kurdistanê diyar kir.

Komara Kurdistanê salekê dom kir, lê di wê demê de pêşengên komarê di warê aborî, civakî û çandî de gelek karên hêja kirin. Rojname û kovarên mîna "Kurdistan", "Nîştîman", "Hawarî Nîştîman", "Helale" di vê demê de derketin. Ji bo zarokan jî kovareke bi navê "Girûgalî Mindalan" derket. Di dema komarê de radyoyeke kurdî hebû. Cara pêşîn bi navê "Dayikî Nîştîman" şanoyeke operayî li hemû bajarên Kurdistanê derket ser dikê.

Rewşenbîrên mîna Hesen Qizilcî, Hêmin û Hejar jî di avakirina komarê de peywir girtin. Di wê demê de ji bo parastina komarê artêşek ava bû. Dewleta Îranê di 31'ê Adara 1946'an de bi êrîşekê Komara Kurdistanê hilweşand. Hêzên dagirker serokê komarê Qazî Mihemed û hevalên wî li Mehabadê, li Qada Çarçirayê bi dar ve kirin.

2- Pirsên li jêr li gorî nivîsê bibersivînin.

1- Kurdan rêxistina bi navê “Komeley Jiyanewey Kurdistan” li ku derê ava kir?

_____

2- Serokê Partiya Demokrat a Kurdistanê kî bû?

_____

3- Qazî Mihemed Komara Kurdistanê kengî îlan kir?

_____

4- Komara Kurdistanê çiqasî dom kir?

_____

5- Di vê demê de kîjan kovar û rojname derketin?

_____

6- Kîjan rewşenbîran di karên komarê de peywir girtin?

_____

7- Komara Kurdistanê kengî hilweşiya?

_____

3- Peyvên li jêr bigihînin wateya wan.

1- rêxistin
2- komar
3- serok
4- aborî
5- civakî
6- çandî
7- kovar
8- şano
9- paytext
10- artêş
11- peywir
12- êrîş

a. pergala serweriya gel
b. pêşeng, rêber
c. îqtisadî
d. kulturî
e. tevger, dezgeh
f. cureyeke weşana peryodîk
g. serbajar
h. vatinî, wezîfe
i. cerd û hicûm
j. tiyatro
k. hêzên çekdar
m. komeleyetî, sosyal

1	2	3	4	5	6	7	8	9	10	11	12
e											

Dema boriya têdeyî

Lêkerên negerguhêz	Lêkerên gerguhêz	Mînak:
Ez hatim.	Min ew dît.	**1-** Qazî Mihemed bû serokê Partiya Demokrat a Kurdistanê. **2-** Parlementerên komarê sond xwar û dest bi karê xwe kir. **3-** Gelek rojname û kovar di vê demê derketin. **4-** Hinek rewşenbîrên navdar di avakirina komarê de peywir girtin. **5-** Dewleta Îranê 31’ê Adara 1946’an de Komara Kurdistanê hilweşand.
Tu hatî.	Te ew dît.	
Ew hat.	Wê ew dît.	
Em hatin.	Wî ew dît.	
Hûn hatin.	Me ew dît.	
Ew hatin.	We ew dît.	
	Wan ew dît.	

B- Kesayetiyeke dîrokî

1- Hemwateyên van peyvan di nivîsa jêrîn de bibînin.

bahoz	şair	heval	emir	navdar	cendek	beg	rehm	zîrek	eser	bîrbir
bager										

Melayê Bateyî

Navê Melayê Bateyî yê rastîn ‘Husên’ e. Ew di sala 1689’an de hatiye dinyayê. Ew li gundê Bateyê ji dayik bûye û li wir mezin bûye. Ew ji eşîra Ertoşan e. Melayê Bateyî mewlûdek nivîsandiye. Mewlûda wî gelekî bi nav û deng e. Melayê Bateyî di helbestên xwe de navê "Batî" bi kar aniye, lê di Mewlûda xwe de navê “Bate” bi kar aniye.
Wî li bajarê Miksê, di Medreseya Mîr Hesenê Welî de, digel Mîrê Miksê xwendiye. Li gorî gotinan, Melayê Bateyî û Mîrê Miksê destebirakên hev bûne. Melayê Bateyî her sal du-sê mehan li cem mîrê Miksê maye. Ev yek di helbesteke wî de jî heye.

Di sala dawiya temenê xwe de demeke dirêj li cem Mîrê Miksê maye û di dawiya demsala payîzê de xatir ji Mîr xwestiye û bi rê ketiye. Dema gihîştiye zozanên Berçelan, berf û bagerê dest pê kiriye û li wir çûye ber dilovaniya Xwedê. Termê wî heta biharê li wir maye. Biharê termê wî hatiye dîtin. Ji berîka wî helbestek derketiye. Di wê helbestê de bi van gotinan qala mirina xwe kiriye:

Ji çiriya paşiyê pê de
Melayê Bateyê kanê
Sefer kêşa bi Miksê de
Li ser weqtê zivistanê

(…)

Xunavê girtî nesrînê
Cemed çêbû li sewlînê
Giriya me tê ji bo asmînê
Zerî nayêne seyranê

Melayê Bateyî, zanayekî pir mezin û helbestvanekî şareza bû. Di sala 1755’an de koça dawîn kiriye û gora wî li Miksê ye.
Ev berhemên wî hene:

- Mewlûd
- Dîwan
- Destana Zembîlfiroş

2- Ji hevokên jêrîn ji bo yên rast stûna (r) ji bo yên çewt stûna (ç) xêz bikin.

	Hevok	r	ç
1	Navê rastîn ê Melayê Bateyî Mihemed e.		✓
2	Melayê Bateyî di sala 1689'an koça dawîn kiriye.		
3	Bateyî li Zozanên Çarçela koça dawîn kiriye.		
4	Ji berîka wî helbestek derketiye.		
5	Gora Melayê Bateyî li gundê Miksê ye.		
6	Zembîlfiroş berhema Melayê Bateyî ye.		

3- Bersivên pirsên li jêr bibînin û bi hevalên xwe re nîqaş bikin.

1- Mem û Zîn berhema kê ye?

_____

2- Helbesta bi navê "Dil ji min bir" kê nivîsandiye?

_____

3- Cegerxwîn kî ye?

_____

Dema boriya dûdar

Lêkerên negerguhêz	Lêkerên gerguhêz	Mînak:
Ez hatime.	Min tu dîtiye.	**1-** Melayê Bateyî di sala 1689'an de hatiye dinyayê. **2-** Ew li gundê Bateyê mezin bûye. **3-** Bateyî li bajarê Miksê xwendiye. **4-** Melayê Bateyî li cem Mîrê Miksê maye. **5-** Di dawiya demsala payîzê de xatir ji Mîr xwestiye û bi rê ketiye. **6-** Ji berîka wî helbest derketiye.
Tu hatiye.	Te ez dîtime.	
Ew hatiye.	Wê ew dîtiye.	
Em hatine.	Wî ew dîtine.	
Hûn hatine.	Me hûn dîtine.	
Ew hatine.	We em dîtine.	
	Wan ew dîtiye.	

Zembîlfiroş / Arîf Sevînç

C- Destanek

Zembîlfiroş zembîlan tîne
Delalo zembîlan tîne
Kolan bi kolan digerîne
Nan û danî pê distîne
Zarokan pê ditêrîne

Gava ew zembîlan tîne
Xatûn li bircê dibîne
Bi eşqa dil dihebîne
Aqil diçe sewda namîne

Çîroka Zembîlfiroş

Zembîlfiroş çîrokeke kurdî ye. Ev çîrok hem bi nivîskî heye, hem jî wekî stran û destan di nav gel de bi devkî tê gotin. Çîrok di dema Merwaniyan de li Farqînê derbas dibe. Li wî bajarî hê jî bi navê "Kela Zembîlfiroş" kelayek heye.

Zembîlfiroş ciwanekî xizan û çeleng bû. Zar û zêçên wî hebûn. Wî ji bo debara mala xwe selik difirotin. Ew ji bo firotina selikan li nava bajêr kolan bi kolan digeriya.

Rojekê di kolanê de dimeşiya, xatûnê ew dît, dilê wê kete Zembîlfiroş. Agirê evînê, dilê wê her tim disot. Xatûnê rojekê Zembîlfiroş anî serayê û evîna xwe jê re got.

Lê Zembîlfiroş yekî bawermend û dilpak bû, daxwaza wê nepejirand. Wî demeke dirêj li hemberî xatûnê li ber xwe da. Dawiyê wî riya xelasiyê nedît û xwe ji ser kelayê avête xwarê. Lê belê tiştek pê nehat, ew bû kevok û ber bi esmanan ve firiya.

1- Ev gotinên li jêr gotinên kê ne?

1- _____
Kuro selika vir de bîne
Mîr dixwaze te bibîne
Buha buha ji te bistîne
Lawiko ez birîndar im

2- _____
Xatûna min a delal e
Min bihîstî Mîr ne li mal e
Bazara'm bi malê helal e
Xatûnê ez tobedar im
Delalê ez tobedar im

3- _____
Zembîlfiroş lawikê beyan î
Ez dibêjim tu pê dizanî
Min bo eşqa dil tu anî
Lawiko ez evîndar im

4- _____
Xatûna min a zerîn e
Qusur li ser te qet nîn e
Lê dilêm kesî nahebîne
Xatûnê ez tobedar im
Delalê ez tobedar im

Gotinên strana Şivan Perwer

Dema boriya berdest

Li gorî lêkerên negerguhêz

Lêker	Qertafa dema niha	Rayeka dema borî	Kirde	Pêveber
ketin	di	ket	Ez	diketim.
			Tu	diketî.
			Ew	diket.
			Em	diketin.
			Hûn	diketin.
			Ew	diketin.

Li gorî lêkeren gerguhêz

Lêker	Qertafa d. niha	Rayeka d. borî	Kirde	Bireser (yekjimar)	Pêveber	Bireser (pirjimar)	Pêveber
birin	di	bir	min	name	dibir	name	dibirin
			te				
			wî/wê				
			me				
			we				
			wan				

Li gorî cînavkan lêkerên gerguhêz

Lêker	Kirde	Bireser	Pêveber
bihîstin	Wan	ez	dibihîstim.
		tu	dibihîstî.
		ew	dibihîst.
		em	dibihîstin.
		hûn	dibihîstin.
		ew	dibihîstin.

Li gorî lêkerên pêkhatî

Lêker	Kirde	Pêveber
rûniştin	Ez	rûdiniştim.
	Tu	rûdiniştî.
	Ew	rûdinişt.
	Em	rûdiniştin.
	Hûn	rûdiniştin.
	Ew	rûdiniştin.

Mînak:

1- Zembîlfiroş selik difirotin.
2- Ew kolan bi kolan digeriya.
3- Rojekê ew di kolanê de dimeşiya.
4- Agirê evînê, dilê Xatûnê her tim disot.
5- Ew her roj di ber mala me re derbas dibû.
6- Ew her roj serê sibê zû radibû.
7- Deriyê malê hin caran jixweber vedibû.

2- Lêkerên di nava kevanekê de bikin forma boriya berdest.

Gundên êzidiyan

Em di zarokî û ciwaniya xwe de ji zozanan _____ (çûn) bajarê Qersê. Em pêşiyê di gundê Yemençayirê û paşê jî di gundên Şîrînkoy û Şatiroxluyê re derbas _____ (bûn). Ev gund berê sê gundên kurdên êzidî bûn, wekî sê bûkên ciwan li dû hev rêz _____ (bûn). Kurdên êzidî zivistanan ev gund ji xwe re _____ (kirin) hêlîn û stargeh. Mehên biharê û havînê wan der-doran rengê bihuşteke derewîn _____ (wergirtin). Gundiyan li wan zozanan sê mehan di reşmal û xîvetan de jiyaneke gelek xweş _____ (bihartin), ew di navbera erd û esmên de _____ (jiyîn).

3- Lêkerên di nava kevanekê de bikin forma boriya berdest.

1- Par van deman ez li Hewlêrê _____ (gerîn).
2- Dapîra min ji me re çîrokên xweş _____ (gotin).
3- Bavê min _____ (çûn) bajêr û ez jî bi xwe re _____ (birin).
4- Zarok rojên cejna qurbanê _____ (hatin) ber deriyê me.
5- Diya min li ber serê min _____ (lorandin).
6- Min her sal ji birayê xwe re cotek pêlav _____ (kirîn).
7- Par havînê em her roj _____ (ketin) avê.
8- Siyabend û Xecê gelekî ji hev hez _____ (kirin).
9- Berê me kincên xwe bi destan _____ (şûştin)
10- Em li gund havînan li ser xaniyan _____ (raketin).

4- Lêkerên di nava kevanekê de li gorî demê bikêşin.

Pêkenok

Xwendekar piştî mamosteyê xwe _____ hundir. (ketin / dema boriya têdeyî)
Mamoste ji xwendekara xwe _____: (pirsîn/dema boriya têdeyî)
- Tu ji bo çi dereng _____? (man/dema boriya têdeyî)
- Mamoste, ez _____ (hatin/dema boriya berdest) dibistanê, lawikek bi pey min _____ (ketin / dema boriya têdeyî), hema bela xwe di min _____ (dan / dema boriya berdest), ji ber wê ez hinekî dereng _____ (man/ dema boriya têdeyî).
- Te çima lez _____ (kirin / neyînî / dema boriya têdeyî)?
- Ez çi bikim, lawik hêdî _____ (meşîn/ dema boriya berdest)!

Peyvsazî

Peyvên pêkhatî bi paşgira -î

Peyv	Paşgir	Peyva pêkhatî
civak	-î	civakî
çand		çandî
dilovan		dilovanî
gund		gundî
bajar		bajarî
zarok		zarokî
ciwan		ciwanî
qenc		qencî
xemgîn		xemgînî

Peyvên pêkhatî bi paşgira -dar

Peyv	Paşgir	Peyva pêkhatî
ol	-dar	oldar
birîn		birîndar
mal		maldar
evîn		evîndar
tobe		tobedar
deyn		deyndar
nav		navdar

5- Cihên vala bi peyvên li jêr dagirin.

tobedar	evîndar	ciwanî	xemgînî	oldar	gundî

1- Kalikê min mirovekî _____ bû.
2- _____ min li Amedê derbas bû.
3- _____ serê sibê diçin cot.
4- Zembîlfiroş mirovekî _____ bû.
5- Mem û Zîn du _____ bedbext bûn.
6- _____ bi te nakeve, hinekî bikene.

D- Serpêhatî

1- Li gorî pirsên li jêr qala bîranîneke xwe bikin.

çi, li ku, kengî, çawa, bi kê re qewimî?

2- Biwêjên li jêr di nivîsê de bibînin û wateya wan hîn bibin.

li ber ketin, qirik li xwe qetandin, **dil li yekî geş kirin,** berê xwe dan, **dil germ bûn,** li dû xwe kaş kirin, çavên xwe li derdorê gerandin, **dil sotin,** di dil de mayîn, **li dû xwe hiştin**



Bîranînek

Mînîbûs li ser riya nûqîrkirî bi lez diçû. Çavên min li çiyan, ez di nav xeyalan de bûm. Ez bi qîrînekê veciniqîm. Jineke ciwan li tenişta min bû. Pitika li hembêza wê bi giriyê xwe dilê mirov disot. Jinika reben ji aliyekî ve li ber pitika xwe diket, ji aliyê din ve jî ji ber giriyê keça xwe şerm dikir.
"Ev sê roj in giriyê wê nesekiniye; wê bi girî qirik li xwe qetandiye; nexweş e, bijîşk got guhên wê kul bûne."
"Derbasî be". Min got û min dîsa berê xwe da derve. Dema ku min berê xwe da derve, em di riyên kevirî re diçûn navenda bajêr. Ji bo ku ez ji tu tiştî nemînim, min çavên xwe li derdorê digerandin.
Bajarok pir biçûk bû, lewre gihaştina navendê zêde dom nekir. Ez ji mînîbûsê peya bûm û min berê xwe da mala zaroktiya xwe.
Di rê de min ji bo gelek tiştan li dora xwe dinêrî; gelo li derdorê kesên nas hebûn? Li her quncikekî vê riyê serpêhatiyeke min hebû.
Dema ku ez di ber qehwexanayekê re derbas dibûm, min du sê rûyên nas dîtin; navserên zaroktiya min bi xêzikên kûr ên li ser rûyên xwe navserebûna min raberî min dikir. Mixabin min zêde kes nedîtin, hêviya dîtina du sê hevalan di dilê min de ma.
Ez gihaştim ber derî, hêdî hêdî di pêpelûkan re hilkişiyam. Xwişka min derî li min vekir. Min xwe radestî hembêza wê kir.
Li hundir xwarziyên min li dora min kom bûn. Pirs û bersivan dida dû hev, henekên xwarziyê min ê biçûk em dikenandin. Lê xemgîniyek di dilê min de hebû.
Piştî firavînê em ketin riya goristanê; di dilê min de hesreta dê û bavê min... Li ser gorê bi fikara wan rûniştim, girî di qirika min de bû girêk. Ji nişka ve germahiyêk li ser destên min peyda bû. Min serê xwe rakir û bi keçikeke biçûk; şeş heft salî re rû bi rû bûm. Wê bi bişirîn li rûyê min dinêrî. Çavên wê yên zerîn dişibiyan çavên diya min. Dema ku min lê nihêrt bi germahiyekê keniya. Dilê min germ bû û hêstir ji çavê min herikîn.
Dayika keçikê ew li dû xwe kaş kir û bir, wê dîsa jî li dû xwe dinêrî û ji min re dikeniya. Kenê wê dilê min geş kir û ji min re bû hêviya jiyaneke nû.
Roja din mînîbûs bi lez ji bajêr bi dûr diket, rêwiyên din xanî, kuçe, dar û hwd li dû xwe dihiştin; min jî zaroktiya xwe.

3- Di nivîsê de hevokên bi demên borî hatine avakirin li bin serenava rast binivîsin.

Dema boriya têdeyî

Ez bi qîrînekê veciniqîm.

_____

_____

_____

Dema boriya berdest

Mînîbûs li ser riya qîrkirî bi lez diçû.

_____

_____

_____

Dema boriya dûdar

Ev sê roj in giriyê wê nesekiniye.

_____

_____

_____

Rojhilat Dêrsimî

4- Bi çend hevokan qala zaroktiya xwe bikin.

1- Zaroktiya we li ku derbas bûye?
2- We kîjan lîstik dilîstin?
3- Kesî ji we re çîrok digotin?

Dema ku... (Demên Borî)

1- Dema ku ez di ber qehwexaneyekê re derbas dibûm, min du sê rûyên nas dîtin.
(Dema boriya berdest) **(Dema boriya têdeyî)**

2- Dema ku min bala xwe da derve, em diketin nav bajêr.
(Dema boriya têdeyî) **(Dema boriya berdest)**

3- Dema ku min lê nihêrt, ew bi germahiyekê keniya.
(Dema boriya têdeyî) **(Dema boriya têdeyî)**

4- Dema ku ez hatime dinyayê, bavê min pir kêfxweş bûye.
(Dema boriya dûdar) **(Dema boriya dûdar)**

5- Lêkerên di nava kevanekê de li gorî wateya hevokê bikişînin.

1- Dema ku min ew _____ (dîtin), ez kêfxweş _____ (bûn).
2- Dema ku em ber bi dibistanê ve _____ (çûn), baranê dest pê _____ (kirin).
3- Dema ku bavê min _____ (hatin), me şîv _____ (xwarin).
4- Dema ku ez hişyar _____ (bûn), berf _____ (barîn).
5- Dema ku şer _____ (qedîn), hemû penaber _____ (vegerîn) malên xwe.

A- Xebata li ser peyvan

1- Cihên vala bi van peyvan dagirin.

paytext	komar	serok	aborî	civakî	çandî	rêxistin	artêş	peywir	xizan

1- _____ Tirkiyeyê di sala 1923'yan de ava bûye.
2- Qazî Mihemed _____ Komara Mehabadê ye.
3- Berhevkirina çîrokên gelêrî xebateke _____ ye.
4- _____ Amerîkayê di sala 2003'yan Iraq dagir kir.
5- Şerê li Iraqê bû sedema pirsgirêkên _____ û_____
6- _____ Almanyayê Berlîn e.
7- Neteweyên Yekbûyî _____ navneteweyî ye.
8- Parastina mafên mirovan _____ her mirovî ye.
9- Şer li cîhanê dibin sedema _____

2- Ji peyvên li jêr ên bi wêjeyê re têkildar li cihên vala binivîsin.

bager, helbestvan, destebirak, çîrok, destan, zozan, dilovanî, nivîskî, devkî, şano, pêkenok, metelok, temen, berhem, pexşan



3- Xaçepirsê li gorî pirsan dagirin.



1- cihê parastî
2- konê spî
3- konê reş
4- bedew
5- sema
6- mala çivîkan
7- qenc

B- XWENDIN

Jînenîgarî

Behman Qubadî

Behman Qubadî di 1'ê Reşemiya sala 1969'an de li bajarê Banê hatiye cîhanê. Ew bajar li rojhilatê Kurdistanê nêzîkî sînorê Îran û Iraqê ye. Qubadî zarokê pêşî yê malbata xwe ye. Ew heft xwişk û bira ne. Ew heta 12 saliya xwe li Banê maye. Malbata wî ji ber pirsgirêkên civakî koçberî bajarê Sineyê bûye. Qubadî li wir dibistana amadehî qedandiye. Di sala 1992'yan ji bo xwendina bilind çûye Tehranê.

Qubadî bi wênekêşiyê dest bi karê hunerî kiriye. Wî dest bi xwendina derhêneriyê kiriye, lê ew beş neqedandiye. Wî bi kişandina kurtefîlman dest bi karê sînemayê kiriye.

Di nîveka salên 1990'î de kurtefîlmên Qubadî gelek xelatên navneteweyî wergirtine. Yek ji van fîlman "Jiyana di nav mijê de" ye. Ew kurtefîlm bûye navdartirîn belgefîlmê sînemaya Îranê. Wî ji gelek mîhrîcanên navneteweyî xelat wergirtine.

Di sala 1999'an de Qubadî fîlmê xwe yê bi navê "Dema Hespên Sermest" kişandiye. Ev fîlm yekemîn fîlmê dirêj ê kurdên Îranê ye. Qubadî bi vî fîlmî bûye derhênerekî navdar.

1- Valahiyên li jêr li gorî jînenîgariyê dagirin.

1- Behman Qubadî di sala_____ de hatiye cîhanê.

2- Bajarê _____ li Rojhilatê Kurdistanê nêzîkî sînorê Îran û Iraqê ye.

3- Qubadî li bajarê _____ dibistana amadehî qedandiye.

4- Behman Qubadî li _____ dest bi xwendina bilind kiriye.

5- Karê pêşîn ê Qubadî _____ bû.

6- Navê navdartîrin kurtefîlmê Qubadî _____ ye.

7- Dema Hespên Sermest yekemîn fîlmê _____ ê Behman Qubadî ye.

Nivîs

Li gorî pirsên li jêr jînenîgariya Mehmet Uzun binivîsin.

1- Mehmet Uzun di kîjan salê de li ku ji dayik bûye? (1953 / Siwêreg)
2- Kengî sirgûn bûye. (1977)
3- Mehmet Uzun sirgûnî ku derê bûye? (Swêd)
4- Ji ber çi Mehmet Uzun ji welêt derketiye. (ji ber ramanên xwe)
5- Yekemîn romana Mehmet Uzun kîjan e û wî ew kengî nivîsandiye? (Tu / 1984)
6- Mehmet Uzun pirtûka bi navê "Destpêka Edebiyata Kurdî" kengî nivîsandiye? (1992)
7- Di kîjan romana xwe de qala Celadet Bedirxan kiriye? (Bîra Qederê)
8- Mehmet Uzun kîjan salê xelata Torgny Segerstedt wergirtiye? (2001)
9- Ew kîjan salê vegeriyaye Tirkiyeyê û li kîjan bajarî maye? (2005 / Stenbol)
10- Mehmet Uzun kengî û bi kîjan nexweşiyê jiyana xwe ji dest da? (2007 / şêrpence)

C- Bikaranîna zimên

1- Lêkerên helbestê bikin forma boriya berdest.

Mînak:

Gava li dinê dibe bihar / Gava li dinê dibû bihar

Bihar

Gava li dinê dibe bihar,
dibişkivin devî û dar.

Dinya dibe wek gola şîn,
çîçek didin sed rengî bîn.

Xasma siban berbangê zû,
tev radibin ew teyr û tû.

Tev dikin şahî û saz,
hişyar dibin hulîlk û baz.

Bilbil dibe dengbêjê wan,
dike qîrîn ji dil û can.

(Osman Sebrî)



2- Beşên hevokên li jêr bigihînin hev.

1- Dema ku ji bajêr hat,
2- Dema ku baranê dest pê kir,
3- Dema ku em gihîştin cihê dîlanê,
4- Dema ku weşana Med Tv dest pê kir,
5- Dema ku Aramê Tîgran derkete ser dikê,

a. em li derve bûn
b. govend li dar bû.
c. barekî giran li piştê bû.
d. çoşa gel gihîşt asta herî bilind.
e. dilê hemû kurdan geş bû.

1	2	3	4	5
c				

Siyabend û Xecê / Arîf Sevînç

3- Lêkerên di nava kevanekê de bixin forma dema boriya berdest.

Siyabend û Xecê

Li ser Çiyayê Sîpanê Xelatê xortekî nêçîrvan _____ (gerîn). Navê wî xortî Siyabend bû. Siyabend xortekî çeleng û bedew bû. Wî ji keçeke bi navê Xecê hez _____ (kirin). Dilê Xecê jî di Siyabend de hebû. Bavê Xecê _____ (xwestin) keça xwe bide yekî dewlemend. Lewma jî keça xwe _____ (ne/dan) Siyabend.

Siyabend û Xecê her du jî dengbêj bûn. Dema ku wan bi dizî hev _____ (dîtin), dilê wan geş _____ (bûn), kêfa wan _____ (hatin), bi hev re henek _____ (kirin) û _____ (kenîn). Rojekê Siyabend, Xec re-vand û bir ser Çiyayê Sîpanê Xelatê. Ew bi bextê xwe şa bûn. Rojekê komek gakovî di wir re _____ (derbas bûn). Siyabend, tîr û kevanê xwe hildan û bi pey wan ket. Wî gakoviyek birîndar kir û xwest wî şerjê bike. Gakovî stroyê xwe li Siyabend xist û ew avêt binê gelî.

Xecê hinekî sekinî, deng ji Siyabend nehat. Ew bi lez li pey Siyabend çû. Gihaşt raserî gelî, dengê Siyabend hate wê. Siyabend birîndar bû, li binê gelî _____ (nalîn). Siyabend û Xecê gelek stran li ser hev gotin. Dawiyê, Xecê jî xwe avêt xwarê. Her du jî li wir mirin, lê evîna wan nemir bû.

- Xweza
- Jiyana li gundan
- Çanda gundan
- Gund û bajar
- Spartek

A- Xweza

1- Binê peyvên têkildarî xwezayê xêz bikin.

şahî **berf** pismam **pîvok** gul **xweş** çiya **heval** hewa **karker** lehî **dadgeh** qurm **kevir** parêzer **dar** mij û moran **baran** guldank **pel** pirpizêk **werzîş** mêrg **meh** newal **xemgîn** gelî **deşt** zozan **dayik** salname

Li Xerzan dema biharê

Berfê di şevekê de mala xwe ji warê Xerzan bar kiriye û çûye warên din. Rengê fîqspî cihê xwe daye biharê. Berfê di bin xwe de bihara rengîn amade kiriye. Bi rojan, bi mehan hêdî hêdî xebitiye. Bi dil û can gul û pîvokên biharê xwedî kirine. Piştre, şevekê bi lez û bez, çarika xwe ya spî ji ser rûyê Xerzan rakiriye û berê xwe daye serê Sîpanê Xelatê, serê Çiyayê Nemrûdê.

Êdî bihar e…

Hewa li Xerzan nîvgermî bûye. Ewrên tijî, xwe bi giranî nêzî Xerzan dikin. Lehî ji pozê Çiyayê Mereto bi şid diherikin û dar, qurm û keviran li ber xwe dibin… Çiyayê Mereto diheje, mij û moran ji serê wî radibin. Ev serê mehekê ye, ev barana har, ev barana dijwar, bi ser vî çiyayê serhişk û pozbilind de dibare. Ji çar aliyan ve lehî digihêjin Çemê Xerzan. Bi van lehiyan Çemê Xerzan gur û fireh dibe.

Di biharê de li Xerzan gul û sosin dibişkivin, deşt, zozan û geliyan dixemilînin. Bi xweşikiya biharê dilê xort û keçan, pîr û kalan geş dibe.

Bêhna biharê ji warê Xerzan bilind dibe. Kulîlkên berfê bi pelên xwe yên şîn û spî dibiriqin. Pirpizêk kirasên zêrîn li xwe dikin û bi kofiyên xwe yên morbelek hawîrdora xwe dixemilînin. Bayê biharê bi delalî pirpizêkan dihejîne, bêhneke xweş li derdora Çemê Xerzan belav dike.

2- Rengdêrên di nav nivîsê de bibînîn û li jêr binivîsin.

Rengdêr: fîqspî, rengîn, spî, nîvgermî, tijî, _____

_____

Hokerên çawaniyê

1- Bi rojan, bi mehan hêdî hêdî xebitiye.
2- Bi dil û can gul û pîvokên biharê xwedî kirine.
3- Piştre, şevekê bi lez û bez, çarika xwe ya spî ji ser rûyê Xerzan rakiriye.
4- Ewrên tijî, xwe bi giranî nêzî Xerzan dikin.
5- Lehî ji pozê Çiyayê Mereto bi şid diherikin.
6- Bayê biharê bi ahengî, bi delalî pirpizêkan dihejîne.
7- Deriyê malê ji nişka ve vebû.
8- Teyrê Sîmir bilind firiya.
9- Birayê min îro bi dilsarî çû ser karê xwe.
10- Roja cejnê bavê min bi kêfxweşî rabû.

3- Cihên vala bi hokerên li jêr dagirin.

bi lez	bêdeng	bi dizî	birêkûpêk	hêdî	rasterast	paşpêkî

1- Ez duh _____ hatim malê, kes pê nehesiya.
2- Ew karê xwe pir _____ dike, tu kêmasiyan tê de nahêle.
3- Pir _____ dimeşiya, lewma negihîşt trêna berî nîvro.
4- Trimpêl _____ dihat, li darê qelibî.
5- Meleyê Menşûr _____ li kerê siwar bûye.
6- Min armanca xwe _____ ji wî re got.
7- Hinek _____ ketin mala wî û gelek tiştên wî birin.

Ravekên rêzîn

1- Berfê şevekê çarika xwe ya spî ji ser rûyê Xerzan rakiriye.
2- Kulîlkên berfê bi pelên xwe yên şînspî dibiriqin.
3- Pirpizêk bi kofiyên xwe yên morbelek hawîrdora xwe dixemilînin.
4- Çavên wê yên zerîn bala mirov dikişînin.
5- Porê wê yê spî yê xelek hê jî gur e.
6- Bejna wê ya dirêj pir bi nav û deng e.
7- Kurê apê min ê mezin ji xwe re qesrek ava kir.
8- Darên daristana gundê me cih û warê teyr û tilûran in.
9- Gulên sor ên baxçeyê me çilmisîne.
10- Hespê beza yê hevalê min di pêşbaziyê de bû yekemîn.

a) Porê wî yê kurîşk spî bûye.
(navdêr + cînavk + rengdêr)

b) Hevalê bejnzirav û çavşîn pirsa te kir.
(navdêr + rengdêr û rengdêr)

c) Deriyê mala mezin ê zêrîn vebû.
(navdêr + navdêr + rengdêr + rengdêr)

d) Birayê xwişka hevsera min hat mala me.
(navdêr + navdêr + navdêr)

B- Jiyana li gundan

1- Pirsên li jêr nîqaş bikin.

Hûn der heqê jiyana li gundan de çi dizanin?
Peyvên pez, şivan, cot, zozan, bêrîvan û rez çi tînin bîra we?

Sîdar qala gundê xwe dike

Gundê me, gundekî biçûk e, lewre jî zêde bala kesî nakişîne. Gund li ser deştekê ava bûye, lê belê dora wî hemû çiya û gelî ne. Gundê me pişta xwe daye rojhilat, berê xwe daye rojava.

Ji ber ku li gund kar pir e, gundî sibê zû radibin û dest bi xebatê dikin. Li gund karbeşî heye ango her yek karekî dike. Hin diçin zevî û mêrgan. Hin diçin çêlekan didoşin.

Li gund karê her kesî diyar e. Gavan û şivanên gund pez û naxirê dibin mêrgan. Cotyar diçin cot, bermalî dêw dikêlin, nên dipêjin, bêrîvan diçin bêriyê. Li ber pêz şivan bi dilsojî li bilûrê dixin, dema ku bêrîvan tên, hinekî li bilûrê guhdariyê dikin, dûre bi şivanan re pez didoşin. Di heman demê de şivan û bêrîvan ji hev re stranan dibêjin. Li gund jî keç li dora kaniyê kom dibin, firaq û kincan dişon.

Li gund hilberîn, li ser ajaldarî û çandiniyê ye. Ji ber vê yekê tiştên têkildarî çandinî û ajaldariyê di jiyanê de cihekî pir mezin digirin. Gundî ji pêz; hirî, şîr, goşt bi dest dixin. Ji wan berên ajalan jî tiştên nû bi dest dixin. Wekî mînak; ji şîr jî mast, to, rûn, penêr çêdibin. Gundî, hiriyê bi teşiyê dirêsin û dikin ta. Dûre ew tevnê li dar dixin, xalîçe û berikan çêdikin.

Biharan gund pir rengîn dibe. Gul û sosin tev vedibin. Dengê berxan ji çiya û zozanan tê. Berf di-hele, ava berfê di çem û robaran de bi xumexum diherike.

Havînan roj pir dirêj in. Mirov hemû pir dixebitin. Pale tu rojê vala namînin. Dar û ber fêkiyan didin. Mirov dims, mewîj û beniyan çêdikin. Hinek gundî havînê diçin zozanan. Jiyana zozanan pir xweş û rengîn e.

Payîzan li gund hewa hênik dibe. Şêniyê gund ji bo zivistanê amadehiyê dikin. Roj hêdî hêdî kin dibin. Baranên payîzê dest pê dikin. Bêhn ji axê tê.

Zivistanê her roj berf û bager e, lewma pirî caran rê tên girtin. Şevên zivistanê pir dirêj dibin. Gundî, bi şev li malekê kom dibin û bi hev re dema xwe derbas dikin. Ji vê yekê re şevbuhêrk tê gotin. Di şevbuhêrkan de gundî li ser gelek mijaran dipeyivin, her wiha zana û rihspiyên gund jî şîretan li wan dikin. Gelek caran hin dengbêj jî tên û heta ber destê sibê distrên. Carinan jî çend dengbêj bi stranan diavêjin ber hev.



2- Pirsên li jêr bibersivînin.

1- Gund li cihekî çawa ava bûye?

_____

2- Çima gundî sibê zû radibin?

_____

3- Li gundan hilberîn li ser çi ye?

_____

4- Di kîjan demsalê de karê gundiyan pir e?

_____

5- Şevbuhêrk kengî çêdibin?

_____

6- Kî di şevbuhêrkan de stranan dibêjin?

_____

3- Navdêrên li jêr li cihên vala li gorî cureyê dabeş bikin.

bizin **mêrg** ga **gavanî** şivanî **zevî** cotyarî **zozan** rez **paletî** çêlek **berx**

bêrîvanî **çiya** dims **karik** gund **mewîj** mih **benî** dew **beran**

Kar: _____

Ajal: _____

Xwarin: _____

Cih: _____

Gihanek

1- Gundê me, gundekî biçûk e, lewre hejmara şêniyê gund pir hindik e.
2- Gund li deştekê ava bûye, lê belê dora wî hemû çiya û gelî ne.
3- Ji ber ku li gund kar pir e, gundî sibê zû radibin û dest bi xebatê dikin.
4- Li gundan karbeşî heye ango her yek karekî dike.
5- Zivistanê her roj berf û bager e, lewma pirî caran rê têne girtin.
6- Di şevbuhêrkan de gundî dipeyivin, her wiha zana û rihspî jî şîretan li wan dikin.
7- Li gund debar bi ajaldariyê ye, ji ber vê yekê ajal ji bo gundiyan girîng in.

4- Cihên vala bi gihanekan dagirin.

lewre	ango	her wiha	ji ber ku	lê belê	lewma	ji ber vê yekê

1- Ew her roj diçe kar, _____ nikare hevalên xwe bibîne.
2- Ez dixwazim herim betlaneyê, _____ derfetên min nîn in.
3- _____ li gund kar nîn e, gelek ciwan diçin bajaran.
4- Hogir dereng gihîşt malê, _____ zarokên xwe nedîtin.
5- Pişaftin _____ asîmîlasyon zimankujî ye.
6- Ziman dergûşa çanda gelan e, _____ bingeha nasnameya mirov e.
7- Êvarê zarok zêde li ber televîzyonê dimînin, _____ nikarin zû rabin.

C- Çanda gundan

1- Li ser pirsên li jêr nîqaş bikin.

1- Peyvên mîna dîlan, şahî, govend, bûk, zava, berbû, birazava û hine çi tînin bîra we?
2- Cudatî û hevpariyên dîlanên gund û bajaran çi ne?

Li Gundan Dîlan

Dîlanên gundan pir bi xweşî û şahî derbas dibin û bi rojan didomin. Di dîlanan de gel li ber def û zirneyê govendê digire. Hin caran bi dehan kes dikevin govendê, lewre jî serê govendê xuya nabe.

Hefteyekê berî dîlanê li mala bûkê hevalên bûkê, li mala zavê jî hevalên zavê, êvaran tên ba hev û şahiyê dikin. Li gundan dîlan sê rojan dom dikin. Roja hineyê komek ji mala zavê diçin mala bûkê, bi şahiyekê destê bûkê hine dikin. Xwesûya bûkê, zêrekî dixe kefa destekî bûkê û destên wê hine dike. Paşê li dor bûkê govendê digirin, dûrikan dibêjin. Hin caran dûrikan diavêjin ber hev. Şahî heta nîvê şevê dom dike.

Sibetirê berbû û hevalên bûkê, wê dixemilînin. Xêliya ji şarên kesk û sor û zer diavêjin ser serê wê. Piştî xemilandina bûkê, hemû vexwendî li ber deriyê mala bavê bûkê dicivin û bi klam û stranan bûkê ji malê derdixin û berê xwe didin mala zavê.

Bi nêzîkbûna berbûyan re zava jî derdikeve ser xênî, li hêviya bûkê disekine. Di dema peyakirina bûkê de, birazava jî şerbikekî tijî şekir li ber lingê bûkê li erdê dixe. Zarokên gund wan şekiran ji xwe re berhev dikin.

Vexwendiyên dîlanê, govendê saz dikin û heta nîvê şevê şahiyê dikin. Paşê, hemû beşdarên şahiyê diçin malên xwe. Dîlan jî li wir diqede.

Dûrik

Yar hine hine
Hineya me ya bajêr e
Me pîva bi elba zêr e
Hineya me ji bûk û zavê re

Yar hine hine
Hineya me ji Diyarbekir
Me pîva bi elba şekir
Têra bûka me nekir

2- Pirsên li jêr bibersivînin.

1- Di dîlanê de gundî li ber çi govendê digirin?

_____

2- Çima hin caran serê govendê xuya nabe?

_____

3- Şahî berî dîlanê bi çend rojan dest pê dike?

_____

4- Destên bûkê kî hine dike?

_____

5- Bûkê bi çi dixemilînin?

_____

_____

6- Di dema peyakirina bûkê de biraza çi dike?

_____

Nivîs

Li ser cudatî û hevpariya dîlanên gund û bajaran nivîsekê binivîsin.

_____

_____

_____

_____

Wekî navdêr bikaranîna lêkeran

Wekî lêker	Wekî navdêr
Ez çûm Amedê.	Çûna Amedê min kêfxweş dike.
Em kurdî hîn dikin.	Hînbûna kurdî pir xweş e.
Berfo hevalê xwe dît.	Ez ji bo dîtina te hatim bajêr.
Birayê min derî vekir.	Bi vekirina derî re hundir sar bû.
Min pirtûkek xwend.	Mirov bi xwendinê bi pêş ve diçe.
Wî gelek tişt gotin.	Bi vê gotinê re mirûzê gelekan tirş bû.

Mînak:

1- Piştî xemilandina bûkê, hemû vexwendî li ber deriyê mala bavê bûkê dicivin.
2- Di dema derxistina bûkê de, birayekî bûkê ji bavê zavê xelata xwe digire.
3- Bi nêzîkbûna berbûyan re zava jî derdikeve ser xênî.
4- Di dema peyakirina bûkê de, hevalekî zavê jî şerbikekî li erdê dixe.

3- Cihên vala bi lêkerên li jêr dagirin.

hatin **gotin** vebûn **xwestin** şûştin **kirin**

1- Bi _____ derî re bayekî hênik kete hundirê malê.
2- Bi _____ te gelek tişt guherîn.
3- Bi cilşoyê _____ kincan hêsan e.
4- Taybetiyên kar di dema _____ de diyar dibin.
5- Bi _____ tu kar naçe serî.
6- Bi vê _____ her tişt zelal dibe.

Cefen

Bûk û tûtik

Hebû tunebû, çûkek hebû. Çûkekî, bê kar û bar bû, dikire vîçevîç û li ser vê darê, wê darê vedinişt. Rojekê çûk westiya, xwest bêhna xwe vede û li ser striyekê venişt. Strî di lingê wî re çû. Kire hawar û firiya. Çû û çû, rastî pîrikê hat. Pîr li ber tenûrekê bû. Wê dixwest tenûrê vêxe, pif dikir nedikir agir pê nediket. Çûk çû li ser tenûrê venişt, ji pîrê re got:
- Pîrê, striyek ketiye lingê min, wî striyî derxe, biavêje tenûra xwe, pê agirê tenûrê vêxe û nanê xwe bipêje.
Pîrê got:
- Baş e!
Strî derxist, avêt tenûra xwe, agir pê ket. Pîrê nanê xwe peht. Dema ku pîrê nanê xwe yê dawîn ji tenûrê derxist û berê xwe da malê, çûko got:
- Pîrê ez striyê xwe dixwazim.
Pîrê got:
- Te xwest ez strî biavêjim tenûrê. Min jî avêt tenûrê û pê nanê xwe lê da.
Çûk got:
Ji min re çi, yan striyê min bide yan jî heft nanan...

Esma Sürücü

Pîrê got:
- Aman, yeman çûko wiha meke. Min bi xêra xwe strî ji piyê te derxist.
Pîrê kir nekir, çûko got:
- An striyê min an jî heft nan!
Pîrê ji mecbûrî heft nan dan çûko.
Çûko heft nanên xwe girtin firiya û çû. Di rê de keriyek pez û şivanek dîtin. Şivên bişkul diçandin nav taseke tijî şîr. Çûko çû li ser kevirekî venişt û got:
- Şivano, a ji te re heft nan, biçîne nav şîrê xwe û bixwe!
Şivên nan û şîrê xwe xwarin û zikê xwe têr kir. Piştre çûko got:
- Ka nanên min!
Şivan şaş ma, got:
- Min nanên te xwarin!
Çûko got:
- Ez dixwazim, tu nanên min bidî. An heft nanan an jî heft beranan...
Şivên ji mecbûrî heft beran dan çûko.
Çûko beranên xwe girtin û çû. Li gundekî dawet hebû. Mala dawetê dixwest req û beqan şerjê bikin û têxin xwarina dawetê. Çûko çû li ser darekê venişt û got:
- Dev ji wan req û beqan berdin! Van heft beranan şerjê bikin, bidin berbûyên xwe!.

Xwediyê dawetê beran şerjê kirin, her kesî xwar. Piştî xwarinê çûko beranên xwe xwestin.
Xwediyê dawetê got:
- Me beranên te şerjê kirin dan ber mêvanên xwe.
Çûko got:
- Ez heft beranên xwe dixwazim. An heft beranan bidin min, an jî bûkê...
Ji mecbûrî wan bûk da Çûko. Çûko bûka xwe girt û çû. Îcar berxvanek dît. Berxvên li ber berxan li tûtika xwe dida. Kêfa çûko ji dengê tûtikê re hat û got:
- Berxvano tu tûtika xwe bide min, ez jî vê bûkê bidim te!
Berxvên daxwaza wî qebûl kir. Çûko bûka xwe da berxvên û tûtika wî jê girt û çû li ser zinarekî venişt. Tûtika xwe xiste devê xwe got:
- Tû, tûûû!
Min striyê xwe da bi heft nanan,
Heft nanên xwe dan bi heft beranan,
Heft beranên xwe dan bi bûkekê,
Bûka xwe jî da bi tûtikekê!
Çîroka min li diyaran, rehmet li dê û bavê guhdaran.

4- Ji hevokên jêrîn ji bo yên rast stûna (r) ji bo yên çewt stûna (ç) xêz bikin.

	Hevok	r	ç
1	Çûko pir dixebitî.		✓
2	Strî di lingê çûko re çû.		
3	Şivên strî ji lingê çûko derxist.		
4	Pîrê heft nan dan çûko.		
5	Çûko ji xwediyê dawetê tûtik xwest.		
6	Çûko bûk da berxvên.		

5- Cihên vala li gorî nivîsa li jor dagirin.

_____ di lingê çûko re çû. _____ strî ji lingê çûko derxist û avêt _____ Çûko ji pîrê heft _____ standin. Çûko heft nan dan _____ û heft _____ ji şivên standin. Xwediyê dawetê li şûna _____ heft beran şerjê kirin. Çûko li şûna heft beranan _____ ji xwediyê dawetê stand. Berxvên _____ da çûko û bûk jê stand.

Raweya fermanî

Lêker	Raweya fermanî	Neyînî
çûn	biçe / biçin (here / herin)	meçe / meçin (neçe / neçin)
hatin	bê / bên (were / werin)	meyê / meyên (neyê / neyên)
kirin	bike / bikin	meke / mekin (neke / nekin)
birin	bibe / bibin	mebe / mebin (nebe / nebin)
xwendin	bixwîne / bixwînin	mexwîne / mexwînin (nexwîne / nexwînin)
vekirin	veke / vekin	vemeke / vemekin (veneke / venekin)
daxistin	daxe / daxin	damexe / damexin (danexe / danexin)

Mînak

1- Pîrê wî striyî derxe, biavêje tenûra xwe, pê agirê tenûrê vêxe û nanê xwe bipêje.
2- Çûko wiha meke!
3- Şivano van nanan biçîne şîrê xwe û bixwe!
4- Dev ji wan req û beqan berdin!
5- Van heft beranan şerjê bikin, bidin berbûyên xwe!
6- Berxvano tu tûtika xwe bide min.

6- Lêkerên di nava kevanekê de li gorî raweya fermanî bikişînin.

1- Lawê min nanê me qediyaye, _____ (çûn) du nanan _____ (anîn).
2- Hundirû zêde germ bû, paceyê _____ (vekirin).
3- Serê min diêşe, hebeke serêşê _____ (dayîn) min.
4- Karê min gelek e, alîkariya min _____ (kirin).
5- Xwişka te raketiye, dengê xwe bilind _____ (kirin / neyînî).
6- Ew der zêde ne ewledar e, bi tenê _____ (çûn / neyînî).

Raweya bilanî

Bilanî	Kesên sêyem	forma fermanî	forma neyînî
Bila	ew (yekjimar / pirjimar)	bide / bidin	nede / nedin
		bike / bikin	neke / nekin
		bixwe / bixwin	nexwe / nexwin

Mînak

1- Bila çavekî mirov tune be, bila bextê mirov hebe.
2- Bila dil ciwan be, bila sal pîr bin.
3- Bila mala te xera bibe, lê bila rûyê te spî be.

Pêşniyar

Cînavk	Lêker
Ez	biçim / bixwim / bidim / bibînim / bibêjim…
Em	biçin / bixwin / bidin / bibînin / bibejin…

Lêkera alîkar xwestin

Ez dixwazim Min xwest	(ez) biçim / neçim.
	tu biçî / neçî.
	ew biçe / neçe.
	em biçin / neçin.
	hûn biçin / neçin.
	ew biçin / neçin.

Mînak

1- Çûko xwest bêhna xwe vede.
2- Pîrê dixwest tenûrê vêxe.
3- Te xwest ez strî biavêjim tenûrê.
4- Ez dixwazim, tu nanê min bidî.
5- Xwediyê dawetê dixwest req û beqan şerjê bike.

7- Lêkerên di nava kevanekê de li gorî kesan bikêşin.

1- Ez dixwazim tu rastiyê _____ (gotin).
2- Te xwest ez _____ (çûn) mala wan.
3- Min dixwest hûn bajêr _____ (dîtin).
4- Kalikê min dixwaze serê salê _____ (hatin) serdana me.
5- Wî nexwestiye bi me re hevaltiyê _____ (kirin).
6- Hûn naxwazin li nava Amedê _____ (gerîn)?

D- Gund û bajar

1- Jiyana gund û bajaran bidin ber hev, li ser aliyên erênî û neyînî nîqaşê bikin.

Rapirsîn

Me der barê cudatiya jiyana li gund û bajaran de rapirsînek pêk anî. Em encama wê pêşkêşî we dikin.

Hêlîn:

Li gorî baweriya min, jiyana li bajaran xweştir e. Li gundan jiyaneke yeknesak heye. Derfetên bajaran zêdetir in, li vir jiyana civakî û çandî zindîtir e. Li bajaran mirov dikare biçe sînema, şano û konseran. Lê li gundan ev tişt nîn in. Çalakiyên çandî kêmtir in.

Rûken:

Jiyana li gundan pir xweş e. Ez par havînê sê mehan li gund mam, kêfa min pir ji jiyana li gund re hat. Li gundan hemû tiştên xwarinê suriştî ne, hewa paqijtir e. Têkiliyên mirovan germtir in. Şahî û dîlanên gundan xweştir in.

Delal:

Li gorî baweriya min jiyana li bajaran ji ya li gundan dijwartir e. Di jiyana li bajaran de tiştê dijwartirîn jî çûn û hatin e. Mirov heta ji taxekê diçe taxeke din roj li mirov dibe êvar. Li bajaran têkiliyên mirovan ne ji dil in, cîran hev nas nakin. Li bajaran dizî û şêlandin zêde ye, lewma jî jiyana li gundan ewletir e.

Xemgîn:

Ez ji jiyana li gundan hez dikim. Li gundan dema xweştirîn demsala biharê ye. Biharan li gundan jiyan rengîntir e. Dar û ber şîn dibin û kulîlk vedibin. Havînan li gundan sebze û fêkî zêdetir dibin. Lê zivistanan li gundan jiyan dijwar dibe, dema ku berf dibare û rê têne girtin, mirov nikare bi cihekî de biçe.

2- Pirsên li jêr bibersivînin.

1- Kê qala şahî û dîlanên gundan kiriye?

_____

2- Li gorî Hêlînê li gundan jiyaneke çawa heye?

_____

3- Li gorî Xemgîn jiyana li gundan kengî xweş e?

_____

4- Delal çima ji jiyana bajaran ditirse?

_____

Payeya rengdêran

Rengdêr	Hevrûkirin	Payeya berztirîn
paqij	paqijtir	paqijtirîn / herî paqij
dijwar	dijwartir	dijwartirîn / herî dijwar
geş	geştir	geştirîn / herî geş
berz	berztir	berztirîn / herî berz

Mînak:

1- Li gundan hewa paqijtir e.
2- Têkiliyên mirovan germtir in.
3- Şahî û dîlanên gundan xweştir in.
4- Derfetên bajaran zêdetir in, li vir jiyana civakî û çandî zindîtir e.
5- Li gundan çalakiyên çandî kêmtir in.
6- Bihar û havînan li gundan jiyan rengîntir e.
7- Jiyana li bajaran ji ya li gundan dijwartir e.
8- Li bajaran dizî û şêlandin zêdetir e, lewma jî jiyana li gundan ewletir e.

Cihên vala bi payeya hevrûkirinê ya rengdêran dagirin.

1- Gundê me ji bihuştê _____ e (xweş).
2- Havînan Wan ji Amedê _____ e (hênik).
3- Bavê min ji apê min _____ e (dirêj).
4- Taxa me ji taxa we _____ e (mezin).
5- Çemê Feratê ji Çemê Dîcleyê _____ e (boş).

4- Kî dizane?


Behra Wanê


Amed


Çiyayê Agirî

Çemê Feratê

1- Berztirîn çiyayê Kurdistanê kîjan e?
a) Cûdî **b)** Gabar **c)** Agirî **d)** Qendîl

2- Mezintirîn bajarê Kurdistanê kîjan e?
a) Qamişlo **b)** Mehabad **c)** Hewlêr **d)** Amed

3- Dirêjtirîn çemê Kurdistanê kîjan e?
a) Ferat **b)** Dîcle **c)** Mûrad **d)** Diyala

4- Mezintirîn gola Kurdistanê kîjan e?
a) Ûrmiye **b)** Wan **c)** Xezar **b)** Nemrûd

5- Di hokeran de paye

Awayê pêkhatina payeya hokeran jî mîna ya rengdêran e.

Mînak

Hevrûkirin	**Payeya berztirîn**
1- Ez ji te zêdetir dixebitim.	**1-** Herî zû Zozan gihîşt malê.
2- Hawar ji me zûtir hat.	**2-** Herî zêde Serhat xebitî.
3- Balafir ji keştiya esmanî hêdîtir diçe.	**3-** Herî dereng Hozan hate ser kar.
4- Baz ji kevokan berztir difirin.	**4-** Herî kêm Adar axivî.

Lêkerên hevedudanî

a- Bi lêkera kirinê

Hêmana pêşîn	Lêker	Lêkera hevedudanî
mezin	kirin	mezinkirin
bilind		bilindkirin
kom		komkirin
hîn		hînkirin
fireh		firehkirin
xwedî		xwedîkirin
bawer		bawerkirin
diyar		diyarkirin

b- Bi lêkera bûnê

Hêmana pêşîn	Lêker	Lêkera hevedudanî
derbas	bûn	derbasbûn
bilind		bilindbûn
kom		kombûn
hîn		hînbûn
geş		geşbûn
ava		avabûn

c- Bi hin lêkerên din

Hêmana pêşîn	lêker	Lêkera hevedudanî
nexweş	ketin	nexweşketin
biryar	dan	biryardan
rêz	girtin	rêzgirtin
bêhn	vedan	bêhnvedan
heyf	hilanîn	heyfhilanîn
gav	avêtin	gavavêtin
dereng	mayîn	derengmayîn

Têbinî: Lêkerên hevedudanî, di nava hevokê de dema ku wekî navdêr werin bikaranîn bi hev ve, dema ku wekî lêker bêne bikaranîn ji hev cuda têne nivîsandin.

Mînak: *Sîdar di ber min re derbas bû. Piştî derbasbûna wî min ew nas kir.*

Her wiha biresera lêkerên hevedudanî yên gerguhêz bi hêmana yekemîn re ravekê çêdike û dikeve navbera her du hêmanan.

Mînak: Ev mijar gelekî bala hevalan dikişîne.
Di demeke kin de biryara xwe bide.

Mînak

1- Bi van lehiyan Çemê Xerzan gur dibe.
2- Bi dil û can gul û pîvokên biharê xwedî kirine.
3- Berfê di bin xwe de bihara rengîn amade kiriye.
4- Bêhna biharê ji warê Xerzan bilind dibe.
5- Bi xweşikiya biharê dilê xort û keçan, pîr û kalan geş dibe.
6- Zozanên gundê me pir xweş û dilkêş dibin.
7- Mirov karên zivistanê xelas dikin.

5- Cihên vala bi lêkerên li jêr dagirin.

xwedîkirin	avakirin	derbasbûn	sorkirin	dilgeşbûn
komkirin	dengvedan	kombûn		

1- Min zarokên xwe bi zor û zehmetî _____
2- Zelal a niha di ber mala me re _____
3- Heval bi vê peyamê _____
4- Endazyar li hemberî me qesrek _____
5- Min îşev ji xwe re îsot _____
6- Di Newrozê de gelek kes li qadê _____
7- Mamoste xwendekarên xwe li dora xwe _____
8- Pirtûka Omer Dilsoz a dawîn gelekî _____

6- Bi lêkerên li jêr hevokan saz bikin.

1- biryardan _____
2- rêzgirtin _____
3- derengman _____
4- bêhnvedan _____
5- diyarkirin _____
6- hişyarkirin _____

A - Xebata li ser peyvan

1- Xaçepirs

	1	2	3	4	5	6	7	8	9
1						■			
2					■				
3				■				■	
4			■				■		■
5		■				■			
6					■				
7	■					■		■	
8			■						■
9				■					

Çeperast

1- Mange / Bi qerf û henekan pêk tê, dijwateya girî
2- Ava bi xwelî ya ku pê kincan dişon. / Ajalên ne kedî, ajalên berî
3- Hêlîna çûkan, navê weşanxaneyeke kurdan / cih û war
4- Cihê ku lê genim dihêrin. / Vexwarina ku dibe dew û mast.
5- Dema piştî êvarê, dema xwarina şîvê / Ajaleke hov û dirinde.
6- Şeva em tê de, ev şev. / Mirov lingê xwe dixê.
7- Jan kişandin.
8- Qertafa tewangê ya pirjimariyê. / Garan, dewar
9- Daxwaz, îrade. / Hevkarên dijminan

Serejêr

1- Fealiyet, kar û xebat / Vexwarina bingehîn.
2- Cerd, hicûm / Nişîtecih, ehlê cihekî.
3- Gihayê li ser hev komkirî û girêdayî / Hejmarek.
4- Cînavka şanîdanê ya xwerû û nêzîk / Bi şev mayîna li ber pêz.
5- Xwarina êvarê / Xwarina bingehîn, ji genim çêdibe.
6- Çala ku binî ji rûyê erdê dûr e, ... û dûr / Bi dimilkî xwe.
7- Xîvet û reşmal / çêlika mangeyê
8- Cînavka şanîdanê ya xwerû û nêzîk / Zarok, law / Di muzîkê de notayek.
9- Ji du paran parek. / Cihê mêwên tirî.

2- Peyvên li jêr li hemberî wateya wan binivîsin.

newal | mij û moran | lehî | mêrg | deşt | zevî | şivan | robar

1- Cihê ku lê çandinî tê kirin. _____
2- Sêlav, lêmişt _____
3- Kesê ku diçe ber pêz _____
4- Çem _____
5- Cihê rast _____
6- Cihê bi giha, çêregeh _____
7- Navbera du çiyan; dol, gelî _____
8- Dûyê li ser rûyê erdê _____

mih

bizin

rovî

hesp


çêlek

şêr

gur

dîk

pezkovî


mar

pisîk

piling

3- Ajalên kedî û kovî ji hev veqetînin.

Ajalên kedî						
Ajalên kovî						

4- Cihên vala bi peyvên li jêr dagirin.

şahî dîlan govend dûrik bûk xwesû berbû birazava

1- Li gundan _____ sê rojan dom dikin.
2- Di dîlanan de stranên govendê ango _____ têne gotin.
3- _____ û dîlanên gundan pir rengîn in.
4- _____ diçin bûkê tînin.
5- Demên berê _____ li hespan siwar dikirin.
6- Xezûr û _____ xelatê bi bûkê ve dikin.
7- _____ destê zavê hine dike.
8- Berbû li ber def û zirneyê _____ digirin.

5- Cihên vala bi rengdêrên li jêr dagirin.

fîqspî rengîn nîvgermî serbixwe serhişk pozbilind zêrîn dilkêş

1- Berbûyan cil û bergên _____ li xwe kirin.
2- Delal keçeke _____ e, gotin nakevin serê wê.
3- Xwesûya Hêlînê jê re kembereke _____ diyarî kir.
4- Ew tu carî nikare xwarina _____ bixwe.
5- Gelek berf bariya, deşt û zozanan cil û bergên xwe yên _____ li xwe kirin.
6- Hogir mirovekî_____ e, pir ji xwe hez dike.
7- Dema ku mirov ji ser çiyayê Nemrûdê li derdorê temaşe dike, dîmeneke _____ dibîne.
8- Ji bo welatekî _____ gelek berdêl hatin dayîn.

B- Xwendin

Gundekî kavilkirî

Hesena gundekî asûriyan bû. Ew gund li Navçeya Silopî û di qûntara çiyayê Cûdî de bû. Asûrî û kurd bi hev re di nava aştiyê de dijiyan. Ew bi ser hev de diçûn û dihatin. Ew di rojên xweş û reş de bi hev re bûn. Her wiha ew diçûn şahî û dîlanên hev jî. Ji ber vê yekê stran û govendên wan jî dişibiyan hev. Hesena gundekî gelek xweş bû; li gund dar û ber, rez, av, kanî, erd û zevî hebûn. Ji gundiyan hinek pîşekar, hinek jî cotyar bûn. Bi taybetî, di vî gundî de şal û şapik dihatin çêkirin. Ew şal û şapik gelekî bi nav û deng bûn.

Li gund dêrek û dibistanek jî hebûn û şêniyê gund ji berê de xwende bû. Lê belê, wekî gelek gundên navçeya Silopiyê ev gund jî di sala 1995'an de hate valakirin û kavilkirin. Gundî hemû reviyan û li cîhanê belav bûn. Gelek ji asûriyan çûn bajarên wekî Stenbolê. Hinek jî çûn Ewropayê. Hejmareke mezin ji şêniyê Hesena niha li paytexta Almanyayê Berlînê dijîn.

1- Ji hevokên jêrîn ji bo yên rast stûna (r) ji bo yên çewt stûna (ç) xêz bikin.

	Hevok	r	ç
1	Li gundê Hesena kurd û asûrî bi hev re dijiyan.	✓	
2	Ew gund li qûntara çiyayê Gabarê bû.		
3	Kurd û asûrî nediçûn şîn û şahiyên hev.		
4	Li gundê Hesena dêr û dibistan hebûn.		
5	Gund di sala 1995'an de hatiye avakirin.		
6	Şêniyê gundê Hesena hemû koçber bûne.		

C- Bikaranîna zimên

1- Cihên vala bi hokeran dagirin.

zû	hêdîka	bi dil û can	bi lez û bez	bi rêk û pêk	rasterast	paşpêkî

1- Ez serê sibê _____ rabûm, _____ çûm serşokê, min ser û çavên xwe şûştin, ez _____ ji malê derketim.

2- Ez di jiyana xwe de _____ tevdigerim. Ez hemû karên xwe di demê de diqedînim. Ez ji têkiliyên nejidil hez nakim, ez dixwazim bi mirovan re dostaniyên xwe _____ bidomînim.

3- Ez duh bi şev _____ çûm malê. Ji bo ku maliyan hişyar nekim, ez _____ ketim odeya xwe û razam.

4- Ew _____ li kerê xwe siwar bû.

2- Cihên vala bi veqetandekên pêwîst dagirin.

1- Birayê min ____ biçûk alîkariya min kir.

2- Di tiliya wê ____ girikê de gustîlek hebû.

3- Hevalên wan ____ rojên berê niha ji wan dûr ketine.

4- Mijara pirtûka dawîn ____ Mehmed Uzun balkêş e.

5- Guliyên dara gûzê ____ dirêj hatin birîn.

3- Her du hevokan bi gihanekê bikin yek hevok.

1- Îsal li welêt hişkesalî bû. Zevî hemû hişk bûn. (lewre)

_____

2- Ew gelekî xebitî. Ew di ezmûnê de zêde ne serkeftî bû. (lê belê)

_____

3- Ez duh nexweş ketim. Ez beşdarî xebatê nebûm. (lewma)

_____

4- Kes nikare zaravayê herî mezin ê kurdî qedexe bike.
Kes nikare kurmancî qedexe bike. (ango)

_____

5- Ji bo karekî serkeftî xebateke bi pergal pêwîst e.
Ji bo karekî serkeftî kedeke zêde pêwîst e. (her wiha)

_____

6- Wan gazî min nekir. Ez neçûm dîlana wan. (ji ber ku)

_____

4- Hevokên li jêr li gorî mînakê ji nû ve binivîsin.

Mînak
Min tu dîtî, ez pir kêfxweş bûm.
Ez bi dîtina te pir kêfxweş bûm.

1- Kulîlk vebûn, derdor rengîn bû.

_____

2- Tu çûyî, ez xemgîn bûm.

_____

3- Payîz hat, pelên daran weşiyan.

_____

4- Derî lêda, ez ji xewê hişyar bûm.

_____

5- Cihên vala bi raderên lêkeran dagirin.

belavkirin	qedexekirin	gotin	avakirin	kirin	pîrozkirin

1- Ji bo _____ rojnameyê me hevalekî ciwan dît.
2- Di dema _____ komeleyê de em bi hev re xebitîn.
3- Di dema _____ Cejna Newrozê de em li Amedê bûn.
4- _____ zimanekî li dijî nirxên mirovahiyê ye.
5- Te bi vê _____ xwe ez xemgîn kirim.
6- Ez vê _____ te bi tu awayî qebûl nakim.

Nivîs

Li ser daxwazên xwe yên pêşerojê pênc hevokan binivîsin.

Mînak: Ez dixwazim zimanê kurdî hîn bibim.

_____
_____
_____
_____

Ji bo yekî/a ku dixwaze kurdî hîn bibe pênc pêşniyaran binivîse.

Mînak: *Peyvên nû ji ber bike.*

_____
_____
_____
_____

6- Cihên vala bi payeya rengdêran dagirin.

Li gundan jiyan _____ (aram) e. Lê belê jiyana li bajaran _____ (rengîn) e. Di warê ewlehiyê de gund ji bajaran _____ (baş) in. Hewaya gundan ji ya bajaran _____ (paqij) e. Çalakiyên çandî û hunerî li bajaran _____ (zêde) in.

7- Kî dizane?

1- Berztirîn çiyayê cîhanê _____ e/ye.
2- Dirêjtirîn çemê cîhanê _____ e/ye.
3- Mezintirîn parzemîna cîhanê _____ e/ye.
4- Biçûktirîn gerestêrk _____ e/ye.
5- Li cîhanê cihê germtirîn _____ e/ye.

8- Cihên vala bi lêkerên hevedudanî dagirin.

bawerkirin	balkişandin	bêhnvedan	biryardan	diyarkirin

1- Wê hin tişt gotin lê min qet jê _____.
2- Gotinên wê pir _____ temaşevanan _____.
3- Piştî nîqaşeke berfireh me _____.
4- Me serê pêşîn armanca xebata xwe _____.
5- Em gelekî westiyan, lewre jî em li cihekî rûniştin û me _____ xwe _____.

A- Pêşnûçe

Dê biratiya gelan ji Mûnzûrê biherike

Şaredariya Dêrsimê dê îsal jî Mîhrîcana Çand û Xwezayê ya Mûnzûrê li dar bixe. Mîhrîcan di 9'ê gelawêjê de dê dest pê bike. Îsal dirûşma mîhrîcanê ev e: "Bila biratiya gelan ji Mûnzûrê biherike."

Bernameya mîhrîcanê dê balê bikişîne ser pirsgirêkên xwezayî û ekolojîk. Amadekarên mîhrîcanê wiha got: "Helbestên me dê bibin av û biherikin Mûnzûrê. Em ê bi gotûbêjan mijarên wekî jin, civak, xweza û aştiyê nîqaş bikin. Her wiha bi seyranan em ê erdnîgariya xwe ya pîroz û xweşik nas bikin. Em ê bi konseran jî dilgeş û kêfxweş bibin."

Dê mîhrîcan bi pêşwazîkirina mêvanan dest pê bike. Piştre jî dê

Mîhrîcan di 9'ê Gelawêjê de dê dest pê bike. Îsal dirûşma mîhrîcanê ev e: "Bila biratiya gelan ji Mûnzûrê biherike."

pêşandana dansê û konser pêk werin.

Roja yekemîn a mîhrîcanê dê gotûbêjek li ser rewşa jinan li dar bikeve. Roja yekemîn dê bi konsera mezin bi dawî bibe. Di roja duyemîn a mîhrîcanê de dê çalakiyên hunerî û wêjeyî derkevin pêş. Li aliyekî dê mêvan li fîlman temaşe bikin, li aliyê din jî dê helbestvan helbestên xwe pêşkêşî gelê Dêrsimê bikin. Di roja sêyemîn de hinek panel û gotûbêjên têkildarî rewşa siyasî hene. Di vê rojê de dê hunerperwer li fîlmê Behman Qubadî "Nîvê heyvê" temaşe bikin û li stranên Tara Jaff guhdariyê bikin. Mîhrîcan di roja çaremîn de dê bi konsera Mîkaîl Aslan biqede.

1- Pirsên bersivên li jêr binivîsin.

1-_____?
Mîhrîcana Mûnzûrê dê di 9'ê gelawêjê de dest pê bike.

2-_____?
Bernameya mîhrîcanê dê balê bikişîne ser pirsgirêkên xwezayî û ekolojîk.

3-_____?
Dê mîhrîcan bi pêşwazîkirina mêvanan dest pê bike.

4-_____?
Roja yekemîn dê bi konsera mezin bi dawî bibe.

5-_____?
Di roja sêyemîn de dê hunerperwer li stranên Tara Jaff guhdariyê bikin.

2- Peyvên hemwate bigihînin hev.

1- şaredarî	**a-** festîval
2- mîhrîcan	**b-** kêşe, mişkule
3- lidarxistin	**c-** slogan
4- pirsgirêk	**d-** guftûgo
5- dirûşm	**e-** pêrgînî
6- gotûbêj	**f-** nîşandan
7- pêşwazî	**g-**teqdîmkirin
8- pêşandan	**h-** belediye
9- pêşkêşkirin	**i-** sazkirin

1	2	3	4	5	6	7	8	9
h								

Hejmarên rêzîn

Di hejmarên rêzîn de paşgira /-emîn/ tê dawiya hejmarê.
Yekemîn, duyemîn, sêyemîn, çaremîn, pêncemîn…

Mînak:

1- Roja yekemîn a mîhrîcanê dê gotûbêjek li ser rewşa jinan li dar bikeve.
2- Mîhrîcan di roja çaremîn de dê bi konsera Mîkaîl Aslan biqede.

Gel çareseriyê dixwaze

Li Kurdistanê her sal ji ber sermayê mirov gelek zehmetiyan dikişînin. Wekî her sal dê îsal jî sir û seqem mercên jiyanê dijwartir bike. Li gundan mirov dê gelek zehmetiyan bikişînin. Ji ber berfa zêde dê têkiliya birek gundan bi bajaran re qut bibe. Ji ber vê yekê dê hin gundî nexweşên xwe negihînin nexweşxaneyan û dibe ku hinek ji wan jiyana xwe ji dest bidin.

Li bajaran jî dê mirov bi gelek zehmetiyan re rû bi rû bimînin. Ji ber kêmbûna derfetan dê mirov mecbûrî komira bêqelîte bibin, ew komir jî dê hewaya bajêr qirêjî bike.

Li piraniya bajarên Kurdistanê derdê zivistanê giran e. Lê belê nişteciheên bajarên mîna Agirî, Îdir, Dêrsim, Erzingan, Erzirom û Qersê ji destê sermayê zêdetir êş û janê dikişînin. Xuya ye ku îsal jî dê ji ber berfê rê bêne girtin. Dîsa dê wesayit di riyan de asê bimînin. Gelo heta kengî dê ev rewş bidome? Heta niha rayedaran ji vê rewşê re tu çare nedîtine. Gel ji rayedaran çareseriyê dixwaze.

Rengdêrên nebinavkirî

hin **hemû** gelek **hinek** tu **piçek** çendek **çend** birek **her** filan **bêvan**

Mînak

1- Şaredariyê li her taxa bajarê me parkek ava kiriye.
2- Li gelek cihan kurd û ermenî bi hev re jiyane.
3- Hinek mirov di kar û barê xwe de pir jêhatî ne.
4- Ez li tu deverê rastî wî nehatim.
5- Min piçek av ji jinên li ser kaniyê xwest.

3- Binê rengdêrên nebinavkirî yên di nav nivîsa li jor de xêz bikin.

Mînak: Li bajaran jî dê mirov bi gelek zehmetiyan re rû bi rû bimînin.

Dema bê

Ez ê kurdî hîn bibim.	Hogir dê biçe bajêr.
Tu yê kurdî hîn bibî.	Şaredarî dê parkeke mezin ava bike.
Ew ê kurdî hîn bibe.	Koçer dê ji zozanan vegerin.
Em ê kurdî hîn bibin.	Karker dê îsal zêde bixebitin.
Hûn ê kurdî hîn bibin.	Dema ku baran pir bibare dê lehî rabe.
Ew ê kurdî hîn bibin.	Hevalên min dê alîkariya min bikin.

Mînak

1- Mîhrîcana Dêrsimê di 9'ê Gelawêjê de dê dest pê bike.
2- Roja yekemîn a mîhrîcanê dê gotûbêjek li ser rewşa jinan li dar bikeve.
3- Mîhrîcan di roja çaremîn de dê bi konsera Mîkaîl Aslan biqede.
4- Li gundan mirov dê gelek zehmetiyan bikişînin.
5- Wekî her sal dîsa dê wesayit di riyan de asê bimînin.

4- Lêkerên di nava kevanekê de li gorî dema bê bikişînin.

Berf û baran tên

Li Kurdistanê serma bandora xwe zêde dike. Piştî roja înê dê berf û baran _____ (barîn) û di encamê de dê germahî 7-8 dereceyan kêm _____ (bûn). Li Amedê baran û li

deverên mîna Dêrsim û Çewlikê jî dê berf _____ (barîn). Li gorî agahiyên navenda meteorolojiyê hewaya ji bakur tê herêmê dê bandora xwe _____ (domandin). Li gelek deveran serma dê _____

(daketin) bin sifirê û bandora hewaya sar zêdetir bibe. Piştî 28'ê mijdarê roja înê li herêmê dê berf û baran bibare. Rayedaran da zanîn ku dê li

deştan baraneke gur _____ (barîn) û li hemberî îhtîmala lehiyê hemwelatî hişyar kirin. Hate daxuyandin ku li deverên bilind jî dê berf bibare.

B- Pêşbînî

1- Pirsên li jêr bibersivînin.

1- Li gorî we pirsgirêken sereke yên mirovahiyê çi ne?
2- Hûn pêşeroja mirovahiyê çawa dibînin?

Pêşbîniya ji bo siberojê

Me der barê rewşa cîhanê ya siberojê de rapirsînek kir. Der barê vê yekê de çend kesan dîtinên xwe vegotin. Em bersivên wan pêşkêşî we dikin.

Rapirsîn

Ez bi xwe hinekî bedbîn im. Li gorî baweriya min, rewşa cîhanê ber bi xerabiyê ve diçe. Ez dibêjim ku di pêşerojê de pirsgirêkên mirovahiyê dê zêdetir û girantir bibin. Dibe ku ji ber germahiya gerdûnî, ava li cemseran bihele û cîhan di bin avê de bimîne. Mirovahî bi vê helwesta xwe ya li hemberî xwezayê, hevsengiya ekolojîk xera dike. Wisa xuya dike ku di pêşerojê de dê koka gelek ajalan biqele. Mirov ne tenê koka ajalan her wiha koka dar û daristanan ji diqelînin. Ew yek jî dê cîhanê bike çol û çolistan. Berî ku cîhan bibe çol û çolistan hinek bergirî pêwîst in.

Adar

Ez bi xwe dema ku li rewşa niha dinêrim, rewşa pêşerojê min ditirsîne. Di pêşerojê de, dê mirovahî bi arîşeyên mezin re rû bi rû bimîne. Ez dixwazim li ser rewşa çandî çend tiştan bibêjim. Îro bi hezaran ziman bi mirinê re rû bi rû ne. Zimanzan diyar dikin ku dê ji sedî 50'yê zimanên heyî, di nava 50 salî de bibin zimanên mirî. Piştî ku ew ziman bimirin dê mirov mecbûrî çend zimanan bibin. Bi zimanan re dê gelek nirxên çandî jî winda bibin. Bi mirina her zimanî re dê gelek nirxên mirovahiyê ji holê rabin.

Zelal

Rewşa niha ya mirovahiyê, nîşana rewşa sibe ye. Îro bi hezaran kes di nav mercên giran ên aborî de dijîn. Ez wisa bawer dikim ku dê ew merc girantir bibin. Dibe ku bi milyonan kes bi birçîbûnê re rû bi rû bimînin. Dê di rojên pêş de dewlemend dewlementir, xizan xizantir bibin. Gelek kes dê ji kar bêne avêtin û girseya bêkaran dê zêdetir bibe. Ev yek jî dê bibe sedema şer û pevçûnan.

Sîdar

Baweriya min bi mirovahiyê heye. Li gorî dîtina min dê mirovahî di pêşerojê de ji pirsgirêkên cîhanê re çareseriyan bibîne. Mirovahî ji niha ve xetereya li ber xwe dibîne, ji bo vê yekê dê hevgirtina xwe xurt bike. Ez hêvî dikim ku mirovahî dê bi alîkariya zanist û teknolojiyê pirsgirêkan çareser bike. Hişmendiya mirovan a ji bo parastina xwezayê dê zêdetir bibe, dê zanist ji nexweşînan re dermanan bibînin. Lewre jî ez ji pêşeroja mirovahiyê hêvîdar im.

Evîn

2- Pirsên li jêr li gorî rapirsînê bibersivînin.

1- Li gorî Adar di encama germahiya gerdûnî de dê çi bibe?

_____

2- Ji ber çi dê cîhan bibe çol û çolistan?

_____

3- Zelal li ser kîjan xetereyê disekine?

_____

4- Kî li ser pirsgirêkên aborî dipeyive?

_____

5- Li gorî Evînê dê mirovahî bi alîkariya çi pirsgirêkan çareser bike?

_____

Nivîs

Li ser pêşeroja mirovahiyê dîtinên xwe binivîsin.

3- Peyvên li jêr li ber hemwateyên wan binivîsin.

hevsengî	arîşe	cemser	nirx	pevçûn	merc	hevgirtin
zanist	hişmendî	çareserî				

1- qutb _____
2- hevkêşe _____
3- pirsgirêk, kêşe _____
4- qîmet, hejayî _____
5- şert _____
6- şer, qirên _____
7- piştevanî, piştgirî _____
8- çaresazî _____
9- ilm _____
10- şiûr, serwextbûn _____

Dibe ku…

Ji bo nîşandana îhtimalê bi wateya belkî tê bikaranîn. Ji bo dema bê bi raweya merc û daxwaziyê pêk tê.

Dibe ku	ez	biçim.
	tu	biçî.
	ew	biçe.
	em	biçin.
	hûn	biçin.
	ew	biçin.

Mînak

1- Dibe ku bi milyonan kes bi birçîbûnê re rû bi rû bimînin.
2- Dibe ku sibe baran bibare.
3- Karê min li bajêr heye, dibe ku ez sibe biçim bajêr.
4- Otobûs hîn nehatiye, dibe ku ez hinekî dereng bimînim.
5- Bavê min hinekî nexweş e, dibe ku ez sibe wî bibim nexweşxaneyê.

4- Hevokên li jêr li gorî dîtina xwe temam bikin.

1- Di bîst salên bê de dibe ku _____
2- Di havîna sala bê de dibe ku _____
3- Bi saya teknolojiyê dibe ku _____
4- Heta sed salî dibe ku _____

Piştî ku / berî ku

Di rêzkirina bûyeran de tên bikaranîn.

Mînak

1- Piştî ku ew ziman bimirin, dê mirov mecbûrî çend zimanan bibin.
(raweya merc û daxwaziyê) **(dema bê)**

2- Piştî ku ew hat, me bernameya xwe guhart.
(dema borî) **(dema borî)**

3- Piştî ku ez hişyar dibim, ez taştê dixwim.
(dema niha) **(dema niha)**

4- Berî ku ew bê, em ê dest bi xebatê bikin.
(raweya merc û daxwaziyê) **(dema bê)**

5- Berî ku em biçin malê, em çûn sûkê.
(raweya merc û daxwaziyê) **(dema borî)**

6- Berî ku ez ji malê derkevim, ez dêrî qufle dikim.
(raweya merc û daxwaziyê) **(dema niha)**

5- Lêkerên di nava kevanekê de li gorî forma rast bikişînin.

1- Berî ku tu _____ (çûn), ez ê te bibînim.
2- Piştî ku wî karê xwe qedand, ew _____ (hatin) malê.
3- Piştî ku em şîvê bixwin, em ê li televizyonê temaşe _____ (kirin).
4- Berî ku ez rakevim, ez pirtûkekê _____ (xwendin).

Wekî gihanek “ku”

Gihaneka “ku” du hêmanên hevokê ango du komekan digihîne hev.

Mînak

1- Ez dibêjim ku di pêşerojê de pirsgirêkên mirovahiyê dê zêdetir û girantir bibin.
2- Wisa xuya dike ku di pêşerojê de dê koka gelek ajalan biqele.
3- Zimanzan diyar dikin ku dê di nava 50 salî de gelek ziman bimirin.
4- Ez wisa bawer dikim ku dê mercên aborî girantir bibin.
5- Ez bawer dikim ku mirovahî dê pirsgirêkên xwe çareser bike.

6- Hevokan li gorî xwe temam bikin.

1- Ez bawer dikim ku _____
2- Ez dibêjim ku _____
3- Min bihîst ku _____
4- Mamoste xwest ku _____
5- Gundiyan dît ku _____

Hevokên sedemê

a- ji bo……..

Ji bo xatirê te, ez hatim.
(navdêr)

Ji bo mafên xwe, me gelekî li ber xwe da.
(navdêr)

Celadet Bedirxan ji bo kurdan, gelek xebatên girîng kirin.
(navdêr)

b - ji bo ku ……..

Ji bo ku ez her tiştî bibînim, min li derdora xwe dinihêrî.
(raweya merc û daxwaziyê) **(dema boriya berdest)**

Ji bo ku keça wê negirî, ew ji hembêza xwe dananî.
(raweya merc û daxwaziyê) **(dema boriya têdeyî)**

Ji bo ku tu serkeftî bibî, te gelekî ked daye.
(raweya merc û daxwaziyê) **(dema boriya dûdar)**

7- Cihên vala bi lêkerên di nav kevanekê de dagirin.

1- Bavê min ji bo ku ji nexweşiyê xelas _____ (bûn), gelekî li ber xwe _____ (dan). Di dawiyê de jê rizgar bû.

2- Ji bo ku ew _____ (çûn) bajêr, ew li benda trimpêlê _____ (man). Trimpêl pir dereng hat.

3- Ji bo ku dêrî _____ (vekirin), li mifteyê _____ (gerîn), lê nedidît.

4- Ji bo ku ezmûna zanîngehê qezenc _____ (kirin), ew gelekî _____ (xebitîn) û bi ser ket.

8- Cihên vala bi “ji bo” yan “ji bo ku” dagirin.

1- _____ em dereng nemînin, me lez kir.
2- Min _____ te xwe ew qas westand.
3- Em _____ pêşeroja zarokên xwe xebatê dikin.
4- _____ xwarinê çêke, ew çû pêjgehê.
5- _____ pirsgirêka avê çareser bike, şaredariyê bîrên avê kolan.

9- Hevokên li jêr temam bikin.

Mînak

Ji bo ku biçe bajêr, li erebeyê siwar bû.

1- Ji bo ku xwe ji baranê biparêze, _____
2- Min ev pirtûk ji bo te _____
3- Ji bo ku bigihêje civînê, _____
4- Ez ji bo ezmûna wêjeyê _____
5- Ew xebat hemû ji bo _____



Rojhilat Dêrsimî

C- Nirxandin

Siberoj

Li ser pêşeroja cîhanê bîr û baweriyên cuda hene. Hin kes dibêjin ku dê pêşketina zanist û teknolojiyê jiyana mirovan hêsantir bike. Dê robot gelek karên mirovan bikin, bi vî awayî dê barê mirovan siviktir bibe. Heke robot karên me bikin em ê karibin zêdetir demê ji xwe re veqetînin. Bi vî rengî jî dê jiyana me xweştir bibe. Bi pêşketina bijîşkiyê re dê zanyar dermanê gelek nexweşiyan bibînin. Heke pêşketin bi vî rengî bidome, dê temenê mirovan dirêjtir bibe.

Hinek jî bi awayekî din rewşê dinirxînin û dibêjin ku heke rewş wiha bidome, dê gelek nexweşî û pirsgirêk derkevin holê. Li gorî dîtina wan, dê serjimara cîhanê gelekî zêde bibe. Li hin welatan dê bajarên pir mezin çêbin, li wan bajaran dê gelek balaxane ava bibin. Di van balaxaneyan de dê bi milyonan mirov bijîn.

Zanyar wisa bawer dikin ku serjimara zêde û bajarvaniya bêserûber dê wekî pirsgirêk bidomin. Zanyar pirsgirêkên wekî qirêjiya av û hewayê, germahiya gerdûnî û kêmbûna enerjiyê wekî xetereyên li ber mirovahiyê bi nav dikin.

Her wiha zanyar dibêjin, heke mirov hinek tedbîran negirin dê di nava sed salî de gelek zimanên heyî winda bibin. Bi taybetî zimanê ji mafê perwerdehiyê bêpar bi xetereyeke mezin re rû bi rû ne.

1- Li ser ramanên di nivîsê de nîqaşê bikin.

Raweya hekanî (merc)

Bi riya raweya hekanî, merc tên nîşandayîn. Di vê raweyê pêkhatina bûyerekê girêdayî mercan e. Li şûna heke "ku" jî tê bikaranîn.

Heke baran bibare, dê erd şil bibe.
(raweya merc û daxwaziyê) (dema bê)

Ku baran bibare, dê erd şil bibe.
(raweya merc û daxwaziyê) (dema bê)

Mînak

1- Heke robot karên me bikin, em ê karibin zêdetir demê ji xwe re veqetînin.
2- Heke pêşketin bi vî rengî bidome, dê temenê mirovan dirêjtir bibe.
3- Heke mirov hin tedbîran negirin, dê di nava sed salî de gelek zimanên heyî winda bibin.
4- Ku em bixwazin, em ê pirsgirêkan çareser bikin.

2- Her du hêmanên hevokan bigihînin hev.

1- Heke tu baş bixebitî	**a-** ez ê beşdarî civînê bibim.
2- Heke ew dereng bê	**b-** em ê biçin geşt û seyranê.
3- Heke baran nebare,	**c-** tu yê bi ser bikevî.
4- Heke ew gazî min bikin	**d-** ez ê jê re bibêjim.
5- Heke ez wî bibînim	**e-** em ê bêyî wî biçin.

1	2	3	4	5
c				

ZimanŒ kurd

Zimanzan diyar dikin ku dê ji sedî 50'yê zimanên heyî, di nava 50 salî de bibin zimanên mirî. Bi taybetî jî zimanên ji mafê perwerdehiyê bêpar bi vê xetereyê re rû bi rû ne. Ji ber ku kurdî ji mafê perwerdehiyê bêpar e, ev xetere li ber kurdî jî heye. Zimanzan û têkoşerên zimanê kurdî li Amedê di konferansekê de hatin ba hev û ji bo parastina kurdî ev daxwaz pêşkêşî raya giştî kirin:

1- Divê kurd di hemû têkiliyên xwe de kurdî bi kar bînin.
2- Divê zimanzanên kurd li ser zimanê kurdî xebatên zanistî bikin.
3- Divê kurd ji bo parastin û pêşvebirina kurdî ji zanist û teknolojiyê sûdê wergirin.
4- Divê hemû malbatên kurd zarokên xwe hînî kurdî bikin.
5- Divê kurd têkoşînê ji bo mafê perwerdehiya bi kurdî bidin.

Divêtî

Divê	ez bixebitim.
	tu bixebitî.
	ew bixebite.
	em bixebitin.
	hûn bixebitin.

Ji bo ku tu bi ser bikevî, divê tu pir bixebitî.

Mînak

Zozan dixwaze kurdiya xwe bi pêş bixe, divê çi bike?

1- Divê li stranên kurdî guhdariyê bike.
2- Divê rojname û kovarên bi kurdî bixwîne.
3- Divê li televizyonên bi kurdî temaşe bike.
4- Divê bi kurdan re bi kurdî bipeyive.
5- Divê peyvên nû li lênûskê binivîse û ji ber bike.

Nivîs

Pirsa li jêr li gorî xwe bibersivînin.

Ji bo parastina xwezayê divê mirovahî çi bike?

1- _____
2- _____
3- _____
4- _____
5- _____

Ji xwendekarên Zanîngeha Dîcleyê kampanyaya kurdî

Hin xwendekarên Zanîngeha Dîcleyê dikin hin çalakiyan ji bo parastina ziman li dar bixin. Niha berdevkê Tevgera Xwendekaran Delîl Botan li ba min e. Em dikin pê re hevpeyvînekê pêk bînin.

Li gorî agahiyan, hûn dikin ji bo zimanê kurdî hinek çalakiyan li dar bixin, hûn dikarin qala armanca van çalakiyan bikin?

Zimanê me roj bi roj asîmîle dibe. Bi taybetî ciwanên kurd ji çand û zimanê xwe dûr dikevin. Em dixwazin li hemberî vê rewşê helwesta xwe nîşan bidin. Bi vê armancê em dikin îro dest bi kampanyayekê bikin.

Di nav kampanyayê de kîjan çalakî hene?

Em dikin niha meşeke mezin li dar bixin. Em dikin niha li ber deriyê Peymangeha Hiqûqê bicivin û heta ber deriyê Zanîngehê bimeşin.

Wekî din hûn ê çi çalakiyan li dar bixin?

Gelek çalakiyên me yên wekî panel, gotûbêj, helbestanxwendin hene. Ev çalakiyên me dê hefteyekê bidomin, em ê bi konsereke mezin dawiyê li kampanyaya xwe bînin. Lê dê têkoşîna me ya ji bo parastina zimanê kurdî bidome.

Ji bo van agahiyên we gelekî spas.

Spasxweş.

Dema bê ya nêzîk

Cînavk	Lêkera alîkar	Lêker
Ez	dikim	biçim.
Tu	dikî	biçî.
Ew	dike	biçe.
Em	dikin	biçin.
Hûn	dikin	biçin.
Ew	dikin	biçin.

Mînak

1- Xwendekar dikin hin çalakiyan ji bo kurdî li dar bixin.
2- Em dikin bi meşekê dest bi çalakiyan bikin.
3- Ez dikim bêm û te bibînim.
4- Tu dikî bi ku de biçî?
5- Ez dikim pirtûkeke helbestan bikirim.

3- Cihên vala bi lêkera raweyî “kirin”ê dagirin.

1- Hogir _____ li otobûsê siwar bibe.
2- Hin hevalên min _____ bên serdana me.
3- Ez û birayê xwe _____ li balafirê siwar bibin.
4- Tu û Zozan _____ kê bibînin?
5- Ez _____ helbestekê binivîsim.

Dîko û pîra cadûkar

Esma Sürücü

Hebû tunebû, pîreke cadûkar û dîkekî wê hebû. Rojekê pîrê dema mala xwe dimalaşt seriyek çortan li erdê dît, danî ser kulekê. Dîko çû nikul li seriyê çortanî da. Gava pîrê ev yek bihîst çû, şûnikek li qorika Dîko da. Dîko jî nikul li çavê pîrê da. Pîra cadûkar Dîko qewirand. Dîko ji tirsa canê xwe baz da derve. Çû çû, rastî kerekê hat. Kerê bang kir, got:
- Dîko tu dikî herî ku derê?
Dîko got:
"Ez dikim herim çol û çolistan,
Ez dikim herim ber û beristan,
payîz çû ma zivistan,
Ez dikim rakim leşkerekî giran,
bînim ser pîra du diran,
ku qorika min şikand
ji bo seriyekî çortan!
Kerê got: "Ez jî bi te re werim?"
Dîko got: "Baş e, were!" Dîk û ker bi rê ketin, çûn çûn rastî marekî hatin.
Marî bang kir, got: "Dîko! Hûn dikin herin ku?!"
Dîko got: "Em dikin herin çol û çolistan, berî û beristan (…)"
Marî got: "Ez jî bi we re werim?"
Dîko got: "Baş e, were!" Dîk, ker û mar bi rê ketin, çûn çûn rastî dûpişkê hatin.
Dûpişkê bang kir, got: "Dîko, hûn dikin biçin ku derê?"
Dîko got: "Em dikin biçin çol û çolistan, berî û beristan, payîz çû ma zivistan (…)"
Dûpişkê got: "Ez jî dixwazim bi we re werim."
Dîko got: "Baş e, were!" Dîk, ker, mar û dûpişk bi rê ketin, çûn çûn rastî bangeranî hatin.
Bangeranî bang kir, got: "Dîko, hûn dikin herin ku?"
Dîko got: "Em dikin herin çol û çolistan, berî û beristan, payîz çû ma zivistan (…)"
Bangeranî got: "Ez jî bi we re werim?"
Dîko got: "Bila be, were!" Dîk, ker, mar, dûpişk û bangeran gihîştin hev, gotin de îcar em herin ser pîra dudiran. Çûn çûn ber deriyê pîrê. Bû êvar tarî ket erdê.
Bangeranî got: "Ez dikim herim ser xênî."
Marî got: "Ez dikim xwe di hundir de veşêrim."
Dûpişkê got: "Ez dikim herim xwe di nav refikê de bitelînim."
Ker çû li ber deriyê derve xwe veşart.
Pîr hat malê, hundir tarî bû. Ji bo ku çirayê vêxe, destê xwe avêt refikê, dûpişkê bi pêçîka pîrê veda. Pêçîka pîrê jan da. Nezanî çi pê hat, bi tirs destê xwe avêt stûnê, marî bi destê wê veda. Pîrê bi jana dest û tirsa dilê xwe baz da derve. Dema ku hat ber deriyê derve, kerê zîtikek li pîrê da. Pîra cadûkar pengizî derve ber dîwêr. Bangeran ji banî de xwe bera ser laşê pîrê da. Pîrê nema zanî ku çi bike, hema dawa xwe xist devê xwe û di wê tariyê de berê xwe da çolê û baz da. Çû û çû û nema vegeriya. Mala pîrê ji Dîko re ma.

4- Hevokên li jêr li gorî rêza bûyeran rêz bikin.

___ Mal ji dîko re ma.
___ Pîrê şûnik li qorika dîko da.
___ Pîra cadûkar hate malê.
___ Marek jî bû hevalê wan
___ Dûpişkek kete nav koma wan.
___ Bangeranek tevî wan bû.
___ Dîko rastî kerekê hat.
___ Dîko û hevalên wî li malê xwe veşartin.
__1__ Dîko nikul li çortanê da.
___ Pîra cadûkar ji malê reviya.
___ Pîrê dîko qewirand.

Peyvsazî

peyv	paşgir	peyva pêkhatî
çol	-istan	çolistan
gul		gulistan
kurd		Kurdistan
dar		daristan
şar		şaristan
gor		goristan
morî		morîstan

Cînavkên berbihevîn: hev (û du) / êk (û du)

1- Em xwişk û birayên hev in.
2- Wan li hev û du daye.
3- Ew ji êk û du hez dikin.
4- Me li nava çavên hev nihêrî.
5- Kes li rewşa hev napirse.

Cînavkên lihevxistî (II)

Daçek	Cînavkên berbihevîn	Cînavka lihevxistî
bi	hev / êk	pev / pêk
di		tev / têk
ji		jev / jêk
li		lev / lêk

Mînak

1- Ev avahî jev (ji hev) ketiye.
2- Ew pir jev (ji hev) hez dikin.
3- Min ew lev (li hev) bada û danî ser sarincê.
4- Ew tu caran jêk (ji êk) cuda nabin.
5- Ew di dawiyê de lêk (li êk) hatin.

Ji cînavkên lihevxistî hin lêkerên biwêjî jî pêk tên.

Mînak

pevçûn (şerkirin), **pevketin (leckirin)**, pevxistin (montekirin), **pevgirtin (devjenî)**, pêkhatin (çêbûn), **pêkanîn (çêkirin)**, têkçûn (biserneketin), **têkbirin (bibinxistin, zora ... birin),** lêkdan (lihevxistin), **lêkhatin (lihevkirin)**….

A- Xebata li ser peyvan

1-Cihên vala bi van peyvan dagirin.

mîhrîcan	dirûşm	gotûbêj	pêşwazî	hevsengî	cemser
nirx	merc	zanist	hişmendî		

1- Şaredariya Bajarê Mezin a Amedê her sal _____ Çand û Hunerê li dar dixe.
2- Germbûna gerdûnî _____ ekolojîk xera dike.
3- Qeşaya li ser _____ hêdî hêdî dihele.
4- Zanyar bi riya _____ û teknolojiyê ji bo arîşeyan li çareseriyan digerin.
5- Îsal li ser pirçandiyê gelek _____ pêk hatin.
6- Dayika min mêvanên xwe li ber dêrî _____ dike.
7- Me îsal Roja Zimanê Dayikê bi _____ "Zimanê me rûmeta me ye!" pîroz kir.
8- _____ parastina hawîrdorê di nava civakê de belav dibe.
9- Bi qeyrana aborî ya cîhanê re _____ jiyanê dijwartir dibin.
10- Divê em hinek _____ sereke yên civakê biparêzin.

2- Cihên vala bi lêkerên li jêr dagirin.

pev çûn	pev xistin	pêk hatin	têk çûn	têk birin	lêk dan	lêk hatin

1- Gundiyan li ser kêşeya zeviyan li hev nekir û _____.
2- Xebata me ji gelek beşan _____.
3- Di şerê cîhanê yê yekemîn de Osmanî _____.
4- Di pêşbaziya bazdanê de min hemû hevrikên xwe _____.
5- Ew piştî gotûbêjên dûvedirêj _____.
6- Wî pir bi hostetî parçeyên makîneyê _____.
7- Di xwepêşandanê de xwendekar û polîsan _____.

B- Xwendin

Konferansa Kurd dê sibê li PE'yê dest pê bike.

Konferansa Kurd a Navneteweyî ya 5'emîn dê sibe li Parlamentoya Ewropayê dest pê bike. Amadekarên Konferansê dê îsal konferansa xwe ji bo bîranîna Harold Pinter li dar bixin. Di konferansê de dê beşdar gelek mijarên têkildarî pirsgirêka kurd nîqaş bikin.

Konferansa îsal dê di 28-29'ê rêbendanê de li Parlamentoya Ewropayê pêk were. Kesên mîna Noam Chomsky û Yaşar Kemal dê pêşengiya vê konferansê bikin.

Di konferansê de beşdar dê pêşketinên li Tirkiyeyê yên 5 salên dawîn gotûbêj bikin. Kesên mîna Leyla Zana, Bîanca Jagger jî dê di konferansê de bipeyivin.

1- Pirsên li jêr li gorî nivîsê bibersivînin.

1- Dê konferans li ku derê û kengî pêk were?

_____

2- Konferansa îsal dê ji bo bîranîna kê li dar bikeve?

_____

3- Beşdar dê di konferansê de kîjan mijaran nîqaş bikin?

_____

4- Îsal dê konferans bi pêşengiya kê pêk were?

_____

2- Lêkerên di nava kevanekê de li gorî dema bê bikişînin.

Ji bo ku pêşeroj xweş û geş bibe

Dîroka sibe, em ê îro _____ (nivîsandin). Xewnên dilgeşiyê jî, yên dilêşiyê jî em ê îro _____ (dîtin). Ji ber ku pêşeroj di îro de veşartî ye. Bila her kes bizane ku em ê tarîtî û ronahiya rojên bê, di van rojên îroyîn de diyar_____ (kirin).

Duh, îro û sibe bi hev ve girêdayî ne. Hêvîdar im ku sibe dê ji îro çêtir _____ (bûn). Zarokên siberojê dê ji zarokên îro rûgeştir _____ (bûn) Dê pêşeroj ji mirovahiyê re jiyaneke xweş _____ (anîn). Em nebînin jî, dê zarokên me _____ (dîtin).

C- Bikaranîna Zimên

1- Lêkerên di nava kevanekê de li gorî forma rast bikişînin.

1- Dibe ku ez sibe _____ (ne/hatin) dibistanê.
2- Berî ku mêvan werin divê em xwarinê amade _____ (kirin).
3- Piştî ku hûn gihîştin malê, agahiyê _____ (dan) me.
4- Dibe ku îşev em _____ (çûn) şanoyê.
5- Berî ku zivistan were, divê ez hinek êzingan _____ (kirîn).
6- Piştî ku tu ji malê _____ (derketin), birayê min hat.
7- Berî ku civîn dest pê bike, em rojevê _____ (nivîsandin).
8- Dibe ku îşev ez dereng _____ (hatin) malê.

2- Her du hêmanên hevokan bigihînin hev.

1- Dema ez rabûm min dît ku
2- Diya min xwest ku
3- Min bihîst ku
4- Ez hêvî dikim ku
5- Wisa xuya dike ku

a- ez zû vegerim malê.
b- pirtûka bi navê Hînker derketiye.
c- tu bi ser bikevî.
d- di pêşerojê de dê pirsgirêk zêde bibin.
e- baran dibare.

1	2	3	4	5
e				

3- Hevokên li jêr temam bikin.

1- Heke tu lez nekî _____
2- Heke şer neqede_____
3- Ku ew beşdarî xebatê bibe _____
4- Ku ez karekî nebînim _____
5- Heke ez biçim Amedê _____
6- Heke tu dixwazî bi ser bikevî divê tu _____
7- Heke tu dixwazî çîrokên baş binivîsî divê tu _____
8- Heke ew dixwaze hînî îngilizî bibe divê ew_____
9- Heke em dixwazin xwezayê biparêzin divê em _____
10- Ku hûn dixwazin li konserê temaşe bikin divê hûn _____

4- Li gorî wêneyên li jêr bi dema bê ya nêzîk hevokan çêkin.



Minak: *Ew dike bikeve.*

1- Ew _____



2- Ew _____

3 - Ew _____

4- Baran _____



5- Ew _____

A- Rojên Taybet

1- Pirsên li jêr bibersivînin.

1- *Hûn sersalê çawa pîroz dikin?*
2- *Di nav kurdan de sersal çawa tê pîrozkirin.*

Pîrozbahiya sersalê

Sersal roja yekê rêbendanê ye. Di êvara 31'ê berfanbarê de sersal tê pîrozkirin. Hetanî derengiya şevê şahiya sersalê tê lidarxistin. Li seranserî cîhanê şahiya sersalê bi şahî û pîrozbahiyan derbas dibe. Hemû derd û kul tên jibîrkirin. Di sersalê de bi piranî goştê elokan tê xwarin. Her wiha dara çamê sembola sersalê ye.
Heval, nas û xizm ji hev re pîroznameyan dişînin. Xelata sersalê kevneşopiyeke pir girîng e. Peyamên pîrozbahiyê bi riya telefon, tîşkename û kartan tên şandin.
Gelê kurd jî sersalê li gorî kevneşopiyên xwe pîroz dike. Şeva sersalê zarok digihêjin hev. Yekî dikin bûk û yekî jî dikin zava. Wan dixemilînin û mal bi mal digerin, li deriyan dixin û dibêjin:

Serê salê binê salê
Tişkî têxin tûrê kalê
Xwedê zarokekê bide kevaniya malê

Xwediyê malê jî dibêje: "Hinekî ji me re bireqisin." Bûk û zava direqisin. Zarok ji wan re li çepikan dixin. Piştre xwediyê malê tiştekî dide wan. Wisa yek bi yek li malan tevan digerin. Dawiyê tiştên ku didin hev li hev parve dikin û belav dibin.

2- Pirsên li jêr bibersivînin.

1- Sersal kengî tê pîrozkirin?

_____

2- Di sersalê de bi piranî goştê çi tê xwarin?

_____

3- Sersal di nav kurdan de çawa tê pîrozkirin?

_____

Avaniya tebatî (dema niha)

Bireser	Lêkera alîkar		Lêkera bingehîn
	Erênî	Neyînî	
Kinc	tê/tên	nayê/nayên	dirûtin.
Xanî			avakirin.
Sêv			xwarin.
Kon			vegirtin.
Mêvan			pêşwazîkirin.

Têbinî
Di kurmancî de bi tenê lêkerên gerguhêz dikevin forma avaniya tebatî, ji ber ku di lêkerên negerguhêz de bireser nîn e, nakevin forma avaniya tebatî.

Mînak

1- Di êvara 31'ê berfanbarê de sersal tê pîrozkirin.
2- Hetanî derengiya şevê şahiya sersalê tê lidarxistin.
3- Di sersalê de hemû derd û kul tên jibîrkirin.
4- Di nav kurdan de sersal bi awayekî cuda tê pîrozkirin.
5- Peyamên pîrozbahiyê bi riya telefon, tîşkename û kartan tên şandin.

Amadekariyên cejnê

Sibe cejn e, îro li malê kar pir e. Em malê dimalin, kincan dişon, derdorê paqij dikin. Xwarinên taybet amade dikin. Ji bo cejnê em kiloran dipêjin. Hin ji me diçin sûkê, pêdiviyên malê dikirin.

3- Hevokên li jor bikin forma tebatî.

_____

_____

_____

_____

_____

Heştê Adarê

Îsal li seranserî cîhanê Roja Jinên Kedkar ên Cîhanê bi çalakiyên cur bi cur hate pîrozkirin. Di çalakiyan de jiyaneke azad û wekhev hate xwestin. Îsal jî wek her salê jinên kurd ji bo azadiya xwe daketin qadan. Qadên çalakiyan bi cil û bergên rengîn ên gelêrî hatin xemilandin.

8'ê Adarê Roja Jinên Kedkar ên Cîhanê ye. Dîroka vê rojê digihêje salên 1800'î. Di wan salan de li bajarê New Yorkê jin di kargehên tekstîlê de di bin mercên xirab de dihatin xebitandin. Jinên karker ji bo mercên baş û destheqê zêde têdikoşiyan. Ji bo van daxwazên xwe di sala 1857'an de jinan dest bi grevê kir. Di navbera polîs û jinan de pevçûn qewimîn. Di encamê de gelek jin hatin kuştin.

Di sala 1906'an de jinên kedkar ên Kargeha Manhatinê dest bi grevê kir. Lê bi qasî 20 hezar karker hatin girtin û bi qasî du mehan di girtîgehê de man. Dîsa jî grevê dom kir. Di encamê de jinan mafên xwe bi dest xistin. Lê hin jin ji kar hatin avêtin. Di 8'ê adara 1908'an de kargeha tekstîlê ji hêla van karkeran ve hate dagirkirin. Di vê demê de agir bi kargehê ket û 129 jinan jiyana xwe ji dest da.

Bi pêşniyara Clara Zetkîn ji hêla Enternasyonala Duyemîn ve roja 8'ê adarê wekî "Roja Têkoşîn û Hevgirtina Jinan a Navneteweyî" hat pejirandin. Bi pêşketina têkoşîna jinan re Neteweyên Yekbûyî di sala 1975'an de 8'ê adarê wekî " Roja Jinan a Cîhanê" destnîşan kir.

4- Peyvên li jêr bigihînin wateya wan.

1- encam	**a.** mucadele
2- kargeh	**b.** destmiz
3- karker	**c.** hepisxane
4- destheq	**d.** akam, netîce
5- girtîgeh	**e.** xebatkar
6- pejirandin	**f.** cihê kar
7- têkoşîn	**g.** qebûlkirin

1	2	3	4	5	6	7
d						

5- Ji hevokên jêrîn ji bo yên rast stûna (r) ji bo yên çewt stûna (ç) xêz bikin.

	Hevok	r	ç
1	8'ê Adarê Roja Jinên Kedkar ên Cîhanê ye.	✓	
2	Jinên karker di salên 1800'î de di mercên baş de dihatin xebitandin.		
3	Li New Yorkê jin di kargehên çekan de dixebitîn.		
4	Jinên karker ji bo ku destheqê wan bê zedekirin têdikoşiyan.		
5	Ji bo daxwazên wan bên pejirandin di sala 1857'an de ketin grevê.		
6	Di şerê navbera polîs û jinan de jin bi ser ketin.		
7	Di sala 1906'an de jinên kedkar ên Kargeha Manhatinê ketin grevê.		
8	Rê li ber greva jinan a di kargeha Manhatinê hate girtin.		
9	Jinan di 8'ê Adara 1908'an de kargeha tekstîlê dagir kirin.		
10	Di encama şewatê de 100 jin mirin.		

Avaniya tebatî (Demên borî)

Bireser	Lêkera alîkar		Lêkera bingehîn
	Erênî	Neyînî	
Rojname	hat / hatin hatiye / hatine dihat / dihatin	nehat / nehatin nehatiye / nehatine nedihat / nedihatin	belavkirin.
Mêvan			pêşwazîkirin.
Kulîlk			çandin.
Name			şandin.
Pirtûk			xwendin.

Mînak

1- Roja Jinên Kedkar ên Cîhanê bi çalakiyên cur bi cur hat pîrozkirin.
2- Qadên çalakiyan bi cil û bergên rengîn hatine xemilandin.
3- Di kargehên tekstîlê de jin di bin mercên xirab de dihatin xebitandin.
4- Di encama pevçûnê de gelek jin hatin kuştin.
5- Kargeh ji hêla karkeran ve hatiye dagirkirin.

6- Hevokên lebatî bixin forma tebatî.

Mînak: *Polîsan deh xwendekar girtin.*
Deh xwendekar hatin girtin.

1- Gundiyan dibistaneke nû ava kiriye.

_____

2- Kurdan di sala 1898'an de Rojnameya Kurdistanê derxist.

_____

3- Zarokan li kolanan destmal difirotin.

_____

4- Bavê min îşev firaq neşûştine.

_____

5- Me civîna komeleyê taloq kir.

_____

6- We çima ev name neşandin?

_____

B- Cejn

1- Li ser pirsa li jêr bipeyivin.

We di dema zaroktiya xwe de cejn çawa pîroz dikirin?

Cejnên zaroktiya me

Di dema zaroktiya me de cejn pir xweş bûn. Berî cejnê bi çend rojan amadekarî dihatin kirin. Dê û bavê me ji me re kinc û pêlavên xweşik dikirîn. Ji êvarê heta serê sibê ji kêfan xewa me nedihat. Me kinc û pêlavên nûkirî datanîn ber serê xwe. Berî cejnê bi çend rojan paqijiyê dest pê dikir. Cîrax dihatin şûştin, derdor dihat malaştin û paqijkirin. Cîraxên şûştî dihatin raxistin.

Ji bo pêdiviyên malê dê û bavê me diçûn sûkê û gelek tişt dikirîn.
Êvara cejnê heta derengiya şevê xwarin, şîranî û kilorên cejnê dihatin çêkirin. Roja cejnê em serê sibê zû hişyar dibûn, me kincên xwe yên nû li xwe dikirin. Me cejna hev pîroz dikir. Mezinan diyarî didan me. Me bi hev re taştê dixwar. Me di taştê de penêrê helandî, hêkên kelandî, hingivê Şemzînanê, zeytûnên kutandî dixwarin.
Em zarok derdiketin derve, me hevalên xwe didîtin, em bi hev re mal bi mal digeriyan û me cejna cîranan pîroz dikir. Wan jî diyarî didan me. Em nîvrokî dihatin malê, me firavîna xwe li malê dixwar. Di firavînê de pirî caran goştê biraştî, tirşik û savar hebûn. Pirî caran ap û metên min, xal û xaltîkên min jî bi me re firavîn dixwar. Piştî firavînê mêvan dihatin, me şîranî pêşkêşî wan dikir. Jinan bi cil û bergên neqişandî, bi çavên kilkirî bal dikişand. Keçên ciwan çilkeziyên xwe yên hûnandî bera ser cil û bergên rengîn didan.
Di rojên cejnê de kesên ji hev xeyîdî li hev dihatin. Kesên ji bîr û baweriyên cuda jî diçûn serdana hev û wan cejna hev pîroz dikir. Rojên cejnê bi şahî û dilgeşî derbas dibûn. Me zarokan nedixwest rojên cejnê biqedin.

Raweya çêbiwar

Lêker	Rayeka dema borî	Qertaf	Raweya çêbiwar
biraştin	biraşt	-î	biraştî
veşartin	veşart		veşartî
girtin	girt		girtî
parastin	parast		parastî
vekirin	vekir		vekirî
sorkirin	sor kir		sorkirî

Mînak

1- Min deriyê quflekirî vekir.
2- Dayik li xizmên xwe yên windakirî digerin.
3- Girtî azadiya xwe dixwazin.
4- Mehîr ji danê kutayî çêdibe.
5- Kulîlkên vebûyî derdorê dixemilînin.

2- Di nivîsa li jor de binê peyvên di forma raweya çêbiwar de xêz bikin.

Nivîs

Bi nivîsekê qala rojeke xwe ya cejnê bikin.

NEWROZ

Cejna Newrozê nêzîk dibe. Her sal li Amedê Cejna Newrozê bi coşeke mezin tê pîrozkirin. Îsal jî amadekariyên pîrozbahiyê didomin. Der barê amadekariyan de me ji komîteya amadekar hinek agahî wergirtin.

Îsal dê Cejna Newrozê li ku derê bê pîrozkirin?

Îsal jî wekî par cejn dê li Parka Newrozê bê pîrozkirin. Ji ber ku par jî pîrozbahî li wir hate kirin, gelê me wê derê nas dike. Her wiha bine-saziya qadê jî ji bo pîrozbahiyê guncan e.

Îsal dê kîjan hunermend beşdarî pîrozbahiyê bibin?

Li gorî bernameya me dê gelek hunermendên navdar bêne vexwendin, em hêvî dikin ku gelek ji wan beşdar bibin. Bo nimûne dê hunermendê navdar Nîzametîn Arîç were vexwendin, em dixwazin wî di Newroza îsal de bibînin.

Wekî din çi amadehî hene?

Em dixwazin gelê me cejna xwe bi dilşadî pîroz bike. Ji bo vê yekê dê amadehiyeke baş bê kirin. Ji bo ku gelê me li qadê bi tu pirsgirêkan re rû bi rû nemîne, dê hin tedbîr werin girtin. Li aliyê din jî ji bo beşdariyeke xurt dê bi sed-hezaran belavok bên belavkirin, dê li gelek cihan jî afîş û pankart bên daliqandin.

3- Cihên vala li gorî nivîsa li jor dagirin.

1- Îsal dê Newroz li _____ bê pîrozkirin.

2- Dê hunermendê navdar _____ bê vexwendin.

3- Dê bi hezaran _____ bên belavkirin.

4- Li gelek cihan dê _____ bên daliqandin.

Avaniya tebatî (Dema bê)

Bireser	Daçeka dema bê	Lêkera alîkar Erênî	Lêkera alîkar Neyînî	Lêkera bingehîn
Kovar	dê	bê / bên (were / werin)	neyê / neyên	çapkirin.
Mêvan				vexwendin.
Kulîlk				çinîn.
Name				nivîsîn.
Xelat				dan.

4- Hevokên nivîsê bixin forma avaniya tebatî.



Em ê di 18'ê avrêlê de salvegera Enstîtuya Kurdî pîroz bikin. Bi vê mebestê em ê şahiyê li dar bixin. Berî şahiyê em ê bi hunermendan re hevdîtinan bikin. Em ê bernameyeke xweş amade bikin. Em ê cihekî bigirin. Ji bo vexwendina mêvanan em ê vexwendnameyan belav bikin. Em ê di şahiyê de Xelata Ziman a Feqî Huseyn Sagniç jî bidin. Em ê dîmengirekê bikirin û bernameyê bikişînin.

Di 18'ê avrêlê de dê salvegera Enstîtuya Kurdî bê pîrozkirin _____

_____

_____

_____

_____

_____

_____

_____

_____

_____

_____

_____

Cejna Çarşema Sor

Cejna Sersalê ya ku di nav kurdên êzidî de wek cejneke olî tê pîrozkirin, bi navên mîna “Cejna Tawisî Melek”, “Çarşema Sor” jî tê binavkirin. Yekemîn çarşema avrêla ku wekî sersal jî tê pejirandin, cejna kurdên êzidî ya herî mezin e. Li gorî baweriya kurdên êzidî Tawisî Melek ê ku serekê heft melekan e, di vê rojê de tê xwarê û dergehê xêrê vedike.

Rojek berî cejnê hêkên ku hatine kelandin bi rengên cur bi cur tên rengandin. Deriyên malan bi qaçilên hêkên rengîn û axê tên xemilandin. Di cejnê de mirov bi hêkan dilîzin. Di vê lîstikê de du kes serê hêkan li hev dixin, kesê ku hêka wî bişikê ji lîstikê derdikeve .

Roja cejnê cotkar diçin ser zeviyan û hêkên şikandî li nav zeviyê belav dikin. Bi vê yekê cotkar bawer dikin ku dê xêr û bêr bikeve nav çandiniya wan. Hemû gundî diçine ber zîyareta gund û piştre jî li malên cîranan digerin, cejna sersalê pîroz dikin. Kevaniyên malan hêk û mast li malên din belav dikin.

5- Pirsên li jêr bibersivînin.

1- Kurdên êzidî sersalê kengî pîroz dikin?

_____

2- Kurdên êzidî çi navî li sersalê dikin?

_____

3- Roja berî cejnê çi amadekarî tên kirin?

_____

4- Roja cejnê cotkar çima hêkên şikandî li nav zeviyan belav dikin?

_____

5- Kevaniyên malan di cejnê de çi belav dikin?

_____

6- Di nivîsa “Cejna Çarşema Sor” de binê hevokên bi cînavka girêkî xêz bikin.

Cînavka girêkî “ku”

1- Pirtûka ku te da min winda bû.
2- Taxa ku em çûnê li derveyî bajêr bû.
3- Kulîlkên ku te anîn hê jî zindî ne.
4- Nameya ku min ji hevala xwe re şand, li min vegeriya.
5- Fîlmê Behman Qubadî yê ku li ser sînor hatiye kişandin, serkeftî ye.
6- Gelek mirovên navdar beşdarî civîna ku me duh li dar xist, bûn.
7- Min hevala ku tu pê re diaxivî, nas nekir.

7- Hevokên li jêr bi cînavka girêkî bi hev ve girê bidin.

Mînak:

Min duh pirtûkek kirî. Ew pirtûk pir balkêş bû.
Pirtûka ku min duh kirî, pir balkêş bû.

1- Hêlînê diyariyek da min. Ew diyarî pir giranbiha bû.

_____

2- Me duh hevalek dît. Wî hevalî li te pirsî.

_____

3- Te wêneyek xêz kiriye. Kêfa min pir jê re hat.

_____

4- Te qala pirtûkekê dikir. Min ew pirtûk xwend.

_____

5- Mamosteyek dersa kurdî dide. Ew hevala min e.

_____

A-Xebata li ser peyvan

1- Xaçepirs



Çeperast:

1- Fealiyet, kar û xebat / amûreke muzîkê
2- Pozîtîf / Rêxistina Rizgariya Îrlandayê
3- Cemidî, dijwateya germê
4- Cînavka şanîdanê ya tewandî
5- Mucadele
6- Cînavka kesa/ê yekem, koma xwerû / Pêşgireke lêkersaz / roja em tê de, ev roj
7- Pêşgira neyîniyê ya dema niha / Şitil
8- Rojeke hefteyê / qeymax / Serbest, ne bindest
9- Avdar, bi av / Dîn û ayîn

Serejêr:

1- Robar / Amûra ku pê rîs dikin ta
2- Paşgirek: guh…., kom…./ Ne dûr / Bersiva neyînî
3- Parçeyekî laş, mirov pê dipeyive / Gihanekek
4- Qertafa tewangê ya pirjimariyê / Rengek / Têhnî
5- Tûrik / Tiyatro
6- Cihê avdar
7- Kesên ji Îranê / Beyreq
8- Zik / Sir, tiştê veşarî
9- Paşgireke ku xwedîtiyê nîşan dide; ser…., mal…., zor…../ Navekî kurdî

2- Cihên vala bi peyvên li jêr dagirin.

pîrozbahî **kevneşopî** kedkar **wekhevî** pêdivî **diyarî** binesazî **belavok** vexwendname **cîrax**

1- Ji bo _____ Newrozê gelek amadekarî têne kirin.
2- Yek Gulan wekî cejna _____ tê pîrozkirin.
3- Karker ji bo azadî û _____ têdikoşin.
4- Me ji bo pîrozbahiya cejnê _____ amade kirin.
5- Berî cejnê bavê min ji bo _____ malê çû bajêr.
6- Şaredarî ji bo têkûzkirina _____ bajêr baş xebitî.
7- Di sersalê de min ji hevala xwe re _____ kirî.
8- Li qada Cejna Newrozê ji bo aştiyê _____ hatin belavkirin.
9- Di cejnan de çêkirina kiloran _____ e.
10- Me di cejnan de _____ li malê hemû dişûştin.

B- Xwendin û bikaranîna zimên

1- Paragrafan li gorî qewimîna bûyeran rêz bikin.

___

Li ser van gotinan Dehaq ferman da ku her roj mêjiyên du ciwanan bînin û di birînên wî bidin. Bi vî awayî, rojê bi mêjiyên du ciwanan kulên ser milên Dehaq dihatin dermankirin. Lê ji berdestiyên Dehaq yek mirovekî dilovan bû. Lewre yek ji wan ciwanan şerjê nedikir, li şûnê berxek şerjê dikir û mêjiyê wê tevî yê ciwanê şerjêkirî dikir. Ciwanên ku rizgar dikirin dişandin çiyayan. Wan jî xwe di şikeftan de vedişart. Her ku diçû çiya bi mirovên reviyayî tijî dibûn.

___

Kawa bi destê lawê xwe girt û hilkişiya ser banê qesrê û agirekî gur li wir dada. Dema heval û hogirên Kawa çav li êgir ketin, wan jî êrîş anîn ser qesrê, leşker û hevalbendên Dehaq têk birin. Li her derê agir hate dadan û şahî hatin lidarxistin. Ew roj, roja 21'ê adarê bû. Ew roj wekî newroz ango roja nû hate binavkirin. Ji wê rojê û bi vir de her sal roja 21'ê Adarê wekî Cejna Newrozê tê pîrozkirin.

___

Kawa, geranê xwe kir destê xwe, lawê xwe girt û berê xwe da qesrê û rasterast berê xwe da şahnişîna ku textê Dehaq lê bû.

Kawa bi çengê lawê xwe girt û bir li ber piyên wî dirêj kir, geranê xwe bilind kir. Lê li şûna ku li serê lawê xwe bide, bi hemû hêz û hêla xwe daweşand serê Dehaq. Taca serê wî gindirî.

___

Kawa hesinkarek bû. Deh zarokên wî hebûn, neh kurên wî ji bo Dehaq hatibû kuştin. Zilamên Dehaq doza kurê dehemîn dikir, êdî kêr gihabû hestî. Kawa ji ber tirsa qurbankirina zarokê xwe yê dawî plana kuştina Dehaq kir.

___

Kawa, ji bo heval û hogirên xwe çek çêkirin û bi dizî li wan belav kirin. Ji xwe re geranekî ku mirov pê hesin dikute, çêkir. Gava leşkerên Dehaq hatin ku lawê Kawa yê dawî jî bibin, Kawa ji leşkeran re got:

– Hûn herin, ez ê niha, bi destê lawê xwe bigirim û bînim. Ez dixwazim ji bo saxiya şahê xwe lawê xwe bi destê xwe bikim qurban.

___ *1*

Di demeke kevn de, li Rojhilata Navîn şahek hebû, navê wî Dehaq bû. Dehaq, şahekî pir zalim bû. Şevekê, Dehaq xewneke xirab dît. Nîvê şevê, ji ber êşeke dijwar ji xewê hişyar bû. Li ser gurmilkên wî birînek hebû. Gazî zana û bijîşkên li qesrê kir û ji wan dermanek xwest.

Lê hekîm tev matmayî bûn. Ji ber ku wan cara yekem kuleke wisa didît. Hekîmekî ji wan got:

– Heta niha birîneke wiha ne hatiye dîtin û ne jî hatiye bihîstin. Lê bawer dikim ku mêjiyê teze dê bibe dermanê van birînan.

2- Pirsên li jêr li gorî nivîsa li jor bibersivînin.

1- Dehaq şahekî çawa bû?

_____

2- Çima şevekê ji xewê hişyar bû?

_____

3- Hekîm wekî derman çi pêşniyar kir?

_____

4- Dehaq çawa dihat dermankirin?

_____

5- Ciwanên ku dihatin berdan xwe li ku derê vedişart?

_____

6- Kawa çima heval û hogirên xwe berhev kirin?

_____

7- Piştî ku Kawa Dehaq kuşt, çawa hevalên xwe agahdar kirin?

_____

8- Piştî ku heval û hogirên Kawa agir dît, wan çi kir?

_____

9- Roja rizgariya ji zilma Dehaq çawa hate binavkirin?

_____

Roja Aştiyê ya Cîhanê

Li çar aliyên cîhanê mirov 1'ê Rezberê wekî Roja Aştiyê ya Cihanê pîroz dikin. Di 1'ê rezbera sala 1939'an de Artêşa Nazî ya Almanyayê Polonya dagir kir. Bi vê dagirkirinê Şerê Cîhanê yê Duyemîn dest pê kir. Di vî şerî de zêdetirî 50 milyon mirovî hev û du kuştin. Piştî şeş salan di roja 1'ê rezbera sala 1945'an de aliyên şer peymana aştiyê mor kir.

Piştî şer, Konseya Ewlekariyê ya Neteweyên Yekbûyî ji bo aştiyeke gerdûnî û mayînde 1'ê Rezberê wekî " Roja Aştiyê ya Cîhanê" îlan kir. Her sal mirov Roja Aştiyê ya Cîhanê bi çalakiyên cur bi cur pîroz dikin.

3- Nivîsa li jor bikin avaniya tebatî.

Li çar aliyên cîhanê 1'ê Rezberê wekî Roja Aştiyê ya Cîhanê tê pîrozkirin.

_____

_____

_____

_____

_____

4- Hevokên li jêr bi cînavka girêkî bi hev ve girê bidin.

Mînak: *Min duh pirtûkek kirî. Ew pirtûk pir balkêş bû.*
Pirtûka ku min duh kirî, pir balkêş bû.

1- Min havînê kulîlkek çand. Ew kulîlk pir xweşik bû.
_____

2- Parêzerek dikeve doza me. Ew pir serkeftî ye.
_____

3- Delîl mijarek pêşkêş kir. Wê mijarê pir bala me kişand.
_____

4- Te qala hevalekê dikir. Min ew heval dît.
_____

5- Zelalê nameyek şandiye. Ew name nayê xwendin.
_____

5- Lêkerên di nava kevanekê de bixin forma çêbiwar.

1- Min kulîlka _____ (çilmisîn) av da.
2- Pêwîstiya me bi mirovên _____ (perwerdekirin) heye.
3- Hevalên _____ (girtin) ji min re nameyek şandiye.
4- Dayika min sêveke _____ (qeşartin) da min.
5- Mirovên _____ (bijartin) çûn xebatê.

A- Hunerên destan

Hunerên destan winda dibin

Çanda Silopiyê ya hunerên destan ku ji hilberînên wekî hefsar, xurcezîn pêk tê, roj bi roj winda dibin. Ev hunerên destan ên Silopiyê bi piranî ji rîs tên çêkirin. Lê ji ber ku êdî nayên çêkirin, roj bi roj winda dibin. Şaredariya Silopiyê ji bo ku ev çand winda nebe, ji gund û malan hunerên destan berhev dike û dê wan tiştan di pêşangehekê de pêşkêş bike.
Di nav gel de jî hin kes ji bo parastina van destkariyan têdikoşin. Xezal Koyuncu yek ji van kesan e. Ew, tej, xurcezîn, hefsar û mehfûrên ji rîs çêdike. Her wiha ew vê hunerê hînî zarokên xwe jî dike. Wê bi van gotinan ji me re qala karê xwe kir:
"Ev destkariyên me, ji mêj ve hene. Diya min ji diya xwe hîn bûye. Ez jî ji wê hîn bûme. Ez dixwazim hînî zarokên xwe jî bikim. Çêkirina van destkariyan ked û hunereke mezin dixwaze.
Ez di serî de hiriyê bi teşiyê ba didim û dikim rîs. Piştre qalikên gûzan di sîtilekê de dikelînim û rîs dikim nav avê. Rîsê xwe ji avê derdixim û li ber tavê radixim. Piştî ku ziwa dikim, xwêya lîmonê, şerbê û boyaxê dixim satilê û rîsê xwe di wê avê de dikelînim. Piştî ku derdixim, rengê xwe digire û ji bo ku ziwa bikim dîsa li ber tavê radixim. Piştî ku rîs rengê xwe digire, ez tevnê li dar dixim û rîs dikim tej, xalîçe, xurçezîn, hefsar û mehfûr."

1- Pirsên li jêr li gorî nivîsê bibersivînin.

1- Li Silopiyê kîjan hunerên destan winda dibin?

_____

2- Ew huner ji çi têne çêkirin?

_____

3- Şaredarî çima wan hunerên destan berhev dike û dê çi bi wan bike?

_____

4- Kî vê hunerê hînî kê dike?

_____

5- Xezal rîs di ava çi de dike dikelîne?

_____

6- Ew çi tevî boyaxê dike?

_____

7- Xezal li ser tevnê rîs dike çi?

_____

2- Peyvên hemwate bigihînin hev.

hefsar	tej	xurcezîn	rîs	tevn	mehfûr	hirî	destkarî	sîtil

Mînak: *Bendê serê hespan:* ***hefsar***

1- Heqîba ku diavêjin ser zînê hespan: _____

2- Merş: _____

3- Tayê ku ji hiriyê tê rîstin: _____

4- Karê destan: _____

5- Xalî: _____

6- Pûrta mihan: _____

7- Mencel: _____

8- Dezgehê raçandina mehfûran: _____

Rengdêrên şanîdanê

	Rengdêrên şanîdanê yên xwerû	navdêr	Yekjimar	Pirjimar
Nêzîk	Ev	gul	bêhn dide.	bêhn didin.
Dûr	Ew			

Mînak:

1- Ev hunerên destan ên Silopiyê herî zêde ji rîs tên çêkirin.
2- Şaredariya Silopiyê ji bo ku ev çand winda nebe, ji malan hunerên destan berhev dike.
3- Ew tejên ku diya min çêkirine hê jî li mala me raxistî ne.
4- Ew pirtûka ku te da min pir xweş bû.

Rengdêrên şanîdanê yên tewandî

	Nêr	Navdêr	Mê	Navdêr	pirjimar	navdêr
Nêzîk	vî	zilamî	vê	dayikê	van	zarokan
Dûr	wî		wê		wan	

Mînak:

1- Şaredarî dê wan tiştan di pêşangehekê de pêşkêş bike.
2- Her wiha ew vê hunerê hînî zarokên xwe jî dike.
3- Çêkirina van destkariyan ked û hunereke mezin dixwaze.
4- Ez rîsê xwe di wê avê de dikelînim.

3- Cihên vala bi rengdêrên şanîdanê dagirin.

1- Ez li _____ qesra mezin hatime dinyayê.
2- Ez bi salan li _____ gundî jiyame.
3- _____ keçikê ji min re nameyek nivîsandiye.
4- Ez li _____ zarokên kuçeyê temaşe dikim.
5- Me gelek caran pezê xwe li _____ zozanan çêrandiye.

Nexşên li ser tejên Culemêrgê

Nexş û çînên li ser tejan nîşana kelepora çandî ne. Li ser tejên Culemêrgê ligel nexşên ajal, kulîlk û daran, hinek remzên razber jî hene. Her remzek nîşaneya tiştekî ye. Bo nimûne dûpişk nîşaneya dexesî û tirsê ye. Kulîlk nîşaneya xêr û berê ye. Ev çînên ku nexşan pêk tînin, gelek çîrokan vedibêjin. Tejên ku li Culemêrgê têne çêkirin, pirî caran navê xwe ji navê êl û eşîran digirin. Her wekî jîrkî, herkî, ertûşî. Hin caran jî bi navê kesên ku ew afirandine hatine binavkirin. Mîna gulhenîfe, gulsarya. Hinek jî li gorî nexşan hatine binavkirin. Her wekî gulhezar, gulgever, lûleper, şehvanî, feqiyê teyran, gulferaşîn. Em dixwazin çend nexşan bi we bidin nasandin.

Lûleper

Ev nexş navê xwe ji kulîlka lûleperê digire. Lûleper navê kulîlkeke herêma Geverê ye. Ev cure kulîlk li cihên avî û avzêm, bi rengên zer, spî û sor vedibe.

Gulçîn

Ev nexş navê xwe ji berhevkirina gulan digire. Bi piranî ji nexşên şeşgoşe yên mîna şaneyên kewarê pêk tê. Her şaneyek bi rengekî ye.

Gulhezar

Her wekî ji navê wê jî diyar dibe, tê wateya hezar gulî.

Gulgever

Navê xwe ji gula zozanan digire. Li derdora nexşa gulê, çargoşeyên bi navê “nehrek” hene.

Şamarî

Wateya wê nexşeyê pakbûn û xwerûbûn e. Li serê nexşên ku dişibin şahmariyan bi rengên cur bi cur têne çêkirin, lewma bi vî awayî hatiye binavkirin.

Canbêzar

Tejên bi vî navî kedeke zêde dixwazin, lewre wisa hatine binavkirin.

Hevçêker

Tê wateya xwerû, xweser û tewrande. Li ser tejên bi nexşên hevçêker wêneyên ziha û pîrebokan hene.

4- Cihên vala bi navê nexşan dagirin.

1- Ev nexşe kedeke zêde dixwaze. _____

2- Tê wateya hezar gulî. _____

3- Ev nexşe navê xwe ji berhevkirina gulan digire. _____

4- Wateya wê nexşeyê pakbûn û xwerûbûn e. _____

5- Kulîlkeke herêma Geverê ya bi rengên zer û spî û sor. _____

6- Tê wateya xwerû, xweser û tewrande. _____

5- Pirsên li jêr li gorî nivîsa li jor bibersivînin.

1- Nexşa dûpişkê nîşaneya çi ye?

_____

2- Nîşaneya xêr û berê çi ye?

_____

3- Nexşên mîna jîrkî, herkî, ertûşî navên xwe ji çi digirin?

_____

4- Nexşên ku navên xwe ji kesan digirin kîjan in?

_____

5- Lûleper kulîlka kîjan herêmê ye?

_____

6- Nexşên ku navê xwe ji gulan digirin kîjan in?

_____

7- Nexşa şamarî navê xwe ji çi digire?

_____

Hunera teşedana zêr û zîv: Têlkarî

Têlkarî ango karê têlê! Têlkarî hunereke pir dîrokî û kevnare ye. Ev huner kedeke pir mezin û hûrbîniyekê dixwaze. Hunera Têlkariyê ku wekî destkariyeke suryaniyan tê naskirin, li ser axa Mezopotamyayê hunera destan a herî kevn e. Vê hunerê berî zayînê bi sê hezar salan li Mezopotamyayê dest pê kiriye. Di hunera têlkariyê de têlkar bi êgir teşe dide zîv û dike xemla keç û xortan.

Heta ku zîvê bêteşe dibe berhem di gelek qonaxan re derbas dibe.

Têlkar di serî de zivê xam li ser êgir dihelînin. Piştî helandinê zîv dixin qalibên wekî lewha. Ji bo her xeml û xişirekî qalibek tê bikaranîn. Zîv, piştî ku li ser êgir hate helandin û di qaliban de teşe girt, lewhe û têl jê tên çêkirin. Ew zîvê ku hatiye helandin di nava tar ango qasnaxê re bi sedan caran derbas dibe. Her careke ku di nava qesnaxê re derbas dibe, pêlekê (mîkron) ziravtir dibe. Zîvê ku bi sedan caran di nava tarê re derbas dibe, dibe wek tayê porê mirov.

Piştî ku têl tê kişandin, li gorî gerdenî, ristik, guhar, xizêm û gustîlan tê neqişandin. Ev karê neqişandin û teşedayîna zîv hemû di nava êgir de pêk tê. Ji bo çêkirina cotek guhar an jî gerdeniyekê bi sedan qulp û parçeyên têlên zîv yek bi yek bi hev ve têne lihêmkirin. Zîvê ku bû gustîl, gerdenî, ristik, guhar û berhemên din divê bê spîkirin jî. Tiştên ku hatine çêkirin di nav ava şor û asîtê re tê derbaskirin. Li pey spîkirinê di nava firina şûştinê re derbas dibe. Herî dawî yek bi yek di nava ardikê daran de tê ziwakirin. Bi porziwakerê tê paqijkirin. Piştî van hemû pêngavan êdî ew zîvê teşegirtî wekî xeml û xêz tê pêşkêşkirin.

6- Hevokên li jêr li gorî pêvajoya çêkirina berhemên têlkariyê rêz bikin.

Heta ku zîvê bêteşe dibe berhem di gelek qonaxan re derbas dibe.
Paşê lewhe û têl jê tên çêkirin. ___
Têlkar di serî de zîvê xam li ser êgir dihelînin __1__
Zîvê ku bû gustîl, gerdenî, ristik, guhar û berhemên din tê spîkirin. ___
Zîv di nava tar ango qasnaxê re bi sedan caran derbas dibe. ___
Zîv li gorî gerdenî, ristik, guhar, xizêm û gustîlan tê neqişandin. ___
Bi sedan qulp û parçeyên têlên zîv yek bi yek bi hev ve têne lihêmkirin. ___
Berhemên têlkariyê bi porziwakerê tên paqijkirin. ___
Berhem di nava ardikê daran de tên ziwakirin. ___
Tiştên ku hatine çêkirin di nav ava şor û asîtê re tên derbaskirin. ___
Berhem di nava firina şûştinê re derbas dibin. ___
Zîv dixin qalibên wekî lewha. ___

Peyvsazî

Rayeka dema niha ya hin lêkeran dibe paşgir.

Lêker	Paşgir	Peyvên pêkhatî
dîtin	bîn	hûrbîn, dûrbîn, çakbîn, bedbîn, tengbîn, xweşbîn, pêşbîn…
gotin	bêj	çîrokbêj, dengbêj, stranbêj, pirbêj…
rêtin	rêj	xwînrêj, avrêj, rondikrêj…
kêşan	kêş	renckêş, şûrkêş, pêşkêş, serkêş…
kuştin	kuj	agirkuj, êşkuj, mirovkuj, birakuj, zimankuj, xwekuj….
birîn	bir	êşbir, rêbir, porbir, darbir, cawbir…
firotin	firoş	nanfiroş, çekfiroş, rojnamefiroş, cilfiroş, gulfiroş….
kirin	ker	karker, hînker, zêrker, zîvker, têrker…..

Mînak

1- Dapîra min çîrokbêjeke baş bû.
2- Ew mirovekî zêde bedbîn e, tim li aliyê nebaş ê tiştan dinêre.
3- Komên agirkuj ber bi cihê agirpêketî ve diçûn.
4- Ez her serê sibehê rojnameyekê ji rojnamefiroş dikirim.
5- Yek Gulan Cejna Karkeran e.

7- Cihên vala bi peyvên li jêr dagirin.

dûrbîn	gulfiroş	dengbêj	zêrker	hînker	pirbêj

1- Şakiro _____ navdar bû.
2- Min gustîleke pir xweşik ji _____ kirî.
3- Şîlan keçeke _____ e û ew zêde dipeyive.
4- Min di roja evîndaran de ji _____ qevdek gul kirî.
5- Navê pirtûka me _____ e.
6- Qenco mirovekî _____ e, pêşbîniyên wî rast derdikevin.

8- Pirsên li jêr bibersivînin.

1- *Der barê pîşeyên destan de hûn çi dizanin?*
2- *Di taxa we de pîşekarî heye?*

Pîşekarî

Hinek kar hene ku hunereke taybet dixwazin. Me berê ew kar bi pîşekaran didan kirin. Pîşekarên mîna hesinkar, çilag, solbend, dirûnker, xirat, zêrker, zîvker û hwd hebûn. Me cil û bergên xwe bi dirûnkeran didan dirûtin, niha em ji cilfiroşan dikirin. Me pêlavên xwe bi solbendan didan çêkirin, niha em wan jî ji firoşkaran dikirin. Me derî û paceyên mala xwe bi xiratan û me alavên hesînî yên mîna gisîn, tevir, bêr, tevşo bi hesinkaran didan çêkirin. Me fi-raqên xwe bi spîkeran didan spîkirin. Êdî pîşesazî heye, pîşekariya destan zêde nemaye, kargehên pîşesaziyê cihê kargehên biçûk ên pîşeyên destan girtiye.

Dem	Kirde	Daçeka demê	Bireser	Dançêker	Lêkera bingehîn
Dema niha	Ez		malê	didim	siwaxkirin.
Dema bê	Delal	dê	diyariyekê	bide	anîn.
Dema boriya têdeyî	Min		kincên xwe	dan	şûştin.
Dema boriya dûdar	Şaredariyê		gelek avahî	dane	avakirin.
Raweya fermanî			çend nivîsan	bide	xwendin.

Mînak

(…) *min dikir û nedikir, nikaribû ew pereyên pêwîst bidana hev da ku gor bida çêkirin. Dawiyê min da çêkirin, axa pîroz ji Cizîra Botan da anîn, kevirên nehît dan şehkirin, mermerên fireştî dan anîn, hosteyên yekta peyda kirin û li dora gorê xaniyekî biçûk da avakirin.* (Mehmed Uzun, Bîra Qederê, r. 210)

9- Cihê vala bi lêkera avaniya dançêker “dan” li gorî demên diyarkirî dagirin.

1- Em xaniyekî _____ lêkirin. (dema niha)
2- Ez ê axa pîroz ji Cizîra Botan _____ anîn. (dema bê)
3- Wî kevirên nehît _____ şehkirin. (dema boriya têdeyî)
4- Tu mermerên fireştî _____ anîn. (Raweya fermanî)

10- Di nivîsa li jêr de binê hevokên dançêker xêz bikin.

Cengo Dembaş Zinar tu çawa yî? Kar û bar çawa ne?

Zinar Ez baş im, lê haya min ji kar û bar tune ye.

Cengo Çawa?!

Zinar Erê, bi Xwedê haya min jê tune ye. Ne wekî berê ye, kar hêsan bûye. Divê mirov her karî bi pisporên wî karî bide kirin. Ez jî wisa dikim. Tu dizanî ez avahîsaziyê dikim. Lê min alîkarek ji xwe re girtiye, hemû karên min ew bi rê ve dibe. Ew jî gelek karan bi karkeran dide kirin.

Cengo Ma kar bi vî awayî dimeşe?

Zinar Belê, heta niha tu xisar negihaştiye min.

Cengo Baş e, lê wisa betal bêhna te derdikeve?

Zinar Ma ez qet betal dimînim? Ez jî karê malê dikim. Xanim diçe çalakiyan, karê malê jî bi min dide kirin. Firaqan dide şûştin, paqijiya malê dide kirin. Li malê cilşo heye, ew kincan bi min nade şûştin, lê bi min dide raxistin. Wekî din em sê zarokan didin xwendin, hemû kar û barên wan jî bi min dide kirin.

Cengo Xwedê alîkarê te be. Karê te dijwar e.

Zinar Tiştek nabe, jiyan hevpar e.

B- Hunerên bedew

Hunereke nûjen:

Wênekêşî

1- Pirsên li jêr bibersivînin.

1- Hûn qet wêneyan dikişînin?
2- Hûn zêdetir wêneyên çi dikişînin û çima?

Hevpeyvîn bi wênekêş Enver Ozkahraman re

Yek ji wênekêşên navdar ên kurd jî Enver Ozkahraman e. Ozkahraman temeneke dirêj bi kişandina wêneyan derbas kiriye, heta niha gelek wêne kişandine û wêneyên wî ji gelek kovaran re bûne berg. Me li ser wênekêşiyê bi Ozkahraman re hevpeyvîneke pêk anî.

We kengê dest bi wênekêşiyê kir?

Bi awayekî zanatî di sala 1973'yan de li Culemêrgê min bi wênegireke erzan dest bi wênekêşiyê kir. Ji bo min her wêne bi serê xwe girîng e. Ji ber ku her wêne belgeyek e. Wêneyek dikare gelek çîrokan vebêje. Çer ku ez bi vê yekê hesiyam, min bi vê bîr û baweriyê dest bi vî karî kir.

Min dixwest hin tiştên ku min li herêma Culemêrgê dîtine mayinde bikim. Min digot, bila her kes bizane ku li Culemêrgê jiyaneke wisa heye. Jixwe hinek tişt hene, çer ku mirov dibîne, mirov dixwaze nemir bike.

Ez ji dil dibêjim, ez wênekêşiyê wekî kar nabînim. Ez dixwazim ji bo çand û hunera gelê xwe xebatê bikim. Ez 65 salî me, hê jî bi evîneke xurt wêneyan dikişînim. Heta ku ez hebim jî ez ê wêneyan bikişînim. Min li hundir û li derveyî welêt gelek caran pêşangeh vekirine.

Gotina "kurd û wêne" çi tînin bîra we?

Kurd û wêne çiyayên serspî, li zozanên di nav keviyên berfê de reşmal, kerî bi kerî pez, lûrelûra bilûra şivanan, qebeqeba kewê ribat, di nav de mêrên navmil pehn û fireh, zendstûr, pêmezin, simbêlgurz, çav û birûyên reş, pênc tilîyên wekî bilûrê....

Di pêyan de reşik, bi ser de şal û şapik, di nîvekê de şûtika ji armûş, di ber de tizbiya heqîq wek zerika hêkê û xencera soranî. Li serî dersokê simsimî. Li ser pişta hespekî kumêt û pişt ji ber giraniya xwedanê xwe yê kurd tewiyayî.

Ji bo wênekêşên ciwan hûn dikarin çi bibêjin?

Di demên berê de heta ku me wêneyek dikişand, em bi gelek astengiyan re rû bi rû diman. Di dema me de wisa bû. Dema mekanîkî û tunehiyê, dema destengiyê bû. Îro dema teknolojiyê ye. Wêşekêşî hêsan bûye. Ji bo ciwanên kurd ez dibêjim, wêneyên îro bikişînin, bila gelek tiştên ku hûn îro dibînin, ji bo zarokên we nebin xeyal.

2- Peyvên li jêr bigihînin wateya wan.

1- wênekêş	**a-** cihê pêşandana wêneyan
2- wênegir	**b-** belek
3- mayînde	**c-** xizanî, bêderfetî
4- pêşangeh	**d-** egal, kefî
5- şûtik	**e-** kesên ku wêneyan dikişînin
6- armûş	**f-** timzindî
7- dersok	**g-** makîneya wêneyan
8- simsimî	**h-** şeleme, piştên
9- nemir	**i-** herîr, hevrîşim
10- destengî	**j-** daîmî

1	2	3	4	5	6	7	8	9	10
e									

Çer ku…

1- Çer ku ez gihaştim malê, min televîzyon vekir.
(Dema boriya têdeyî) ***(Dema boriya têdeyî)***

2- Çer ku ez hişyar dibim, ez diçim serşokê.
(Dema niha) ***(Dema niha)***

3- Çer ku ez wî bibînim, ez ê jê re bibêjim.
(Raweya merc û daxwazî) ***(Dema bê)***

Heta ku….

1- Heta ku ew hat, ez li benda wê mam.
(Dema boriya têdeyî) ***(Dema boriya têdeyî)***

2- Heta ku bavê min tê malê, em li kuçeyê dilîzin.
(Dema niha) ***(Dema niha)***

3- Heta ku îskanek şîr venexwim, xewa min nayê.
(raweya merc û daxwazî) ***(Dema niha)***

4- Heta ku kurdî azad bibe, em ê têkoşînê bidomînin.
(Raweya merc û daxwazî) ***(Dema bê)***

5- Heta ku keştî bê, em li çayxaneyekê rûnin.
(raweya merc û daxwazî) ***(Pêşniyarî)***

3- Di nivîsa li jor de binê hevokên bi “çer ku” û “heta ku” xêz bikin.

Wênesazî

4- Pirsên li jêr bibersivînin.

1- Hûn kîjan wênesazên kurd dinasin?
2- Hûn ji berhemên kîjan wênesazî hez dikin?

Wênesaz:

Remezan Îlten

Bingeha wêneyên Remezan Îlten bêrîkirin e. Ew wênesazê bêrîkirinê ye, bêriya çi bike; dike ku mirov jî bêriya wan bike. Herî zêde jî bêriya axê dike. Ji axê hez dike, wêneyên wî teqez di rengê axê û di rengê surişta gundê wî de ne. Ax ji bo wî nîşaneya gundê wî ye. Gundê ku nêzî bîst salan e jê hatiye bidûrxistin. Mistek axa wê ya sor di berîka xwe de wekî qutiya titûnê ya cixarekêşekî digerîne. Kengî bêriya gundê xwe bike, wê axê derdixe û bêhn dike. Pirî caran jî bi hestên bêrîkirinê wêneyekî gundê xwe xêz dike.

Ew wekî dareke ku rehên xwe berde nava kûrahiya axa xwe, bi çand û hunera welatê xwe ve girêdayî ye. Hestên xwe yên kovî bi xet û xêzên xwe kedî dike, wan hestan vediguherîne wêneyên ku bêhna axê ji wan tê.

Ew bi wêneyên xwe mirovan dike hevparê hesreta dilê xwe. Ew ji reseniyê hez dike, her tiştê resen ê çanda xwe di kevalên xwe de bi cih dike da ku bala mirovan bikişîne ser wan. Ew ji dîmenên şênber hez dike, lewre jî di wêneyên xwe de zêde cih nade dirûv û nimûşên razber.

5- Cihên vala li gorî nivîsê dagirin.

1- Bingeha wêneyên Remezan Îlten _____ e.
2- Ew herî zêde bêriya _____ dike.
3- Nêzî _____ ku ew ji gundê xwe hatiye bidûrxistin.
4- Ew mistek axa sor di _____ xwe de digerîne.
5- Di wêneyên xwe de ew cih dide dirûvên _____

Ravekirina wêneyekî

Di bergehê de tiştê herî berbiçav zerya ye. Zerya di rengekî kesk û şîn de hemû wêne rapêçaye. Di navbera zerya û esmên de çiyayê bi berfê nixamtî heye. Li aliyê rastê ji pişt çiyayan rojê bi tirêjên xwe rengekî spî li ser zeryayê reşandiye. Li raserî çiya û zeryayê esman wekî cawekî şîn ê bi ewrên spî pînekirî xuya dike.

Nivîs

Mem û Zîn / Arîf Sevînç

Wêneyê li rex rave bikin.

A-Xebata li ser peyvan

1- Xaçepirs



Çeperast:

1- Karê çêkirina wêneyan, resamî.
2- Cihê ku lê genim tê hêran / Hejmarek
3- Tîpa piştî “S”yê/ Xwişka mezin/ Ajalek
4- Nîveka mil a ku dihêle mil duta bibe. / Cih û war
5- Rojek / Roja ku mirov tê de ye
6- Cînavkeke şanîdanê / Cînavkeke kesane ya tewandî
7- Kesên ku nabihîzin / Pêşî
8- Baxê tirî / Zerik
9- Kesên ku wêneyan dikişînin. / Gihanekek

Serejêr

1- Ders / Cînavkeke kesane
2- Jan / Ji du paran parek / Cihê ku mirov tê re diçe.
3- Rengê behrê / Nîşaneya kêfxweşiyê
4- Cînavkek / Nû
5- Veqetandeka nebinavkirî ya navderên nêr
6- Sewiye / Ser û çav, sûret / cînavka pirsiyariyê ya tewandî
7- Rayeka dema niha ya lêkera zayînê / Rayeka dema niha ya lêkera şûştinê / Par, pişk
8- Tayek ji pirçê / Berik, merş
9- Kesê/a ku hîn dike, fêrker

2- Cihên vala bi peyvên li jêr dagirin.

zîvker	wênekêş	dûrbîn	gulfiroş	stranbêj	rondikrêj

1- Hêlînê _____ da ber çavên xwe li girava Axtamara temaşe kir.
2- Meyremxan _____ navdar e.
3- Polîsan bi gaza _____ êrîşî xwepêşandaran kir.
4- Enver Ozkahraman _____ navdar ê kurd e.
5- Hogir ji _____ qevdek gul kirî.
6- Min ji _____ taxa me cotek guharên zîvîn kirî.

B- Xwendin

Amûreke muzîkê: Erbane

Amûra qesîde û stranên derwêşan; erbane. Li gorî lêkolînan erbane yekem car li ser axa Mezopotamyayê di dema Sumer û Hîtîtan de hatiye bikaranîn. Erbane, amûreke muzîkê ya kevn e. Erbane, ji eyarê sewalên mîna mih, bizin û roviyan û ji tara girover a ji dara gûz, tû û berûyê çêdibe.

Di demên berê de derwêş û şêxikên ku erbaneya xwe hildigirt, dever bi dever digeriyan û qesîde û stran digotin. Dema ku ew diçûn gundan, gundî li dora wan kom dibûn û li wan guhdarî dikir. Piştî ku şêx û dewrêşan kilam digotin, wan îsqata xwe dixwest. Gundiyan jî savar, rûnê nivîşk, pere û xwarinên wekî din didan derwêşan.

Erbane di çanda zerdûştiyan de cihekî taybet digire. Zerdûştî di pîrozbahiya biharan de şahiyên xwe bi erbaneyê pîroz dikin. Her wiha erbane di çanda kurdên êzîdî de jî xwediyê cihekî taybet e. Li gorî êzidiyan erbane dengê xweza û mirovahiyê digihîne hev.

1- Pirsên li jêr li gorî nivîsê bibersivînin.

1- Yekem car erbane li ku derê hatiye bikaranîn?

_____

2- Erbane ji çi tê çêkirin?

_____

3- Gundiyan wekî îsqat çi didan derwêşan?

_____

4- Erbane di çanda kîjan baweriyan de cihekî taybet digire?

_____

5- Li gorî êzidiyan erbane tê çi wateyê?

_____

Leonardo da Vinci

Leonardo da Vinci (1452 – 1519) wekî mîmar (avahîsaz), matematîknas û zanyarekî xebat kir. Ew muzîkvanekî baş bû, lê ji latînî nefret dikir. Di sala 1466'an de malbata wî mala xwe bar kir Floransayê û Leonardo li wir dibistan qedand. Di sala 1482'yan de wî di xizmeta Dûkê Mîlanê de dest bi xebatê kir. Her wiha wî planên avahiyan çêkirin û ew li ser matematîkê xebitî. Di heman demê de wî wêneyên ku anatomiya mirovan nîşan didin jî çêkirin û bi vê yekê jî diyar kir ku ew biyolojîstekî mezin e jî. Leonardo wekî endazyarê leşkerî jî xebat kir. Di sala 1502'yan de vegeriya Florensayê û kevala xwe ya navdar Mona Lîsa çêkir. Ji sala 1514'an heta 1516'an ew li Romayê jiya û xebatên xwe yên lêkolînî domandin. Wî di sala 1519'an de li Fransayê koça xwe ya dawîn kir.



Hûn dizanin?

- Leonardo da Vinci nivîsên xwe ji aliyê rastê ber bi çepê ve dinivîsandin, ji bo xwendina destnivîsên wî diviya mirov nivîs bidana ber neynikê.
- Ew dehayek bû, dema ku dinivîsand, wî dikarî hevokek bi destê rastê, yek bi destê çepê binivîsanda.
- Wî cawbir îcad kir.
- Wî planên avahiyan xêz kirin, lê tu carî avahiyek lê nekir.
- Piraniya wêne û planên ku wî li Mîlanê çêkirin, winda bûn.
- Di lênûska wî de planên tank, firoke û noqaran jî hebûn.
- Pêşbîniya wî ya zanistî bi sedan sal li pêş serdema wî bûn.

2- Ji hevokên jêrîn ji bo yên rast stûna (r) ji bo yên çewt stûna (ç) xêz bikin.

	Hevok	r	ç
1	Leonardo dibistan li Londonê qedand.		✓
2	Wî planên avahiyan çêkirin û ew li ser matematîkê xebitî.		
3	Wî li Florensayê kevala xwe ya navdar Guernica çêkir.		
4	Ew di sala 1519'an de li Fransayê mir.		
5	Leonardo da Vinci gelek avahî lê kirin.		
6	Wî cawbir îcad kir.		
7	Piraniya wêne û planên ku wî li Mîlanê çêkirin, hê jî hene.		
8	Di lênûska wî de planên firoke û noqaran jî hebûn.		

3- Li gorî van pirsan çîroka wêneyê Picasso yê bi navê Guernica binivîsin.

1- Ev wêne navê xwe ji ku digire? **2-** Ev wêne kengî û li ser kîjan bûyerê hatiye xêzkirin?
3- Wêne bûye sembola çi?

_____

_____

_____

C- BIKARANÎNA ZIMÊN

1- Cihên vala bi rengderên şanîdanê dagirin.

1- Em ê _____ mijarê di civîna xwe de nîqaş bikin.
2- _____ rojê ez du seatan li benda te mam.
3- Ez _____ pirtûkên ku min dan te dixwazim.
4- Kes _____ karê giran nake.
5- Ji kerema xwe _____ nanî bide min.
6- _____ pênûsan bide mamosteya xwe.

2- Lêkera "dan"ê li gorî demê bikişînin.

1- Ez spartekên xwe bi birayê xwe _____ çêkirin.
2- Wan mala xwe bi barkêşan _____ kişandin.
3- Em ê li gund xaniyekî mezin _____ avakirin.
4- Ez dixwazim ji xwe re cotek bazin _____ çêkirin.
5- Ew dikare hemû karên xwe bi hevalên xwe _____ kirin.

3- Lêkerên di nava kevanekê de li gorî forma rast bikişînin.

1- Çer ku bavê min hat, me dest bi xwarinê _____ (kirin).
2- Heta ku em bigihêjin malê, dê roj _____ ava. (çûn)
3- Heta ku tu karê xwe neqedînî ji malê _____ (derketin/ neyînî).
4- Çer ku derî _____, pisîkê baz da derve. (vebûn)
5- Çer ku ez çavên xwe _____ , ez dikevim xewê. (girtin)
6- Heta ku serok neyê, em dest bi civînê _____ (kirin/neyînî)

- Xwezî
- Çîrok
- Xem û meraq
- Spartek

A- Xwezî

Xwezî dîsa zarok bûma

Xwezî ez dîsa zarok bûma
Li ber dilê dayika xwe bûma
Berbangê dîsa hişyar bûma
Li ber çîmenan bax bûma

Xwezî ez deqakê cahil bûma
Di çiya û baniyan de xwar bûma
Li mehîna belek siwar bûma
Paşê dîsa kal bûma

Xwezî

1- Pirsên li jêr bibersivînin.

1- Kî dixwaze li ber Behra Wanê be?

_____

2- Bager dixwaze çi bixwe?

_____

3- Dilovan dixwaze li ku derê be û li çi temaşe bike?

_____

4- Kî dixwaze bi bêhna kulîlkan sermest bibe?

_____

5- Welat dixwaze bifire û biçe ku derê?

_____

6- Serhat dixwaze çi bike?

_____

Raweya merc û daxwazî –II (Pêknehatî)

Cînavk	Qertafa raweya fermanî	Rayeka dema borî	Tîpa kelijandinê	Qertafên kesane	Qertafa raweya xwestekî	Raweya xwestekî
Ez	bi	hat	a	m	a	bihatama / nehatama
Tu				yî		bihatayî / nehatayî
Ew				-		bihata / nehata
Em				n		bihatana / nehatana
Hûn				n		bihatana / nehatana
Ew				n		bihatana / nehatana

Bi lêkerên gerguhêz

Kirde	Bireser	Qertafa raweya fermanî	Rayeka dema borî	Tîpa kelijan-dinê	Qertafên kesane	Qertafa raweya xwestekî	Raweya xwestekî
Min	tu	bi	dît	a	yî	a	bidîtayî / nedîtayî
Te	ez				m		bidîtama / nedîtama
Wî/wê	ew				n		bidîtana / nedîtana
Me	hûn				n		bidîtana / nedîtana
We	em				n		bidîtana / nedîtana
Wan	ew				-		bidîta / nedîta

Têbinî: Di raweya xwestekî de tîpa kelijandinê “i” dibe “a”. Qertafa kesê duyemîn “î” diçe dawiyê.

Mînak

Zozan Gotûbêja duh gelekî balkêş bû. Xwezî tu jî bihatayî.

Berfîn Mixabin duh dereng ji cihê kar derketim. Diviya min projeya li ber destên xwe biqedanda û radestî gerînende bikira.

Zozan Tu û Zînê li heman cihî dixebitin, te jê re bigota, bila wê alîkariya te bikira.

Berfîn Ew jî li ser projeyeke din dixebitî, heke karê wê tunebûya, dê alîkariya min bikira.

Xwezî îro betlane bûya û ez neçûma kar. Heke ez neçûma kar, ez ê heta nîvro raketama. Paşê ez ê rabûma, min ê xwarin bixwara û ez ê biçûma ber deryayê, li kafeyekê rûniştama û min ê ji xwe re pirtûk bixwenda. Min ê berêvarkî gazî çend hevalan bikira, bila ew jî bihatana. Em ê rûniştana me yê bi hev re sohbet bikira, dibe ku em bi hev re biçûna sînemayê. Heke ev daxwaza min pêk bihata, ez ê pir dilgeş bibûma. Lê niha divê ez rabim û biçim ser karê xwe.

2- Lêkerên di nava kevanekê de bixin forma merc û daxwazî.

1- Heke ez zû _____ (rabûn), ez ê _____ (gihaştin) hevalan.
2- Heke te ji min re _____ (gotin), min ê alîkariya te _____ (kirin).
3- Heke wê em _____ (dîtin), dê bi me re _____ (hatin).
4- Xwezî mirovan hev _____ (ne/kuştin), zarok sêwî _____ (ne/man).
5- Xwezî te ji rewşa min fêm _____ (kirin).
6- Bila te ji min hez _____ (kirin), bila tiştekî min _____ (tunebûn)
7- Bila ez kor _____ (bûn), bila min tu di vê rewşê de _____ (dîtin).
8- Diviya ez duh beşdarî civînê _____ (bûn), lê karekî min derket.

Ramanên xweş û rastiya tehl

Ev serê çend mehan bû ku Bager li kuçe û kolanên wî bajarê biyan bû. Jiyana bajêr jê re pir dijwar dihat. Her roj serê sibehê diçû bazara karkeran, heke karek bi dest biketa diçûyê, heke bi dest neketa dîsa vedigeriya mala xwe ya wêran. Wê rojê jî serê sibê zû hişyar bû û berê xwe da bazara karkeran. Li bazarê nêzî 30- 40 kes li benda kardarekî bûn. Nêzîkî nîvro kardarek hat û çend heb ji wan birin karê avahîsaziyê. Karê avahîsaziyê pir zehmet bû, bi ser de jî hewa pir germ bû. Bager li aliyekî karê xwe dikir, li aliyê din jî diket nav xeyalên xweş. Li gundê xwe difikirî û di dilê xwe de digot;

"Xwezî ez niha li gund bûma, niha dema tirî ye, ez biçûma nav rezan, min ji xwe re çend gûşî tirî ji mêwan jêkirana, min bianiya ser kaniya gund û min bixista nava avê, piştî ku têr cemidî, min bixwara. Min çend mist ji ava cemidî vexwarana û pê tîna xwe bişikanda. Belkî paşê jî ez biçûma nav hêjîran, min hinek jî hêjîr berhev bikirana…"

Di wê navê bi dengê serekê karkeran vecinîqî, "Zû karê xwe bike, ev der ne cihê razanê ye." Bi van gotinan Bager ji nav deryaya xewn û xeyalên xwe derket û li rastiya tehl vegeriya. Diviya heta dawiya havînê li vî bajarê xopan bimaya.

3- Di nivîsa li jor de binê lêkerên bi raweya merc û daxwazî xêz bikin.

B- Çîrok

Evîn an hesûdî

Li welatekî mîrek hebû, kê sûcek dikir, digirt û diavêt zîndanê, piştî demekê li qada bajêr şênî berhev dikir, sûcdar dianî qada bajêr û şansek dida wî. Li ber wî du derî hebûn; li pişt deriyekî pilingek û li pişt deriyê din jî keçikeke xweşik hebû. Heke deriyê piling vekira dihate kuştin, heke deriyê din vekira bi bextê xwe şa dibû. Bi vî awayî gelek kes bûbûn nêçîra pilingê dirinde û gelek kes jî bi bextê xwe şa bûbûn.

Xortek hebû, dilê wî ketibû dotmîrê û dotmîrê jî ji wî hez dikir. Rojekê mîr bi vê yekê hesiya û ew xort da girtin. Piştî demekê dora ceribandina wî jî hat. Heman merasîm ji bo wî jî hate lidarxistin. Li pişt deriyekî keçikeke xweşik, li pişt deriyê din pilingekî dirinde hebû. Li pêşberî wî jî li kêleka mîr, dildara wî dotmîr rûniştibû.

Dotmîrê pê dizanî ku li pişt kîjan deriyî çi heye. Li pişt deriyekî keçikeke xweşik hebû, wê keçikê jî ji wî xortî hez dikir, dotmîrê çend caran dîtibû ku awirên dildarê wê jî bi dilbijîn zîvirîne ser wê keçikê. Vê yekê agirê hesûdiyê bi dilê wê xistibû.

Dema ku xort di ber dotmîrê re derbas dibû, wê bi awayekî nepenî deriyek nîşanî dildarê xwe da, gelo wê kîjan derî nîşan da?

Ji bîr mekin ku dotmîr pir ji kurik hez dike û naxwaze ku ew bimire, lê li aliyê din jî naxwaze ku ew bibe para yeke din. Gelo kîjan hest bi ser ket, evîn an hesûdî?

1- Li ser pirsa li jor nîqaş bikin û dawiya çîrokê hûn binivîsin.

_____

_____

_____

_____

_____

_____

_____

2- Di nivîsa "Evîn an Hesûdî" de binê lêkerên bi çîrokiya dema boriya têdeyî xêz bikin.

Çîrokiya dema boriya têdeyî

Cînavk	Rayeka dema borî ya lêkerê	lêkera alîkar "bûn"	Qertafên ke-sane	Çîroka dema boriya têdeyî
Ez	hat	bû	-m	hatibûm / nehatibûm
Tu			-yî	hatibûyî / nehatibûyî
Ew			-	hatibû / nehatibû
Em			-n	hatibûn / nehatibûn
Hûn			-n	hatibûn / nehatibûn
Ew			-n	hatibûn / nehatibûn

Bi lêkerên gerguhêz

Lêker	Çîroka dema boriya têdeyî (Kesên sêyem)
ketin	ketibû / ketibûn
xwestin	xwestibû / xwestibûn
kirin	kiribû / kiribûn
çûn	çûbû / çûbûn
bûn	bûbû / bûbûn
şûştin	şûştibû / şûştibûn
man	mabû / mabûn
avêtin	avêtibû / avêtibûn

Têbinî:
Dema ku rayeka dema borî bi dengdarê biqede ji bo ku du dengdar neyên ber hev dengê kelijandinê "i" dikeve navberê.

Mînak

1- Baranê berî du rojan dest pê kiribû, hê jî dibariya.
2- Diya min berî min gihaştibû malê.
3- Deriyê malê vekirî mabû, ji ber vê yekê pisîk ketibû malê.
4- Ev zarok berî sê rojan ji ser banî ketibû, hê jî bi ser xwe ve nehatiye.
5- Diyar ji min re gotibû, tu carî neheqiyê li xelkê meke.

3- Lêkerên di nava kevanekê de li gorî çîrokiya dema boriya têdeyî bikişînin.

Ev du roj bûn ku ji Batmanê _____ (derketin), carinan _____ (meşîn), carinan baz _____ (dan) Dema ku zêde _____ (westan), li cihekî talde _____ (rûniştin). Şeva tarî xof _____ (xistin) dilê wê, siyên dar û zinaran bi dû wê _____ (ketin). Wê jî _____ (dan) dû Çemê Dîcleyê û di berbanga sibê de _____ (gihaştin) Heskîfê (…).

Rojhilat Dêrsimî

Nêçîra Kewan

Bavê wî rojekê bangî wî kiribû û gotibû: “Ez ê îro te bi xwe re bibim nêçîrê.” Ji vê yekê re pir kêfa wî hatibû. Ber bi cihê nêçîrê ve bi rê ketibûn. Piştî ku gihîştibûn kozika nêçîrê bavê wî gotibû, “Dengê xwe meke û xwe dayne”, lewre ew li quncikekî rûniştibû û ji ber bêdengiyê di xew re çûbû. Paşê bavê wî ew hişyar kiribû û gotibû, “Rabe rabe, kewekî bi qasî serê te hatiye”. Wî dît ku kewek li dora qefesê diçe û tê. Wî û kewa di hundirê qefesê de beranberî hev dikirin qebeqeb. Bêhneke din kewê derve ji bêhna kewa mê xwe avêtibû hundir û bi carekê bavê wî deriyê qefesê lê girt…

4- Gelo hûn dikarin encamekê ji çîroka li jor re binivîsin?

_____

_____

_____

_____

_____

_____

_____

_____

_____

C- Xem û Meraq

Xeman mexwe

Zelal Te xêr e Bahoz, çima te wisa mirûzê xwe tirş kiriye?

Bahoz Duh min dosyaya xwe ya xebatê li vir ji bîr kiribû, ji serê sibê ve ez lê digerim, lê ez nabînim. Ji ber vê yekê bêhna min gelekî teng bûye. Dibe ku hinekan biribe. Heke bi dest hevrikên me ketibe, kardar dê min ji kar biavêje.

Zelal Na, zêde xeman mexwe, dibe ku hevalekî/ê rakiribe û danîbe cihekî. Te ji hevalan pirsî?

Bahoz Belê min ji her kesî pirsî, kesî nedîtiye. Bi tenê Zozan ne li vir e, Xwedê bike wê veşartibe. Ka hejmara telefona wê bi te re heye? Ez telefonî wê bikim.

Zelal Hewce nake ku tu telefon bikî, ez niha diçim mala wan. Ez ê jê re bibêjim, heke wê dîtibe, bila li te bigere.

Bahoz Baş e, gelekî spas.

Zelal Spasxweş.

1- Hevokên li jêr li gorî nivîsa li jor biqedînin.

1- Bahoz mirûzkirî ye ji ber ku _____

2- Bahoz ditirse ku _____

3- Bahoz ji hemû hevalan pirsa dosyayê kir, ji bilî _____

4- Bahoz hêvî dike ku Zozanê _____

5- Zelal dê _____

Raweya merc û daxwazî –III (hevedudanî)

Cînavk	Rayeka dema borî	Rayeka dema niha ya lêkera bûn	Qertafên kesane	Raweya merc û daxwazî
Ez	hat	b	im	hatibim / nehatibim
Tu			î	hatibî / nehatibî
Ew			e	hatibe / nehatibe
Em			in	hatibin / nehatibin
Hûn			in	hatibin / nehatibin
Ew			in	hatibin / nehatibin

Lêkerên gerguhêz

Cînavk	Lêker
Min	gotibe / negotibe
Te	kiribe / nekiribe
Wî/wê	xwestibe / nexwestibe
Me	dîtibe / nedîtibe
We	xwaribe / nexwaribe
Wan	anîbe / neanîbe

2- Di nivîsa li jêr de binê lêkerên bi forma merc û daxwaziyê xêz bikin.

Evîn dilsozî ye

Ez dîsa dereng mam, heke hatibe niha çavên wê li riya min in. Heke berî min gihaştibe malê, teqez dê dest bi amadekariya xwarinê bike. Dibe ku hê nehatibe. Heke nehatibe, ez ê berî wê biçim, ez ê kulîlkan bixim guldankê, ez ê malê bidim hev û dest bi amadekirina xwarinê bikim.
Min jê re gotibû ez ê berî te werim, ez ê amadekariyê bikim. Heke berî min hatibe, dê bi awirên tijî tinaz û henek ji min bipirse, ka ez çima dereng mame. Ez ê pêşî bi maçekê dilê wê xweş bikim û lêborîna xwe jê bixwazim. Gelo haya wê jê heye? Dibe ku hinekan jê re gotibe, dibe ku hê nebihîstibe. Heke pê hesiyabe jixwe dê bixwaze ku ez jê re bi berfirehî bibêjim, lê heke kesî jê re negotibe jî ez ê bibêjim. Rastî çendîn tûj û tehl be jî, divê mirov tiştekî ji hev veneşêre. Raz û derew evînê dikujin, ji ber ku evîn dilsozî ye.

3- Lêkerên di nava kevanekê de bikin forma merc û daxwaziyê.

1- Heke diyar _____ (hatin), ez ê jê re rastiyê bibêjim.
2- Dibe ku wan bûyer _____ (bihîstin).
3- Xwezî diya min ji me re mehîr _____ (çêkirin)
4- Heke tu bi tiştekî _____ (hesîn), ji me re jî bibêje.
5- Dibe ku ew bi ser riya malê ve _____ (bûn/neyînî).

A-Xebata li ser peyvan

1- Cihên vala bi lêkerên li jêr dagirin.

sermestbûn	radestkirin	berhevkirin	tînşikandin
şabûn	bi ... hesîn	bêhntengbûn	

1- Em bi xweşikahiya dîmena bajêr _____ _____.
2- Xwediyê malê diz girt û ew _____ polîsan _____.
3- Ez dereng _____ bûyerê _____.
4- Tasek av bide min da ku ez pê _____ xwe _____.
5- Wê gelek çîrok û metelok _____ _____.
6- Zarok bi diyariyên bavê xwe _____ _____.
7- Ji ber van gotinên nexweş _____ min gelekî _____ _____.

2- Xaçepirs



Çeperast:

1- _____a gûzê / _____ û bask, pel.
2- Ayîn, dîn / Ji sedî sed, qethî.
3- _____ û kevan/ Çapikî, ecele, bi _____ û bez
4- Felaket, karesat, bobelat / Rayeka dema borî ya lêkera “bûn”ê.
5- Di ola îslamê de roja betlaneyê / Di kîmyayê de sembola astatînê/ Rayeka dema borî ya lêkera “kirin”ê.
6- Hurmet / Ev sal, sala mirov tê de.
7- Qertafa piçûkî û delalkirinê.
8- Belê / Paşgirek her wekî zêr___, zîv___
9- Midûr, rêveber.

Serejêr

1- Keça mîr / Di kîmyayê de sembol zêr.
2- Hêl, rex / Ne dûr, berdest
3- Pêşgirek, her wekî ___ bûn, ___ xistin, ___ ketin. / Paşgirek, her wekî bêj ___ (spîker).
4- Di muzîkê de notayek / Bermahiya tiştê şewitî, xwelî.
5- Kesên ji welatekî/ veqetandeka binavkirî ya pirjimar
6- Hîç, tu / Hejmarek
7- Col, keriyê mih û bizinan/ Alifa sewalan, cînavka pirsiyariyê ya şanîdanê / Paşgira ku, lêkerên negerguhêz çêdike, her wekî fir___, ger___, guher…
8- Cînavkek / Berz, bala
9- Berê wekî çeka şer a sereke dihat bikaranîn.

B- Xwendin

Kebaba Amedê



Rojhilat Dêrsimî

Rojekê feqehên medreseyekê li mizgeftê rûniştibûn û wan behsa xweşikahiyên Amedê dikir. Feqehekî got:

- Li Amedê xwarinek heye û navê wê kebab e. Ew wisa xweş e ku wesfa wê nayê dayîn.

Ji feqehan yekî rahişt pênûs û lênûska xwe û ew nav nivîsand û xist berîka xwe. Rojekê wî feqehî xwe gihand bajarê Amedê û rasterast berê xwe da xwaringehekê. Lênûska xwe derxist, çavên xwe lê gerandin. Di wê navberê de garsonek hat, jê daxwaza wî pirsî:

- Fermo, tu çi xwarinê dixwazî?

- Heke li cem we kebab hebe, kebabekê bidin min.

Garsonî berê xwe da pêjgehê, sparîşa kebabekê da û seleteyek bi xwe re anî; ev selete danî ber feqehî û devê selika nên jê re vekir. Feqeh kete ser seleteyê û ew bi nên xwar. Dema ku selete qedand berê xwe da qaseya xwaringehê. Xwediyê xwaringehê jê pirsî:

- Ezbenî, te çi xwaribû?”

- Min kebabek xwar.

Xwediyê xwaringehê buhayê got, Feqehî heqê kebabê da.

Feqeh vegeriyaye mizgeftê û tinazên xwe bi hevalên xwe kirin:

- Heyran me ew kebaba ku we pesnê wê dida jî xwar. Ew tiştê ku hûn jê re dibêjin kebab e, tenê cureyekî seleteyê ye.

Feqehan jî wiha tinazên xwe bi wî kirin:

- Belengazo, ew tiştê ku te xwariye pêxwarina kebabê ye. Kebab cureyekî goştê biraştî ye û te belasebeb heqê kebabê daye. Heke te hinekî sebir bikira te yê ew jî bixwara. Lê te kul kir ber xwe û vegeriyayî. Te hem kebab nexwar hem jî heqê kebabê da.

Feqehî stûyê xwe tewand û nema zanibû çi bersivê bide wan.

1- Ji hevokên jêrîn ji bo yên rast stûna (r) ji bo yên çewt stûna (ç) xêz bikin.

	Hevok	r	ç
1	Feqeh li ber mizgeftê rûniştibûn.		✓
2	Feqehekî qala qidamên Mêrdînê dikir.		
3	Feqehek ji bo xwarina kebabê li Amedê çû xwaringehekê.		
4	Wî kebab xwar û gelekî jê hez kir.		
5	Wî heqê seleteyekê da.		
6	Ji hevalê xwe re got, “Kebab cureyekî seleteyê ye.”		
7	Hevalên wî tinazên xwe pê kirin.		
8	Feqehî bi rewşa xwe keniya.		

HezkiriyŒn tariy

Li Amûdê, mala me li derveyî bajêr bû. Bi şev di wê kolana dirêj re ya ku mala me digihîne navenda bajêr, ji ewteewta kûçikên har û ji ber sawa tariyê kes newêrîbû di wê kolanê re bimeşiya. Zêdeyî deh salan xelkê da pey şaredariyê da ku lembeyan daynin. Dawiya dawî daxwaza wan pêk hat û li seranserê wê kolana dirêj lembeyên mezin rêz kirin. Ronahiya wan şeva bajêr jî kiribû roj. Wê rojê kêf kêfa xelkê bû, lê kêfa me zarokan mezintir bû. Ji ber ku me xweşiya herî mezin di dinyayê de keşif kir. Ew jî ew kêlîka ku kevirê di destê yekî ji me de difiriya ber bi lembeyeke mezin ve û gurmînî jê dianî. Ew li ber lingê me dibû piçik û parî û bajar jî diket nav dilê tariyê. Her ku wan lembeyeke nû datanî, pê re pê re zarokên nîşandar du lempeyên din dişkênandin. Hetanî ku şaredarî jî nema di ber kirîna lembeyan re giha û ew kolana dirêj careke din ji dêvla ku mirov lê bimeşin bûbû cih û warê kûçikên şevê.

Heta niha min ew eşqa şikenandin û vemirandina wan lempeyan û dijminayiya bi ronahiyê re baş fêm nekiriye.

Nizanim ji ber qehra bavên me yên zalim bû yan jî ji ser qehra Hikumeta ku ew lembe danîbûn bû!

Tenê ez dizanim ku her yekî ji me dema lembeyeke vêketî ji jor de dianî xwarê, bi kêf û şahî direqisî û mîna generalekî biçûk ku di şerekî mezin de bi ser ketibe pozbilind û jixwerazî dimeşiya. **(Helîm Yûsiv)**

2- Pirsên li jêr li gorî nivîsê bibersivînin.

1- Mala nivîskêr li ku bû?

_____

2- Çima kesî newerîbû di wê kolanê re bimeşiya?

_____

3- Xelkê bi salan ji bo çi da pey şaredariyê?

_____

4- Kêfa zarokan ji ber çi dihat?

_____

5- Şaredariyê çima dev ji danîna lempeyan berda.

_____

C- Bikaranîna zimên

1- Cihên vala bi forma merc û daxwazî dagirin.

Mînak

Xwezî min ew bidîta.

Strnana Derwêşê Evdî

Delalo delalîko
(…)
Xwezî careke din Derwêşê dilê min li ber deriyê mala bavê min _____ (rawestan).
Tasek çeqilmast û dewê mihan ji min porkurê _____ (xwestin)
Min ê jê re pêşkêş _____ (kirin)
De bila stûna mala bavê min _____ (şikestin)
Delalo delalîko...
Heke Derwêşê dilê min _____ (hatin) mala bavê min bi mêvanî
Min ê jê re _____ (raxistin) kulavê sor ê Xurestanî
Min ê jê re şerjê _____ (kirin) berxa sor ê serberanî
Heke dê û bavê min _____ (gotin) kanê berxa sor ê serberanî.
Min ê bigota şilî bû, şepelî bû, şivanê me kurê xelkê bû, ji çolê neanî...

Esma Sürücü

2- Di nivîsa li jêr de binê lêkerên di forma çîrokiya dema boriya têdeyî de xêz bikin.

- Kî ker e?

Esma Sürücü

Di pola yekem a dibistana seretayî de, hevalekî me hebû, dikir û nedikir hînî zimanê erebî nedibû. Xwe bi zor û heft bela hînî gotinekê kiribû û her tim ew gotin dinîvisand. Ew gotin jî ev bû: “Ena hîmar” ango “Ez ker im.” Piştî hînbûna alfabeya erebî, me biryar girtibû ku li her deverê em vê gotinê binîvisînin. Da ku kî bixwîne, bi rewşa xwe bihese. Çêtir e ku yek bi dengekî bilind bixwîne. (…)
Me di nava çend rojan de hemû kuçe û kolanên Amûdê bi vê gotinê xemilandibûn. Kesekî ku bizanibe bixwîne û xwe wekî ker nedîtibe li bajêr nemabû. Carekê dema ku min ev gotin dinivîsand çend zilaman ez dîtim. Gava wan nivîs xwend, ew hêrs bûn û bi pey min ketin. Bi bazdanê negihan min, lê dengê zilêm her dikete guhê min:
- Xwezî tu di dersên xwe de jî wilo jêhatî bûya, hema bi kêmanî tu yê bûba tiştek û te yê xêrek bigihanda dê û bavê xwe. **(Helîm Yûsiv)**

3- Lêkerên di nava kevanekê de li gorî çîrokiya dema boriya têdeyî bikişînin.

1- Dema ez ji xew hişyar bûm, diya min taştê amade _____ (kirin)
2- Bager berî me _____ (gihaştin) malê.
3- Min heta wê demê dîmeneke wiha xweşik _____ (dîtin/neyînî)
4- Gava ku min ew dît, ew hê nû ji bajêr _____ (hatin).
5- Heta ku em gihaştin îstasyonê trên bi rê _____ (ketin).
6- Wê rojê me li Parîsê taştê, li Londonê firavîn _____ (xwarin).
7- Deriyê malê ji nişka ve _____ (vebûn) û ew _____ (ketin) hundir.
8- Berî ku hêviya xwe jê qut bikin, ew bi rojan li zaroka xwe _____ (gerîn).
9- Bûyera ku berî du rojan _____ (qewimîn), êş dixist serê wî.
10- Çîroka ku dapîra min ji min re _____ (gotin), qet ji bîra min nediçû.

4- Beşên hevokan bigihînin hev.

1- Heke ez di ezmûnê de bi ser neketibim
2- Heke te pirtûk li malê ji bîr kiribe
3- Heke baran rawestiyabe
4- Heke diya te xwarin amade kiribe
5- Heke taxa we zêde guherîbe
6- Heke te sond xwaribe
7- Heke wê pirtûka min xwendibe

a) em ê derkevin derve.
b) bila li min vegerîne.
c) ez ê gelekî xemgîn bibim.
d) em biçin, bixwin
e) ez ê nas nekim.
f) divê tu rastiyê bibêjî.
g) divê tu biçî malê bînî.

1	2	3	4	5	6	7
c						

Çîrok Remildank Xwezî Rêwîtî Zargotin Çiyayê Nemrûdê

A- Çîrok

1- Lêkerên di nava kevanekê de bixin forma dema niha.

Gora spî û boçika qut

Mêrikek rojekê di nav rezê xwe de marekî _____ (dîtin). Pêşî _____ (xwestin) marî bikuje, lê rehm _____ (ketin) dilê wî û dev jê _____ (berdan). Li ser vê yekê mar jî zêrekî _____ (dan) wî. Piştî vê yekê, mar û mêrik _____ (bûn) hevalên hev. Mar her roj zêrekî dide mêrik û ew jî _____ (birin) malê, pê debara xwe _____ (kirin). Demeke dirêj rewş bi vî rengî _____ (domîn). Rojekê hestên çikûsî û azweriyê mêrik dîl _____ (girtin) û mêrik di dilê xwe de _____ (gotin), "Ez bawer dikim di qula marî de gencîneyek heye, heke ez wî bikujim ez ê dewlemend bibim."

Sibehê _____ (rahiştin) tevrikê xwe û wekî her carê berê xwe dide nav rêz. Mar wekî berê zêrekî jê re _____ (danîn) û _____ (vegerîn). Lê berî ku mar bigihêje cihê xwe, mêrik têvir li boçika marî _____ (xistin) û qut dike. Lê mar xwe ji mêrik xelas dike û _____ (ketin) qula xwe.

Roja din kurê mêrik _____ (hatin) nav rêz, mar ji paş ve tê û bi kurik _____ (vedan) û kurikî _____ (kuştin). Dibe nîvro, kurik _____ (na/hatin) malê, dê û bavê wî lê _____ (gerîn) lê wî _____ (na/dîtin). Yekî gundî dibêje, "Min vê sibehê kurê we dît, diçû nav rezan." Dema ku ew _____ (hatin) nav rêz dibînin ku mar bi kurê wan vedaye û kurik miriye. Xwediyê rêz _____ (rabûn) gora lawê xwe di nav rêz de _____ (kolan) û li wir _____ (veşartin) û qubeyeke spî li ser gora lawê xwe ava dike. Rojekê xwediyê rêz û yekî gundî tên nav rêz, mêrik li hemberî cihê marî _____ (rawestan) û bangî wî dike, "Birayê mar were wek berê em bibin dostê hev!" Ê gundî lê _____ (vegerandin) û dibêje:

-Ma hûn ê çawa ji nû ve bi hev bawer bibin, gora spî û boçika qut.

B- Remildank

1- Lêkerên di nava kevanekê de bikin raweya fermanî û raweya merc û daxwaziyê.

1-Beran (Adar 21- Avrêl 20)
Tu yê biryarên girîng _____ (dan). Ew biryar dê jiyana te _____ (guherîn). Tu yê gelekî bextewar _____ (bûn). Lê divê tu guh _____ (dan) şîretên heval û hogirên xwe.

2- Ganêr (Avrêl 21 – Gulan 21)
Tu yê beşdarî şahiyekê _____ (bûn). Tu yê li wir hin kesan nas _____ (kirin). Yek ji wan dê ji te re _____ (bûn) heval û destbirak. Hûn ê bi hev re gelek karên serkeftî _____ (kirin). Lê bila haya te ji xêrne-xwazan _____ (hebûn), ew dikarin rê li ber serkeftina we _____ (girtin).

3- Cêwî (Gulan 22 Pûşber 21)
Riyeke nêzîk li ber te ye, hefteya bê, tu yê _____ (çûn) derekê. Tu yê li wir rastî yekî/ê _____ (hatin). Hûn ê gelekî ji hev hez _____ (kirin). Lê ji bîr _____ (me/kirin), "Evîna bextewar tune ye."

4- Kevjal (Pûşper 22 – Tîrmeh 22)
Tu yê hevalekî xwe _____ (dîtin). Tu yê xeberên xêrê jê _____ (bihîstin). Mizgînî li te, dê rojên dijwar li paş _____ (man).

5- Şêr (Tîrmeh 23- Gelawêj 22)
Hevaleke te dê _____ (hatin) seredana te. Tu yê gelekî kêfxweş _____ (bûn). Divê tu gelekî qedrê wê _____ (girtin).

6- Şehrîwar (Gelawêj 23- Rezber 23)
Di demeke kin de tu yê gelek pereyan bi dest _____ (xistin). Tu yê ji xwe re siwareyekê _____ (kirîn). Mixabin di warê evînê de xebereke xêrê tune ye. Lê tu yê bibêjî, "Bila dil bi dil be, bila tûrê parsê li mil be."

7- Mêzîn (Rezber 24- Kewçêr 23)
Dê hevaleke/î te ji te _____ (xeyidîn). Divê tu xeletiya xwe _____ (dîtin) û jê lêborînê _____ (xwestin). Dibe ku te _____ (bexşandin).

8- Dûpişk (Kewçêr 24 – Sermawez 22)
Serkeftin gelekî nêzîkî te ye. Lê divê tu pir _____ (xebitîn). Hinek xêrnexwaz li dora te hene, xwe ji wan _____ (parastin)!

9- Kevan (Sermawez 23- Berfanbar 21)
Tu yê di warê aborî de hinekî tengasiyê _____ (kişandin). Bi alîkariya hevalan dê pirsgirêk çareser _____ (bûn). Lê divê tu ji niha pê ve pir bi hişyarî gava xwe _____ (avêtin).

10- Karik (Berfanbar 21 – Rêbedan 20)
Di demeke nêzîk te tu yê _____ (gihaştin) evîndara/ê xwe. Hûn ê bi bextê xwe şa _____ (bûn). Dibe ku hûn biryara zewacê _____ (dan). Lê dengê daholê ji dûr ve xweş tê.

11- Dewlik (Rêbendan 21 – Reşemî 18)
Rojên nexweş dê _____ (qedîn). Dê malbata te piştgiriya te _____ (kirin). Tu yê dest bi karekî baş _____ (kirin), dê qezenca te zêde _____ (bûn).

12- Masî (Reşemî 19 – Adar 20)
Hatina mêvanekê dê pir kêfa te _____ (anîn). Dê rûyê te geş _____ (bûn). Lê kêfxweşî dê pir dom _____ (ne/kirin). Ji bo rojên nexweş xwe amade _____ (kirin).

C- Xwezî

1- Cihên vala bi raweya merc û daxwazî dagirin.

Wê rojê diviya ez serê sibê zû rabûma, civaneke min hebû. Min ê siyasetmedarekî navdar _____ (dîtin). Min dixwest bi wî re hevpeyvînekê _____ (kirin). Min ê hinek pirsên girîng ên têkildarî rojeva siyasî jê _____ (pirsîn). Bi kurtasî ev hevpeyvîn hem ji bo min hem jî ji bo rojnameya me pir girîng bû. Diviya ez dereng _____ (ne/man). Heta derengiya şevê min pirsên xwe amade kirin û ez dereng raketim, lê min ji bîr kir ku ez demjimêrê saz bikim. Dema ku ez hişyar bûm, saet ji dehan derbas dibû, ez dereng mabûm. Ez niha gelekî xemgîn im. Xweziya ez dereng _____ (ne/raketin), min demjimêra xwe saz _____ (kirin) û ez _____ (ne/ketin) vê rewşa xerab.

D- Rêwîtî

1- Lêkerên di nava kevanekê de li gorî demên borî bikişînin.

Piştî demeke kurt em ji Wanê derketin. Riya me di dora Behra Wanê re dizivirî, dîmenên gelekî xweş hebûn. Min _____ (xwestin) ku bi wênekêşa xwe çend wêneyan bikişînim, lê siware pir bi lez _____ (çûn), lewma min nekarî. Em 30-40 deqeyan _____ (çûn), me _____ (xwestin) em li cihekî bisekinin, çayekê vexwin, lê cihekî wiha tune bû. Em li cihekî _____ (rawestîn), me çend wêne _____ (kişandin) û em dîsa bi rê ketin.

Piştî katjimêrekê em _____ (gihaştin) Erdîşê, em li wir li çayxaneyekê _____ (rûniştin) û me çay _____ (vexwarin). Li wir jî min çend wêne kişandin û em dîsa bi rê ketin. Erdîş gelekî nêzî behrê ye, lewre jî lê dar û ber gelek in û bajar di nava daran de winda _____ (bûn).

Ji bilî dar û berên li dora Behra Wanê, heta Erdîşê zêde dar û ber tune bûn. Li kêleka rê werzên gindor û zebeşan _____ (hebûn). Nêzî Erdîşê baxçeyên sêvan jî bala min _____ (kişandin). Em heta riya Patnosê çûn, li wir _____ (zivîrin) aliyê çepê û ber bi jêr ve çûn. Em di nava Patnosê re derbas bûn û me riya xwe _____ (domandin). Piştî Patnosê em gihaştin Melazgîrê.

Tiştê ku di rê de bal dikişand, pirbûna keriyên pez û naxirê bû. Hin caran dewar di nava rê de _____ (rawestîn), wan _____ (ne/hiştin) ku erebe derbas bibe. Her wiha wan guh _____ (ne/dan) qornayê jî.

Heke bi tenê pez û dewêr wisa bikira, ne xem bû. Carekê me _____ (dîtin) ku refek qijik jî bi heman awayî di nîveka rê de _____ (veniştin), piştî qornayê _____ (firîn). Jixwe têlên telefonê cihê veniştina wan bû, giş li ser têlan rêz _____ (bûn). Vê yekê dîmeneke balkêş pêk _____ (anîn). Divê em bibêjin ku ne tenê ajal, her wiha zarok û jin jî bê tirs û paxav li ser rê _____ (meşîn).

2- Nivîsa li jêr bikin dema boriya berdest.

Di nav bêdengiya kûr a hawirdorê de kom dimeşe. Bi tenê dengê lingên wan ku di nav berfê de şopên kûr vedikin û carinan jî dengê teyr û tûran bêdengiyê xira dike. Carinan jî kîvroşkine reş û spî û simorene belek, ji dûr ve, direvin û di nav dar û zinaran de winda dibin. Taxim niha dikeve nav dehleke gelekî kûr û boş. Meş dijwartir dibe. Devî û devîçirkên boş li ling, çîp û cil û bergên wan digerin. Lê berfa nerm niha alîkariya wan dike û nahêle ku striyên devîçirkan rê li wan bigirin.

Ew dimeşin. Kevok dimeşe.
Di nav bêdengiya kûr a hawirdorê de kom dimeşiya _____

_____

_____

_____

_____

_____

_____

_____

E- Zargotin

1- Hoker û rengdêrên di nav kevanekê de li gorî payeya wan bi kar bînin.

Çavkaniya herî girîng a zimanekî zargotin e. Lêkolîner dibêjin ku li cîhanê yek ji _____ (dewlemend) zargotin a kurdan e. Di zargotina kurdan de bi hezaran çîrok, metelok, stran, dûrik, serhewa û payîzok hene. Ew berhemên zargotinî zimên _____ (qewîn) dikin.
Her wiha ew zimên li ber dilê mirov _____ (şîrîn) dikin. Pirî caran taswîrên di berhemeke zargotinî de ji yên gelek berhemên nivîskî _____ (xurt) in.
Di berhemên zargotinê de _____ (hêja) û _____ (girîng) beşa zargotinê, biwêj û gotinên pêşiyan in. Berî her tiştî, biwêj û gotinên pêşiyan hêza derbirînê ya zimanan _____ (zêde) dikin. Hin caran gotineke pêşiyan dikare mijareke aloz ji gotarekê _____ (baş) û (hêsan) rave bike. Ji bo zimanekî girîngiya biwêj û gotinên pêşiyan ji peyv û bêjeyan ne _____ (kêm) e.

F- Çiyayê Nemrûdê

1- Lêkera “hatin”ê li gorî forma rast bikişînin.

Çiyayê Nemrûdê di nav sînorên Kolika Semsûrê de ye. Bilindahiya wî 2150 metro ye. Di nava gelê wê herêmê de ev der wekî Çiyayê Bêlî _____ (hatin) binavkirin. Lê piştî ku peykerên li vir _____ (hatin) vedîtin, navê vê derê bû “Çiyayê Nemrûdê.”
Peykerên li ser Çiyayê Nemrûdê ji aliyê dîrokzanan ve di sala 1881’ê de_____ (hatin) kifşkirin. Îro mîna cihekî pîroz _____ (hatin) nasîn. Gora Kral Antiochus ku beriya Zayinê di sedsala yekemîn de jiyaye li vir e.
_____ (hatin) gotin ku Qrale Kommagene Antiochhos ê 1’emîn ji bo ku dilsoziya xwe bi xwedayan re nîşan bide ev peykerên giranbuha dane çêkirin. Çiyayê Nemrûdê mîna mînakeke bêhempa ya serdema Helenîstîk _____ (hatin) hesibandin. Peykerên dîrokî li aliyên çiyê yên Rojava û Bakur _____ (hatin) bicihkirin. Terasa Rojhilat cihê pîroz e, ji ber vê yekê jî peykerê herî girîng û mîmariya herî baş li vir _____ (hatin) bicihkirin. Bilindbûna her peykerekî di navbera 8 û 10 metroyan de ye.
Her sal ji hêla bi hezaran kesan ve _____ (hatin) ziyaretkirin. Ev der ne tenê bi peykerên xwe, her wiha bi dîmenên ku pêşkêşî mirovan dike jî balê dikişîne ser xwe. Ji ser Çiyayê Nemrûdê derdor pir xweş xuya dike. Her wiha li hilatina rojê jî herî xweş ji ser Çiyayê Nemrûdê _____ (hatin) temaşekirin. Lewre jî gelek kes heta serê sibê li benda hilatinê rojê dimînin.

G- Bikaranîna deman

1- Lêkerên di nava kevanekê de li gorî demên rast bikişînin.

Te ez kal kirim

Te ez kal _____ (kirin) bi ciwanî
Lê ez xort _____ (bûn) tu baş zanî
Pelê dara min te _____ (weşandin)
Bihar _____ (çûn), te payîz _____ (anîn)

Hêviya min _____ (ne/man) di jînê de
Bê kes _____ (man) di vê dinê de
Gula dilê min _____ (çilmisîn)
Qet şîn _____ (na/bûn) ji îro pê de

Ka tu _____ (nêrîn) li halê min
Te çi _____ (anîn) serê min
Birînê zor _____ (dan) ser min
Mirin gelek nêzîk _____ (bûn) li min

2- Lêkerên di nava kevanekê de li gorî demên rast bikişînin.

Rojeke yekşemê

Ez wê rojê dereng hişyar _____ (bû). Dema ku ez hişyar bûm, min bala xwe da demjimêrê, saet ji dehan _____ (borîn). Ez rabûm, min çaydank _____ (danîn) ser êgir. Min xwe amade kir da ku herim dikanê ji bo taştê tiştinan _____ (kirîn). Hevala min ji xewê hişyar bû û got:

- Xêr e, tu yê bi ku de _____ (çûn)?

Min got:

- Ez _____ (kirin) herim dikanê ji bo taştê hin tiştan bikirim.

Wê got:

- Raweste, ez jî xwe amade bikim, em bi hev re _____ (derketin). Em îro taştê li derve _____ (xwarin).

Min jî gelekî dixwest em dawiya hefteyê li derve taştê _____ (xwarin) û dema xwe li derve derbas bikin.

Ez û hevala xwe em her du jî _____ (xebitîn), di nava hefteyê de me bi xweşikî hev ne-didît, ji ber vê yekê me _____ (xwestin) di dawiya hefteyê de em bi hev re dema xwe derbas bikin. Lê wê mehê rewşeke awarte derketibû, lewma di berîka min de pere _____ (ne/man). Ji ber vê yekê min bi xemgînî got:

- Bi min re pere nemane, em ê bi kîjan pereyî biçin li derve taştê _____ (xwarin)?

Hevala min bi bişirîn got:

- Xeman mexwe bi min re pere _____ (hebûn). Min duh heqê xebata xwe ya zêde _____ (wergirtin). Ew ê heta serê mehê têra me bike.

Vê yekê ez gelekî kêfxweş kirim. Min bi dilxweşî hevala xwe hembêz _____ (kirin), me hev maç kir û min got:

- Mala Xwedê ava, ji vê çêtir li Şamê şekir e. Fermo xweşdiviya min, xwe amade bike, em bi hev re _____ (derketin).

Lêkerên Xwerû

Rader	Dema niha	Raweya fermanî	Dema borî
alastin	dialêse	bialêse	alast
anîn	dihîne (tîne)	bihîne (bîne)	anî
avêtin	diavêje	biavêje	avêt
bihîstin	dibihîze	bibihîze	bihîst
bijartin	dibijêre	bibijêre	bijart
biraştin	dibirêje	bibirêje	biraşt
birin	dibe	bibe	bir
bûn	dibe	bibe	bû
cûtin	dicû	bicû	cût
çûn	diçe	biçe	çû
dan	dide	bide	da
dîtin	dibîne	bibîne	dît
dotin	didoşe	bidoşe	dot
firotin	difiroşe	bifiroşe	firot
gestin	digeze	bigeze	gest
gihaştin	digihêje	bigihêje	gihaşt
girtin	digire	bigire	girt
gotin	dibêje	bibêje	got
guhartin	diguhêre	biguhêre	guhart
guhastin	diguhêze	biguhêze	guhast
guvaştin	diguvêşe	biguvêşe	guvaşt
hatin	dihê (tê)	bihê (bê)	hat
hejmartin	dihejmêre	bihejmêre	hejmart
hinartin	dihinêre	bihinêre	hinart
hiştin	dihêle	bihêle	hişt
jentin	dijene	bijene	jent
ketin (keftin)	dikeve	bikeve	ket
kirin	dike	bike	kir
kolan	dikole	bikole	kola
kuştin	dikuje	bikuje	kuşt
kutan	dikute	bikute	kuta
lîstin	dilîze	bilîze	lîst
malaştin	dimalêje	bimalêje	malaşt
man	dimîne	bimîne	ma
mêtin	dimêje	bimêje	mêt
mirin	dimire	bimire	mir
nivistin	dinive	binive	nivist
pan	dipê	bipê	pa
parastin	diparêze	biparêze	parast
pêçan	dipêçe	bipêçe	pêça
pişaftin	dipişêve	bipişêve	pişaft
qefaltin	diqefêle	biqefêle	qefalt
qeşartin	diqeşêre	biqeşêre	qeşart
rêstin	dirêse	birêse	rêst
rêtin	dirêje	birêje	rêt
sotin	disoje	bisoje	sot
stran	distrê	bistrê	stra
şikestin	dişikê	bişikê	şikest
şûştin	dişo	bişo	şûşt
westan	diweste	biweste	westa
xistin	dixe	bixe	xist
xwarin	dixwe	bixwe	xwar
xwendin	dixwîne	bixwîne	xwend
xwestin	dixwaze	bixwaze	xwest
zan	dizê	bizê	za

Lêkerên pêkhatî yên ku bi paşgira “-în”ê pêk tên

Rader	Dema niha	Raweya fermanî	Dema borî
barîn	dibare	bibare	barî
bezîn	dibeze	bibeze	bezî/beziya
borîn	dibore	bibore	borî
civîn	dicive	bicive	civî/ civiya
çinîn	diçine	biçine	çinî
çirîn	diçire	biçire	çirî/çiriya
êşîn	diêşe	biêşe	êşî/ êşiya
firîn	difire	bifire	firî/ firiya
gerîn	digere	bigere	gerî/ geriya
guherîn	diguhere	biguhere	guherî
herikîn	diherike	biherike	herikî
karîn	dikare	bikare	karî/ kariya
kelîn	dikele	bikele	kelî/keliya
kenîn	dikene	bikene	kenî/keniya
kirîn	dikire	bikire	kirî
meşîn	dimeşe	bimeşe	meşî/ meşiya
nasîn	dinase	binase	nasî
nêrîn	dinêre	binêre	nêrî
nivîsîn	dinivîse	binivîse	nivîsî
peyivîn	dipeyive	bipeyive	peyivî
qedîn	diqede	biqede	qedî/ qediya
qerisîn	diqerise	biqerise	qerisî
qetîn	diqete	biqete	qetî/ qetiya
qewimîn	diqewime	biqewime	qewimî
revîn	direve	bireve	revî/ reviya
şewitîn	dişewite	bişewite	şewitî
weşîn	diweşe	biweşe	weşî/weşiya
xebitîn	dixebite	bixebite	xebitî
xeyidîn	dixeyide	bixeyide	xeyidî
zîvirîn	dizîvire	bizîvire	zîvirî

Lêkerên pêkhatî yên ku bi paşgira “-andin”ê pêk tên

Rader	Dema niha	Raweya fermanî	Dema borî
barandin	dibarîne	bibarîne	barand
bezandin	dibezîne	bibezîne	bezand
ceribandin	diceribîne	biceribîne	ceriband
civandin	dicivîne	bicivîne	civand
çirandin	diçirîne	biçirîne	çirand
domandin	didomîne	bidomîne	domand
êşandin	diêşîne	biêşîne	êşand
firandin	difirîne	bifirîne	firand
gerandin	digerîne	bigerîne	gerand
guherandin	diguherîne	biguherîne	guherand
herikandin	diherikîne	biherikîne	herikand
kişandin	dikişîne	bikişîne	kişand
kelandin	dikelîne	bikelîne	keland
kenandin	dikenîne	bikenîne	kenand
meşandin	dimeşîne	bimeşîne	meşand
nasandin	dinasîne	binasîne	nasand
peyivandin	dipeyivîne	bipeyivîne	peyivand
qedandin	diqedîne	biqedîne	qedand
qerisandin	diqerisîne	biqerisîne	qerisand
qetandin	diqetîne	biqetîne	qetand
revandin	direvîne	birevîne	revand
rijandin	dirijîne	birijîne	rijand
standin	distîne	bistîne	stand
şandin	dişîne	bişîne	şand
şewitandin	dişewitîne	bişewitîne	şewitand
tewandin	ditewîne	bitewîne	tewand
weşandin	diweşîne	biweşîne	weşand
xebitandin	dixebitîne	bixebitîne	xebitand
xeyidandin	dixeyidîne	bixeyidîne	xeyidand
zîvirandin	dizîvirîne	bizîvirîne	zîvirand

Lêkerên pêkhatî yên ku bi pêşgiran çêdibin

Rader	Dema niha	Raweya fermanî	Dema borî
çêkirin	çêdike	çêke	çêkir
dadan	dadide	dade	dada
dagirtin	dadigire	dagire	dagirt
daketin	dadikeve	dakeve	daket
daliqandin	dadiliqîne	daliqîne	daliqand
damezirandin	dadimezirîne	damezirîne	damezirand
daxistin	dadixe	daxe	daxist
hilanîn	hiltîne	hilîne	hilanî
rabûn	radibe	rabe	rabû
rahiştin	radihêje	rahêje	rahişt
raketin	radikeve	rakeve	raket
rakirin	radike	rake	rakir
raxistin	radixe	raxe	raxist
rûniştin	rûdine	rûne	rûnişt
vebûn	vedibe	vebe	vebû
vegerîn	vedigere	vegere	vegerî/vegeriya
vegotin	vedibêje	vebêje	vegot
vekirin	vedike	veke	vekir
veqetandin	vediqetîne	veqetîne	veqetand
veşartin	vedişêre	veşêre	veşart
wergerandin	werdigerîne	wergerîn	wergerand

BERSIVDANK

DESTPˆK

1- Bersivên pirsên li jêr binivîsin.
1- Rûken ji Wanê ye.
2- Ew hevdeh salî ye.
3- Ew xwendekar e.
4- Çavên wê qehweyî ne.
5- Erê, ew keçeke dirêj e.
6- Sosin diya Rûkenê ye.
7- Porê wê zer û kurt e.
8- Remo bavê Rûkenê ye.
9- Ew karsaz e.
10- Rohat û Ferhat birayên Rûkenê ne.

2-Valahiyên li jêr bi qertafên kesane dagirin.
1- e, 2- ye, 3- me, 4- im, 5- e, 6- î, 7- e, 8- ne, 9- in, 10- ne, 11- e, 12- ye / ne, 13- e, 14- in, 15-ye.

3- Bersivên xwendekaran

4- Valahiyên li jêr dagirin.
1- wê, 2- wan, 3- wî.

5-Cînavk û qertafên kesane
ez, min, in, e, min, ew, ye, wî, ye, ye, wê, ew, wan, in, ew, ye, wê

6- Stran
-a, -a, -ê, -a

7- Veqetandek
-ê, -a, -ê, -ên, -ê, -ê, -ê, -ê, -a, -ê.

8- Veqetandek
-ê, -eke, -ên, -ên, -eke, -eke, -ê, -ên, -ên, -a, -eke.

9- Nivîs
Navê min Elîşêr e. Ez çil û du salî me. Ez karker im. Ez ji Şemzînanê me. Şemzînan bajarekî biçûk e. Du kurên min hene. Navên wan Siyabend û Serhat in. Navê Hevsera min Gulîzer e. Ew dirûnker e.

10- Bersivên xwendekaran.

11- Hevok
1- Jêhat xortekî teral e.
2- Selma ji Mêrdînê ye.
3- Porê min dirêj e.
4- Ew keçeke jîr e.
5- Bavê min zilamekî zana ye.
6- Diya Azad rûken e.
7- Xaniyê wan mezin e.
8- Bavê hevalê min parlamenter e.
9- Hevsera birayê Zozanê bedew e.
10- Deriyê mala me zexm e.
11- Birayê Dîlanê mirovekî hêja ye.
12- Tu jineke çalak î.
13- Ferhat zilamekî çeleng e.
14- Teriya pisîkê kurt e.
15- Li Amedê dêrên ermanan hene.
16- Ew keçeke zexel e.
17- Xaniyê apê wî mezin e.
18- Birayê hevsera Cemîl parêzer e.
19- Lîstika zarokan xweş e.
20- Meta min jineke jêhatî ye.

UN˙TE 1 DANAS˙N

A-Hevnasîn

1- Bersivên xwendekaran

2- Cihên vala li gorî hevpeyvîna li jor dagirin.
1- 1978'an
2- Çewlikê
3- Şivan Perwer / Mihemed Şêxo
4- Murathan Mungan, Amîn Maalouf û Mehmed Uzun
5- Behman Qubadî
6- qanûnê

3- Xebata Peyvan
1-f, 2- a, 3- b, 4- c, 5- d, 6- e

4- Bersivên xwendekaran

B- Danasîna Kesan

1- Taybetiyên kesan binivîsin.

Kes	Pîşe	Por	Çav	Bejn	Xwî	Heweskarî
Zozan	rojnameger	hilû	şîn	dirêj	xwîngerm / rûgeş	şano / sînema /
Qenco	karker	qehweyî	reş	kurt		muzîk
Rohat	lêkolîner	reş / kurîşk	belek	bilind	dilovan / mirovperwer	xwendin/ muzîk
Zelal	mamoste	şitî / reş	reş	kurt	henûn / zarşîrîn	surişt

2- Xecê

Kesayetî: diltenik, xwîngerm, bîrbir, jîr, jêhatî, birehm
Dirûv: çavên wê zerîn û kilkirî ne, porê wê spî û pêldar e, diranên wê zêrîn in, deqeq li eniya wê heye.
Bejn û bal: ew bejndirêj e
Heweskarî: Ew ji zarokan, vegotina çîrokan û ji şênahiyê hez dike.

3- Bersivên xwendekaran.

4- Beşên hevokan bigihînin hev.

1-e, 2-c, 3-d, 4-b, 5-a

C- Danasîna Derdorê

1- Bersivên xwendekaran.

2- Sernavên paragrafan li gorî mijara wan binivîsin.

1- erdnigarî
2- serjimêr / dîrok
3- avahî
4- cihên dîrokî
5- aborî
6- çand

2- Rast / çewt
1- çewt, 2- rast, 3-çewt, 4- çewt, 5- rast, 6- çewt.

3- Bersivên xwendekaran.

4- Daçek
1- di…..de, 2- bi…..re, 3- ji…..re, 4- bi, 5- bi, 6- di…..de, 7- bi…..ve, 8- ji…..ve,
9- bi ser ….. ve, 10- li

5- Lêker
1- li dar dixin, 2- ji holê radibin, 3- ji bîr dikim, 4- bi dawî dibin, 5- li xwe dikin, 6- ji ber dikin, 7- bi kar tînim, 8- bi dawî dike.

D- Rêziman

1- Cihên vala bi cînavkên lihevxistî dagirin.
1- pê
2- jê
3- tê
4- jê
5- pê
6- pê

UNÎTE 1 - SPARTEK

A- Xebata li ser peyvan

